**KOVARA FELSEFEVAN**
**Kovara felsefî, zanistî û ramanî**


Xwedî û berpirsiyarê giştî

Ali Gurdilî

*Chef Edîtor*

Ali Gurdilî

Hejmar 4, Sal 1

Cotmeh, Mijdar, Berfenbar 2015

Sêwirandina berg û rûpelan:

Weşanên Soran

Berg: Pagan-philosophers

E-peyam: felsefevan@hotmail.com

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan

twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org



# BIBE ABONEYÊ KOVARA FELSEFEVAN

Heke hewesa te li ser felsefe, civaknasî, psîkolojî, lêkolîn, mîtolojî, aforîzma, hevpeyvîn, zanist û hwd. hebe û bixwazî ku bi zarê xwe yê şîrîn û zimanekî herikbar haya te ji wan mijaran hebe, pêşniyazeke me heye; ji kerema xwe bibe aboneyê Kovara Felsefevan.

Abonetiya ji bo salekê/salewext (çar jimar) 40 TL û ji bo Ewropayê jî 40 € ye.

Bo têkilî: felsefevan@hotmail.com

Buhayê Kovarê: Li Kurdistana Bakur û Turkiyeyê: 10 TL û ji bo Ewropayê jî, 10 € ye.

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan


twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org

Hotmail adres: felsefevan@hotmail.com

**NAVEROK**

**1-** Ji Edîtorê Kovarê
**2-** Di bin parêzgeriya Xweda Mîtrayî de welatê Utopîayê| Mahmut Ozçelik
**09-** Bingeha Felsefeya Platon
**10-** Tewşbûn-Bêwatebûna Camûs û Ne(Xwebûna) Felsefeya Sartre|Çore Arda
**18-** Di Felsefeya Marksîst de Bandûra Felsefeya Xwezayê ya Hegel
**19-** Rewşenbîr û Daneheva Zanayiyê| Prof. Dr. Onal Sayin
**31-** Felsefeya I. Kant ya Ehlaqê
**32-** Thales û Teoriya wî | Ferzan Yezdanî
**45-** Di Utopyaya 'Bajarê Xwedîerdem' de Aqlê Pratîk
**46-** Diyalektîka Budîzmê | Rahul Sankrityayan
**53-** Di Felsefeya Îbnî Rûşd de Bandûra Arîstotales
**54-** Pêvajoya Peresanê ya Bêdawî | Prof. Dr. Abidin Kumbasar
**57-** Di Felsefeya Îmamê Xezalî de Îman û Aqil
**58-** Teoriya Arîstoteles ya Made û Formê| Ali Gurdilî
**63-** Hevpeyvîn bi Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru re
**79-** Di Serdema Navîn de Rewşa Felsefeyê
**80-** Die Protestantische Ethik und der Geist des Kapitalismus| Gamze Arslan
**88-** Xweza di Felsefeya Arîstotales de
**89-** Taybetmendiyên Felsefeya Sokrates| Ali Gurdilî
**91-** Guhdariya Teqez û ya Rêjeyî | Brahîm Şêxo
**95-** Lêgerîna Arkheyê di Çanda Antîk Yewnanî de
**97-** Pênase û Wateya Şuûrê Li Cem Descartes| Orhan Agirî
**101-** Li Ser Felsefeya Felsefeyê Çend Gotin
**102-** Felsefe, Wêje û Zanyarî | Gul Seven
**105-** Li Ser Çend Nivîsên Hewarê Xwendineke Cuda|Kêmzan Bêwar
**111-** Psîkolojî: Ekolên Psîkolojîk û Taybetmendiyên wan
**117-** Di Felsefeya Antîk Yewnanî û Filehtiyê de Ramana Xwedê
**118-** Civaknasî: Tebeqebûna Civakî
**120-** Ferhengoka Felsefeyê (04)
**130-** Di Mîtolojiya Yewnan de Mîtosa Medusaya Kezimar
**132-** Gotibûn ku Felsefe û Edebiyat... | Zelal Denzî



Her heyînek, neynikek e ji bo navên îlahî. Meriv dema ku ayetên bi devkî dixwîne, divê ji aliyê din jî ayetên xwiyakirî yên ku di gerdûnê de hene jî bixwîne. Lewra, ew hevdu rave dikin û dibin piştgirên hev. Zanist xizmeta dîtina navên îlahî dikin, ku di gerdûnê de bi awayekî xwe dane der. Hemû zanistên ku hûn wan dixwînin û fêr dibin, afiranderê we nîşanê we didin. Ne mamosteyên xwe, lê fen û zanistê bişopînin.

**Mele Seîdê Kurdî (1878-1960)**

# JI EDÎTORÊ KOVARÊ

Merheba ji we re...

Bi hejmara xwe ya çaremîn, em dîsa li pêşbêrî we xwînerên ezîz in. Em hêvîdar in ku hûn herdem baş û selamet bin. Di vê hejmarê de, em li ser têkiliya felsefe û edebiyatê rawestiyan û me cih da vê mijarê. Ji bilî mijara me ya dosyayê, em li ser hinek mijarên din jî rawestiyan. Di vê hejmarê de rêzdarên hêja Mahmut Ozçelik, Çore Arda, Ferzan Yezdanî, Gul Seven, Orhan Agirî, Brahîm Şêxo, Kêmzan Bêwar bi gotarên babetcihê beşdarê vê hejmarê bûn. Herweha di vê hejmarê de, me cih da çend gotarên felsefî yên akademisyenên navdar jî. Di vê hejmarê de, dîsa me ligel rêzdar Mehmet Nesim Doru hevpeyvîneke têr û tije pêk anî.

Di vê hevpeyvînê de em li ser felsefeyê û bi taybetî jî li ser felsefeya Mewlana Melayê Cizirî û xebatên mamoste rawestiyan.

Bi vê hejmara xwe re, me xwe gihande hejmara çaremîn. Bêguman, ev yek ji bo me keyfxweşî û bextewariyeke bêpayan e.

Ligel şert û mercên neyînî û rewşa kaotîk ya cihanê, tu carî em xwe bêhêvî nakin hewl didin ku bikaribin xebatên xwe berdewam bikin. Dîsa em hêvîdar in ku em ê jî weke hemû miletên cîhanê bikaribin li welatê xwe bi azadî û aramî bijîn û aşt bin.

Me di hejmara yekem de jî gotibû, ku em hê nû ketine rê û rêya me gelekî dûr û dirêj e. Lewma jî, em di xebatên xwe de nalezînin û naxwazin ku yekcar xwe nokî avê bikin. Çimku ji bo hemû tiştan, destpêkek lazim e û ev destpêk, nasandin, zanîn û têgihiştina mijarê ye. Encax piştî vê qonaxê, meriv dikare bêtir xwe berde nav mijarên berfirehtir yan jî kûrtir. Ligel hemû tengasiyan, tiştê ku herî zêde me keyfxweş dike, piştgirî û xwedîlêderketina we xwînerên ezîz e, qîmetdayîna we ye û ev yek jî, hêviyeke mezin dide me. Bi hêviya xwendin, têgihiştin û nirxandinên baş û serkeftî. Heta hejmareke din, bimînin di xêr û xweşiyê de...

14.10.2015

# Di bin parêzgeriya Xweda Mîtrayî de welatê Utopîayê

Mirov ji çaxên antîk bigire hetanî çaxa em têde dijîn herdem li 'bihuşta rûzemînê' geriyane û wekî armanc xwestine ku civakek bextewar ya mînak biafirînin. Ji bo vê armancê ji şerên xedar jî netirsiyane. Hin nivîskar, fîlozof û ramanweran li ser vê 'civaka mînak' berhem jî nivîsandine. Ji van nivîskaran yê herî navdar jê yek jî Thomas More ye ku bi pirtûka xwe ya 'Utopîa' xwestiye 'şêweyê birêvebirina herî qenc' tenê di xeyalan de be jî bide nasandin. Mirovên di bin pest, pêkutî û kedxwariya çînî de her dem jiyanek ji bextewarî, wekhevî û azadiyan pêkhatî xeyal kirine, hetanî hin caran wisa fikirîne ku di dîrokê de ev dema xeyalkirî hatiye jiyîn û ji wê demê re jî gotine 'heyama zêrrîn'.

Sed salan bi pey vê heyama windayî ketine da ku cardin wê heyamê bi dest bixin û ji nû ve bijîn. Ji ber ji destçûna wê heyama zêrrîn, bi guman li guherînê nihêrîne û xwestine guherînê bidin sekinandin. Çimkî li gor wan guherîn ber bi xerabiyan ve ye, ji xwedê dûrketin e û mirovahî ji heyama zêrrîn dûr xistiye…

Lê mirov herî zêde di dema ronesansê de bi têgeha 'utopyayê' re tê rûberî hev. Bi destpêkirina keşfên cografîk re, bi vedîtina hin herêmên ku lê mulkiyeta taybet û dirav nederbasdar e re, bi dîtina ku mirovên wan herêman ji bo hin madenên bi nirx nakevin qirika hevdu û di nava wekheviyê de bi aramî dijîn re, di hişê hin fîlozofan de sêwirandina dinyayek utopîk xwe dide der. Yek ji wan fîlozofan jî Thomas More ye. Lê berî em li ser berhema wî ya nûxwaz û nûwaze bibin xwedî agahî divê em hinekî jiyana vî mirovî ji nêz ve binasin.

**Thomas More Kî YE?**

Thomas More di sala 1478an de li Londonê tê dinê. Zimanê latînî û yûnanî pir zû dielime. Di çardeh saliya xwe de diçe zanîngeha Oxfordê. Di hêla hiqûq û teolojiyê de perwerdehiyek baş dibîne. Nivîsên gerokan yên dema xwe bi baldarî dixwîne. Nemaze çîrokên li ser rêwîtiyan yên gerokên deryavan ên wekî Amerogo

Vespuccî, Vasco de Gama û Krîstof Kolombî bandorek mezin li ser wî dihêlin. Fîlozofên antîk yên wekî Platon û Arîstoteles jî di xeyalkirina dewleta wî ya utopîk de bandorek ber bi çav lê dike. More mirovekî pirhêlî ye: Humanîst, xwînerek baş, çavdêr, dîndar, dîplomat, akademisyen, siyasetmedar û rêveberek bilind yê Îngilistanê bû. Vê pirhêliya wî kiriye ku pirtûka xwe ya şaheser-Utopîayê- binivîse.

Di dema kral Henryê VIII. de dikeve parlemena Îngilistanê. Bi tewsiyeya teologê mezin Erasmus vê pirtûkê di sala 1516an de dinivîse. Pirtûk ewil bi zimanê latînî hatiye nivîsîn. Dû re li zimanên din tê wergerandin. Tu carî ji qral re şelafî nekiriye, tim xwestiye ku *'qral bibe bavê gel, ne ku bibe efendiyê koleyan'* û li hember zewaca wî ya dijolî derdikeve -Henryê VIII. heşt caran zewiciye, ji ber ku More girêdayî rêola katolîkê ye bêyî sedem jinberdana kral Henryê VIII. qebûl nake- û tîrên hêrsê yên kral ber bi xwe ve dikşîne û ewilîn tê hepiskirin û di sala 1535an de tê îdamkirin. Têgeha utopîayê ku peyvek yûnanî/latînî ye bi saya wî di dîroka ramana mirovahiyê de cihê xwe digire.

Utopîa wate ew e ku welatê li tu cihî nebûye, welatê herî qenc, welatê bextewariyê ye. More derheqê welatê herî qenc de agahiyan bi saya vebêjiya deryavanê maceraperest Rafael Hytholay dide xwendevan. Rêwîtiyek bi rastî û xeyalan tevlihevbûyî ya ji devê Rafael tê vegotin heye.

Rafael deryavanekî portekîzî ye. Bi gerok-deryavan Amerîgo Vespuccî re li gelek cihan digere, piştî demekê riya wan bi giravekê dikeve û li wir pênc salan dimîne. Hemû jiyana wan a seravayî û binavayî raçav dike û dema vedigere Ewropayê ew jiyana ku wekî xeyalan di hişê wî de mayî vedibêje û çîroka welatê Utopyayê jî wisa dest pê dike.

Di esasê xwe de tiştên di pirtûkê de tê vegotin, rastiyên hemû pirsgirêkên gelekî yên girêdayî jiyana şênber û rojane ye ku bi şêweyek hûrgilî hatiye dahûrandin…

Mirov dikare bibêje ku Thomas More bûye berdevkê civaka dema xwe ya ku di bin zilm û zora qralan de bênefes hatiye hîştin û li

hember vê dinyaya tarî, xwesteka civakek bextewar bi qêrînî aniye zimên. Ji bo xelaskirina mirovahiya dike ku winda bibe qêrînek e. Utopya bersivek e ji endîşe, hêvî û xeyalên ku di jiyana rasteqîn de ji xwe re cih nedîtî ye. *(r. 76).*

**Beşên Utopyayê**

Utopîa du beş in û wekî Pirtûka Yekem û Pirtûka Duyem hatiye binavkirin. Di pirtûka yekem de em rexneyên giran li qraliyeta Îngilistanê dibe, dibînin. Mînaka herî ber bi çav îdamkirina dizan e ku em ji vegotina Rafael ku bi hin kesan re di nava diyalogê de ye, pêdihesin: 'Li hember diziyê zagonên xedar û erjeng tê derxisitn, lê ya ku divê bibe, dabînkirina şert û mercên jiyanek guncan e ji bo kesên mêla wan li ser diziyê ye.

Bi vê yekê dê tu kes mecbûrî diziyê nebe û di dawiyê de jî neyê îdamkirin.' *(r. 106).* Tevî ku Xweda kujtina mirovan qedexe kiriye, em dîsa jî ji bo çend qurişên diziyê di kujtina mirovan de qet dudiliyê *(teredûtê)* nakin. *(r.116).* Rexneyê li 'edaleta bêedalet' a îngilizan digire ku heman cezayî dide diz û kujer…

Ji bo ji vê edaleta bêedalet vegere jî pêşniyaza lênêrîna hiqûqa Romayê dike. Di hiqûqa wan de diz nayên kujtin, kesên sûcên giran kiriye hetanî dawiya emrê xwe di kanên maden û keviran de mehkûmî xebata mecbûrî dibûn. Heman rewş li welatê Utopîayê jî tê dîtin. More ji bo rêveberekî baş wiha difikire: 'Qralekî maqûl û dilpak divê rêveberiya gelekî ji parsekan pêk tê ne, rêveberiya gelekî ku di nava bexteweri û xweşiyê de dijî, bike.' *(135).*

**Li welatê Utopyayê rêveberî**

Utopîa li ser giravekê ava bûye. Ji 54 parêzgehan pêk tê. Di her parêzgehê de şeş hezar malbat dijîn. Nifûsê her malbatê di navbera ji dehan hetanî şazdeh kesan diguhere. Jiyana hemû parêzgehan dişibin hevdu û paytexta vê giravê jî Amaurote ye. Li ser girekî hatiye avakirin, dora paytextê bi sûran dorpêçkiriye û du rûbarên xweşik bajêr dixemilîne. Hikûmdarê welat xwedî tu tac û textî nîn e. Tişta ku hikûmdar ji welatiyê din cihê dike ew e ku mirovekî di dest de tayek genim li pêşiya wî hildigire û dimeşe ye. Her parêzgeh sê nûnerê xwe dişîne konseya li paytextê ku

navê wê Konseya Gelemper ya Giravê ye. Peywîra vê konseyê ew e ku hemû heyîn û dewlemendiyên welat bi şêweyeke wekhev li parêzgehan parve bike. Hemû malên wan sê qatî ne û du deriyên wan hene jê yek li kuçeyê bajêr dinihêre yek jî li baxçeyê xweşik vedibe. Ji bilî çend kesên bi rêvebirinê ve bilî dibe pê ve her kes di karê bedenî de dixebitin. *(Serokê bajêr, serokê qebîleyê, serrehîb û hin kesên bi zanistê re bilî dibin).*

Qanûnên vî welatî ji bo her kes bi hêsanî fêhm bikin û li gorî pêwîstiyên wê tevbigerin pir hindik û sade ne. Dîsa ji ber vê taybetiya qanûnan di vî welatî de pîşeya parêzeriyê tune ye. Ji ber ku her kes bi qasî bikaribe xwe biparêze ji qanûnan fêhm dikin. Bi tu dewletê cîran re peymanan mohr nakin, ji ber ku dizanin her peyman sextekariyek dihewîne. Dixwazin hemû têkilî li ser hezkirin, niyeta baş û fikirîna rast bimeşe.

**Malbat û jiyana civakî**

Li welatê Utopîayê kakilê civakê malbat e. Di her malbatê de serweriya bav derbasdar e. Zewac li ser esasê monogamiyê pêk hatiye. Jin berî bîst û du saliya xwe, mêr jî berî bîst û şeş saliya xwe nikare bizewice. Ji mirovên vî welatî, yên nezewicî û yên zewicî cil û bergên cihê li xwe dikin. Yanî mirov li gor cil û bergan dizane ku kî zewicî ye an nezewicî ye. Xwe bi boyaxan xemilandina jinan wekî şerma herî mezin tê dîtin. Ji malbatan qebîle pêk tên. Ji serokên qebîleyan re sîfogran *(filark)* tê gotin. Peywîra wan jê yek ew e ku nehêle kes beredayî bigerin û ya din jî venêrîna ji bo her kes karê xwe jidil û durist pêk bînin.

Meclîsek ji fîlarkan pêk tê heye. Ev reîsên qebîleyan serokê bajêr hildibijêrin û ger li şêniyên bajêr zordariyê neke hetanî dawiya emre xwe bajêr birêve dibe. Xwarin di sifreyên hevpar yên mezin de tê xwarin. Berî xwarinê xwendinek kin li ser exlaq û dilpakiyê tê xwendin. Lê yekê bixwaze di mala xwe de jî xwarina xwe amade dike. Lê ev pir nayê tercîhkirin.

Di amadekirina sifreyan de jinên malbatan bi dorê dixebitin lê karê herî giran û westîner kole dikin. Her mirovê bixwaze dikare li welatî bi kêfxweşi bigere lê gera mirovî ji rojek zêdetir be li cihê

şargehbûyî pîşeya xwe didomîne. Çimkî di vî welatî de ji kar û xebatê rev tune ye, jiyana betalî û beredayî qedexe ye. Cihên wekî meyxane, kerxane, lîstikên bi zaran tê avêtin-xumar- tune ye. Parsekî û feqîrî tune ye.

**Çandinî**

Li welatê Utopîayê alavê herî girîng yê hilberînê 'ax' e û 'ax' di mulkiyeta hevpar de ye. Ji mirovên vê giravê re betalî qedexe ye û her kes divê rojê şeş saetan bixebite. Xwarinên xwe di sifreyên hevpar de bi hev re dixwin, di xaniyên dişibin hevdu de rûdinin. Ji bo ku hestên mulkiyeta taybet lê dernebe her deh salan carê malên xwe diguherînin. Dirav û madenên giranbuha li cem wan bênirx e û qet qîmetê nadin tiştên wiha. Mehkûmên sûcê giran û kole bi xelek û zincîrên ji zêr çêbûyî tên girêdan. Hetanî wisa dikin ku zêr û zîvan tenê li cihên tûk û belxama xwe diavêjinê de, di daşirê de bi kar tînin û nirxê wê dadixin asta herî nizm da ku mirov ji bo van madenan nekevin qirika hevdu.

Di vî welatî de dewlemend û xizan tune ye, quretî û pozbilindî, çavbirçîtî şêniyên giravê nakoje. Belkî di vê <*girava ku şiklê wê dişibe heyvê*> de tişta herî balkêş ew e ku <*tebeqeya gundîtiyê*> tune ye. Cotkarî û rakirina debran wekî xizmetek leşkerî tê dîtin û mecbûrî ye. Çi jin çi mêr qet bêyî ciyawazî divê her kes karê çandiniyê bizanibe. Ji ber vê yekê jî hêj di zaroktiyê de her kes di dibistanan de fêrî karê çandiniyê dibin. <*Yekîneyên cotkariyê*> hene ku her yek ji çil jin û mêrî pêk tên û rêveberiya van çewligan jî bi hevserokatiya mêr û jinekê ve tê meşandin.

Her mirovê ku du salan di çewligê de xebitîbe vedigere bajêr û di şûna wan de mirovên din diherin karê cotkarî û zeviyan. Bi saya vê nobetguherînê tu kes demên dirêj di nava jiyanek pir zor de nayê hiştin, di xebatê de wekhevîtî heye. Ji bilî çandiniyê divê li bajêr her kes pîşeyek ku bi dilê xwe hilbijartiye jî bielime û li gor pîşeya xwe tevlî hilberînê bibe. Wekî hesinkarî, necarî, çolangî û hwd. Lê tişta balkêş di vê pergalê de koletî jî heye û di her <yekîneya cotkariyê> de du heb kole hene…

Di karên çandinî û veguhastinê de tenê gayan bi kar tînin. Nêçîrvanî qedexe ye. Ji ber ku yên ji nêçîrê hez dikin wekî xwedî xûyên jirêderketî dibînin. Karê qesabiyê jî tenê kole bicîh tînin, ew jî di qesapxaneyên ji bajêr dûr û li kêleka çeman hatiye avakirin de… Pir hindik hespan xwedî dikin, ji ber ku hesp hêj zêdedir di şeran de tê bikaranîn û şêniyên giravê jî ji şeran hez nakin. Aştîxwaz in. Ji şeran nefretê dikin û wekî tiştek ajalî dibînin.
Ger şerek mecbûrî biqewime jî dixwazin wî şerî bi dek û dolaban bêyî xwîn herikandinê qezenc bikin. Wisa difikirin ku şerê bi hêza bedenî tê qezenckirin ancax taybetiya ajalên dirinde yên mîna hirç, şêr, xinzîr, gur û kûçikan e. Heçku mirov e divê ew bi aqilê xwe bêyî zirarê bibînin şeran qezenc bikin. Şer, di şeran de bikaranîna şûran û nêçîrvanî wekî xisletê şowelyayên maqûl tê dîtin û ji bo welatiyên utopyayê bi çavên nebaş lê tê nêrîn. Di şûna şûran de bi biviran şer dikin. Ji ber ku di pergala feodaliyê de şûr, şer û lehengî sembolên şowelyetiyê ye û şowelye xwedî hin îmtiyazan in, ev yek jî li zagonên utopîayiyan nagunce.
**Huner û etîk**
Hunera her kes jê hez dike û girîngiyê didê muzîk e. Muzîk wekî zewqekê tê dîtin ku li ser tenduristiya mirovan ya bedenî û ruhî bandorê dike. Di etîk û delaliyê de tenê sînorek heye ew jî ew e ku divê tişta ku zewqê dide mirov bi janê dawî nebe. Ya din jî tişta ku mirov jê kêfê digire divê bêxîretî û bênamûsiyê nehewîne. Ji çîlekêşana baweriyên budhayî û xiristiyaniyê re qet destûr nayê dayîn. Ji ber ku di çîlekêşana van baweriyan de jankêşî heye. Dîsa mirovê ku bi nexweşiya jê xelasî ne pêkan e re rû bi rû bimîne, dikare mafê xwe yê dev ji jiyanê berdanê *(mirinê)* bikar bîne. Nexweşê giran biryara bi cih anîna wî mafê xwe bi destûra rehîb pêk tîne.
**Ol**
Şêniyên giravê baweriya xwe bi <*nemiriniya ruh*> tînin. Di dêlindêzên olî de boraq ser jê kirin tune ye. Çimkî li gor baweriya wan xwedayek qenc ji <*xwîn û mirinê*> hez nake. Bêhejmar ol di nava xweşbîniyek bêhempa de li kêleka hev dijîn. Lê dîsa jî mêla

piraniya niştecihan li ser Xweda Mîtrayî ye: ‘Her çiqasî welatiyên Utopyayê baweriyên cuda pejirandibin jî, herî kêm di mijara bawerkirina heyînek bala ku parêzger û afirînerê dinyayê ye de hemfikir in. Ev heyîn di hemû welatî de bi navê Mîtrayî tê nasîn.’ (r. 227). Divê li vir bala me li ser Xweda Mîtrayî be ku ji çanda Zerdeştiyê ye.
Di pirtûkê de rasterast navê Zerdeşt derbas nabe lê Xweda Mîtra derbas dibe. Em dizanin ku Xweda Mîtrayî di ola Zerdeştiyê de heyînek xwedayî ye ku ji ehd û peymanan berpirsiyar e. Mîtra peyveke bi zimanê <*zendî*> ye. Wekî parêzgerê debr û avê tê dîtin. Cara ewil di peymana di navbera Mîttanî û Hîtîtiyan de -b.z.1400 de hatiye mohrkirin de- wekî şahid *(govan)* derbas dibe. Bi van hemû taybetiyên xwe ve welatê Utopyayê di dunyayê de welatê herî baş e ku gel bi bextewerî lê dijî û dewleta wan jî dewleta xwedî birêvebirina herî qenc e. Nivîskar welatiyên utopyayê bi eslê xwe wekî yunaniyan dibîne. Lê zimanê welatiyên Utopyayê qisedikin dişibîne zimanekî ku nêzîkî farisî ye. Bi baweriya min ev xal jî têkiliya çanda kurdan bi bîra me dixe. *(r. 200).*

De kurdînûsîno ez we û qelema we bibînim, ka hûn welatek utopîk yê çawa şayanî me dibînin…

**Mahmut Ozçelik**
12.09.2015

**Têbinî:** Ev hemû agahî, lêkolîn û vegotinên di gotarê de kan û besta xwe ji pirtûka ku ji Weşanên Sayê di sala 2013an de, bi navê ‘Utopîa’ yê bi tirkî hatiye weşandin, digire.

## Bingeha Felsefeya Platon

Platon gotiye ku du cîhan hene: Cîhana îdeayan û ya xwiyakirî, ango cîhana qelp. Hemû heyînên ku li dinyayê hene, ew qopiyên heyînên resenî *(îdeaya)* ne, hêz û hebûnatiya xwe jî, ji wan digrin. Lewma jî, cîhana resen û mayende, cîhana îdeaya ye. Heyînên ku di cîhana îdeayan de cih digrin, naguherin, mirin ji wan re tune û ji holê re ranabin. Ango, eternal in. Ev dîtina wî ya xweser, çavkaniya *(binyada)* hemû felsefeya wî ye. Ango, hemû felsefeya xwe, li ser vê ramana xwe ya xweser ava kiriye.

**Mesela wiha gotiye...**

* Tevgera herî baş ya ehlaqî ew e ku ber bi **<îdeaya baş>** ve diqeside. **(Felsefeya wî ya Ehlaqê)**

* Heyînên rasteqîn, îdea ne û yên ku li dinyayê xwiya dikin jî, qopî *(qelp)* in. **(Felsefeya wî ya Heyînê)**

* Şagird beriya hemû tiştan, bi rêbazên *(awayên)* diyalektîkî divê îdeayan fêr bibin. **(Felsefeya wî ya Perwerdehiyê)**

* Huner, texlîdkirina texlîda ye. Lew re, cîhana der, texlîd e û hunermend jî, texlîdan texlîd dike. **(Felsefeya wî ya Hunerê)**

* Zanayiya rast, zanayiya îdeaya ye. **(Felsefeya wî ya Zanayiyê)** û hwd. Ev nêrîna wî ya xweser ya du cîhanan û ramanên mamosteyê wî Sokrates, ku berê asîmanan nîşan dabû û gotibû ku *<jiyana me ya esasî/resenî li wir e.>* wekî mizginiya olên yekxwedayî hatine (têne) qebûlkirin.

**Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

# Tewşbûn-Bêwatebûna Camûs û Ne(Xwebûna) Felsefeya Sartre

*Dostoyevskî wiha digot:*
*-Ger Xwedê tunebûya hertişt dê mûbah bûya--*

**ALBERT CAMÛS:** Di bêahengiyê de û bêhêviyê de vejiyîn qet ne gengaz e, ger li wê derê çalakên hunerê û felsefeyê hebin, dêmeg hêvî jî heye. Rola min ne ew e ku ez dinyayê û însanan biguherînim. Lewre ji bo vî tiştî, ne hewqas nefsbiçûkiya *(dilpakiya)* min û ne jî çirûska min î ronahiyê a ku ez ji bo însanan bipeyitînim heye. Lê hin nirx hene, ku ez dikarim bo wan têbikoşim. Belam ew nirx hewqas girîng in ku dinyayeke guherbar jî, beyî van nirxan nayê jiyîn. Bi kurtasî camûs dibêje: Gereke rûmet û exlaqa însên, were parastin. Albert Camûs, di navbera salên *(1913-1960)* de li Cezayirê ji diya xwe welidiye. Albert Camûs him rojnameger, feylesof, cerribandinvan şanoger û romanûsekî Cezayîrî ye. Albert Camûs di dema herba cîhanê a yekemîn de mezin dibe, helbet şerrê cîhanê gelekî bandorê li ser jiyana wî kiriye.

Çawa ku kurd çavên xwe vekirinin xwe di nav şerr û pevcûnê de dîbinin û bandorê li hemû jiyana wan a resen û nivîskî kiribe wilo jî bandora herbê li ser nivîs, wêje, hûnera Camûs jî kiriye. Camûs, kevirê felsefeya xwe ya resen a ewilî li ser bena *<Tewşbûnê û Bêahengbûnê>* lê dike, dûre kevirê felsefeya xwe piştî şerrê duyemîn yê dinyê kevirê helwesta xwe li ser qûça ***<Serhildanê>*** dibilîndîne. Em dikarin bibêjin hema hema Camûs feraset, helwest û felsefeya xwe li ser van têgehan ve pêşve biriye.

Belam, herî dawiyê feresata wî li ser hûmanîzmê disekine, lê berî hertiştî wekî feylesofekî heyînxwaz tê pejirandin. Camûs feylesofên weke Nietzsche, Heidegger û Kierkegaard şopandiye heta daye ser şopên wan jî, ango di bin bandora wan de maye. Li gor Camûs çalakî û watedarî gelekî girîng e, pozîsyona însên jî di hundirê vê perspektîfê de dinirxîne.

Bi gotineke din *'Camûs, hestiyê- kakilê ramîna xwe ji hêla însên, jiyanê û dinyê ve bikartîne, nêta wî biyanîbûna navbera raman û çalakiyê ji holê rake ango bicerribîne, ye.'* Loma jî dibêje heke çalakiyên me neşibin ramanên me an jî fikrên me xwe nespêrin çalakiyên me, welew fikr û çalakiyên me hevdu temam nekin, ewçax sedem vediguhere alaviyê, wê çaxê nirxa muhîm jiber çavan re direve, yanê însan wê çaxê dibe siyek û dikeve şûna kopiyekê.

Albert Camûs dide dû şopa nihilîzma Nietzsche û dixwaze derkeve derveyî felsefeya nihîlîzmê, ango dixwaze dikek din jî hilkişe jor, lewma camûs li gor efsaneya Sisyphosê nihilîzmê bi awayekî tewş *(absûrd)* î dikolîne û fikra <*Tewş'ê*> dibe kakilê ramîna Camûs. Têgeha <*Tewş'ê*> li gor aqil, mentiq û nelihevkirî meyzandiye û têgihiştiye ku kaînat ne li gor aqil e, li derveyê mentiqê ye û nelihevkirî ye.

Li gor camûs me biryara heyînbûn û tunebûna xwe nedaye, loma jî jiyana însên bêwate û tewş e. Albert Camûs di peresana fikirandina xwe dike du beşan: Serdema beşa yekemîn li ser fikirîna <*Tewş'ê*> ye, ji ber vê yekê jî întixarê *(xwekuştinê)* dihûne. Serdema beşa duyemîn jî li ser esasê <*Serhildan e*> lewma jî camûs ji bo herdu serdema wiha dibêje: Hevbeşbûna herdu serdema jî talî ger MIRIN be, wê çaxê jiyan bêwate û tewş e.

Serdema ewilî di hundirê efsaneya felsefeya Sisyphosê de ye û di hundirê vê felsefê de tewşbûn *(bêahengî-nelihevbûnî),* tenêbûn û întîxar heye. Serdema dudiyan jî li ser têgehên <*Serhildan û Piştgiriyê*> radiweste. Camûs serhildanê jî jihevvediqetîne û dike du cûreyan, ku yek jê metafîzik a din jî dîrok e.

Di bingeha serhildanê de ango di ramana serhildanê de, exlaq û metafizîk cihekî girîng digirin. Camûs, serhildanê li hemberî şoreşên polîtîk û dîrokî di bêjinga serê xwe de diwerdîne. Bi xêra efsaneya ***Sisyphos'ê*** <*Hişmendiya Bêahengiyê*> derdikeve holê, însan jî li gorî vê hişmendiyê pozîsyona xwe bicîh dike. Di <*Serhildana Însên*> de ev hişmendî vediguhere serhildanê û dibe helwesteke çalak. Ev jî dibe sedema têkiliya takekesî û civakî û takekesî û gerdûniyê. Belam di cerribandina bêahengiyê de êş takekesî bû, lê

piştî tevgera serhildanê êdî êş dibe ya herkesî û hişmendiyeke hevpar çêdibe. Ev hişmendiya koletiyê ji holê radike, belam heman demê de jî dibe sedema pevçûnê, deshilatdariyê û şerr jî.

Camûs dibêje: *Tewşbûna dinyê li kû derê ye?* Gelek kes Camûsî weke pexemberê tewşê dibînin, ew bi xwe ji vê terîfkirine aciz dibe û dibêje <*Tewşî*> tenê çareserek e, loma jî dibêje hertişt bêhêvî û bêwateyî be, mahna tiştekî namîne, ji ber ku gava ku tu bêjî hertişt bêwate ye, jixwe bêwatebûn jî dibe watebûnek e din, ango bêwatebûn jî mahneyeke. Heke hûn bêjin dinya bêwate ye û tû mahneya wê tuneye, wê çaxê hûn hemû nirxan dixin bin simên xwe, nexwe vejiyîn bi xwexwe dadek nirxî ye. Çiqas bêhêvîtî û xemgînî di jiyana wî de hebe jî, talî di heqîqeta felsefeya Albert Camûsî de hezkirina însên û hezkirina jiyanê heye.

Camûs di derheqê baweriya Xwedê de dipirse û dibêje, gelo beyî baweriya Xwedê û kaînatê, mirov dikare exlaqekê nû ava bike? Li gorî Camûsî, bersiva vî tiştî dîsa însan bixwe ye. Ango, hertişt bi însên diqede. Camûs, pirr li ser têgeha întixarê diraweste û dibêje; <*Bi rastî jî tenê pirsgirêkek felsefeyê a girîng heye; ew jî întixar e.*> Ji ber ku jiyan hêjaye jiyandinê, an jî ne hêjaye jiyandinê ye, felsefe jî li vê bersivê digere. Camûs dibêje xwekujtin yan famnekirina jiyanê ye, yan jî derbasbûna ji asta jiyanê ye. Ango, êdî hertişt bêwate û tewş bûye. Tiştê ku Camûs li sersekiniye ango dixwaze analîz bike têkiliya aqil-rasteqîn û însan û dinyayê ye.

Li gorî Camûsî feraseta êqil, an jî xwesteka êqil, dixwaze ji dinyê fam bike û daxîne asta însên. Camûs, di têkiliya navbera însên û dinyê de, têgeha -Tewş'ê- encax bi însên dê tewşbe. Loma jî tewşbûn, ne gerdûnî ye, di hin însanan de bi awayekî çandî û reaksiyonî tê peyitandin. Tewşî, ne tiştekî vehesînî ye, têgeheke ku çanda xwe ji hestan distîne. Lê Camûsî, tewşiyê û bêahengiyê hesteke gerdûnî a însên dihesibîne û bi awirekî qederî, ango fatalîstîk dibîne û dibêjeku ev fatalîzm nayê guherandin.

Camûs dibêje, jiyankirina bêahengiyê berê însên vediguherîne serhildanê. Piştî lêpirsîna gelek tiştan gelo jiyan hêjaye an nehêjaye jiyandinê? û li gor vê pirsê; Camûs dibêje, li hemberî bêwatebûna

jiyanê û a dîrokê, du rê li ber me hene: a ewilî ***<Întixar e>*** a dudiyan jî ***<Serhildan e>*** û a dudiyan nirxekê nasandinê, di xwede vedihewîne û jiyanê jî, watedar dike. Bi kurtasî Camûs dixwaze hemû tiştên ku veguheriyane yezdaniyê *(pîrozweriyê)* red bike yan jî hilweşîne û di dewsa wê de, exlaqeke resenî tîne holê. Lê Camûs di vir de tiştekî nû danayne dewsê, bi tenê rasyonalîzma Grekiyan bêtir modernîze dike.

Li gorî Camûs, efsaneya Sisyphos qeder e, ango fatalîzmeke karê însên e. Yanê însan qedera wî di mista wî de ye. Ji bêahengiyê jî wiha vedibêje; ger mirov li ser aciziya xwe çavderiya bikin, ewçax dikarin hemû pûtan bêdeng bikin. Heke qedera takekesî hebe, wê çaxê qedera gelemperî, ango fatalîzma berzî tune ye. Yanê divê tenê qala qederekê were kirin, encax mirovê bêaheng wê jî biçûk dibîne; yanê henekê xwe pê dike. Êdî em werin ser çîroka Sisyphos'ê; ev çîrok, sembola lixwevegerandina takekesî ye, jixwehaybûn e, ango tiştên însên eleqeder dike, dîsa çavkaniya wan însan bixwe yî. Nexwe, Sisyphos Xwedeyan red.

Di 1940an de nazîzm û faşîzm, xurt dibin, piştre herba dinyê a dudiyan destpêdike, hemû nirx û kevneşopî dikevein ber erdhejê, ango di bin bandora şer de dimînin. Nivîskar, feylesof û Camûsî jî wê çaxê li ser tiştên wilo zêde nediramiyan, ango li ser nedisekiniyan. Piştre nivîskarên heyînxwaz dikevin herbê, bi şer re birûrû dibin. Piştî şer helwesta xwe diguherînin, an jî merc û awira wan, diguhre, berî şer li ser *<TENÊBÛNÊ>* radiwestiyan, lê piştî rûbirûbûna wan a şerrî de, êdî li ser felsefeya welew helwesta *<PIŞTGIRIYÊ>* disekinin. Belam çiqas nivîskarên heyînxwaz ketibin herbê jî, fatalîzm nayê guherandin. Belam ji bo ku dev ji nihilîzmê, tewşî û tenêbûnê berdin felsefeyeke nû pejirandine, yanî felsefeya wan a nû *<Hêvî û Hûmanîzm>* bûye. Herçiqas felsefeya xwe guherandibûn jî, talî kakilê wan nehatibû guherandin, tenê felsefeyeke nû ava kiribûn. Bi gelemperî, dev ji felsefeya xwe bernedabûn. Sartre û hevalên xwe; him ji îdealîzmê, him jî ji materyalîzmê sûde werdigirin, ji vê dahûrandinê berê xwe didne marksîzmê.

Bi saya marksîzmê, dixwestin ku nakokiyên dîrokî yên însên û bi heyînxwaziyê jî, wuha dixwestin ku jiyana însên a kirdeyî, di nav hevdu de bihonin. Lê Camûs dibêje; rewş çi dibe bila bibe, ez qet tundiyê napejirînim û red dikim. Bi vê helwesta xwe re, li hemberî hin tevger û pratîkên marksîzmê radibû û wan rexne dikir.
Digot; serhildan di despêkê de ji bo hemû nirxên însanan pêk tên, piştre <*Esas û Koka*> vê helwestê têne jibîrkirin. Ango, serhildan ji rê derdikeve û berê wê, dikeve hêleka din. Heke serhildan ji rê derkeve, wê çaxê bi nirxên ku diparast re dikeve nakokiyê. Ango ew ê bi xwe, bikeve pozîsyona çavkaniya neheqiyê, loma jî Camûsî gava ku qala serhildanê dike, dibêje gereke mirov xwediyê helwesta xwe bin, ji rê dernekevin û felsefeya xwe jî, bi vî awayî, bi hûmanîzmê ve girê dide.

**JEAN PAUL SARTRE**: Însan, mahkûmê azadiyê ye. Di sala 1942an de Sartre, di şanoya xwe ya <*MÊŞAN*> de qarekterê <*Jupîter*> li hemberî <*Agist*> wiha dide xeberdan: *'Ev e ku raza elema danera Xwedayan û qralan, hemû însan azad in. Ger di ruhê însanekê de firîzên azadiyê zîl bide, wê çaxê êdî Xweda jî nikare bandorê lê bike. Lê ev meseleyeke civakî ye.'* Sartre di sala 1975an de, di gotûbêjeke xwe de dibêje: Yan dê însan tune bibin, yan jî dê şoreş bi serkeve û dê ew ê azadiyê pêk bînin. Armanca utopiya resen ya Sartre, xweafirandin e. Jean Paul Sartre di sala 1905an de, li bajarê Parîsê welidiye. Beşa felsefeyê qedendiye û demekê jî mamostetiyê kiriye, di wê navberê de Sartre; hertim fikiriye, xwendiye û hêza xwe cerribandiye, gelek nivîs û ceribanên wî hene; lê nexuyayî ne. Sartre, bi romana xwe ya <*Dilxelîn*> gellekî navdar dibe. Berhema wî ya <*Hebûn û Hîçayî*> piştî Bergsonî, di felsefeyeyê de berhema ku herî zêde tê xwendin e.
Şanoyên wî: Mêşan, Panela dizî, Toga Birûmet, Destên Qirêj û Miriyên Bêmezel in, romana wî ya Rêyên Azadiyê, di nav civaka rexnegiran de dibe xwedî roleke mezin, heta wekî romaneke modern a qedirbilind tê hesibandin. Di edebiyatê de wekî rêberê ewil tê pênasekirin, çawa ku Andre Gide dema di salên 1920de

dibe xwedî pozîsyoneke bêhempa, Sartre jî eynî weke Gîde di dema xwe de dibe xwediyê roleke mezin. Em êdî werin ser felsefeya wî ya heyînxwaz: Li gor Sartre, Marksîstan heyînxwaziyê weke bêçalakîtiyê û kirdeyî, Qatolîkan jî bi awayekî reşbîn û takekesî, li heyînxwaziyê nihêrtine û tewanbar kirine. Belam, berî her tiştî heyînxwazî felsefeyeke fêrkerî ye û du bazikê wê hene, bazikên ewilî fêrkerên van ***Karl Jaspers*** û ***Gabrîel Marcel*** in, bazikê dinê jî ***Heidegger*** û ***Sartre*** ne. Bazikê ewil li ser felsefeya xiristiyaniyê xwe birê dixe, bazikê din jî li ser ateîzmê.
Lêbelê hevbeşiya wan î wekhev jî, li ser vê ferasetê ye: <*Hebûn berî cewherê tê*> li gor Sartre ger Xwedê tune be, tew nebe heyînxwazî berî cewheê tê, ev heyîn berî ku were pênasekirin û têgehkirin hebû; bi gotina Heidegger <*rastiya însên e*> heyînxwazî berî cewherê tê. ***Wateya vê yekê çi ye?*** Yanî berê însan heye, ango berê însan tên dinyayê û diheyî, piştre xwe pênase dikin, dûre jî, kakilê-cewherê xwe derdixin holê. Însan berî herkesî xwe hildibijêre û dûre, tiştê ku em di serê xwe de îdealîze dikin ango em disewirînin em dixwazin herkes jî li gor vê îdealîzekirinê bêne sewirandin.

Sartre, di bin bandora pozîtîvîzmê de dimîne û bi felsefeya ontolojiyeke azad destpê dike. Sartre bi awayekî egoîst û bi awayekî resen, pozîtîvîzma ***Husserlî*** radihêlê, dineqîne û dihone; felsefeya Hegel û Heidegger jî radihêle, li gor xwe dadigerîne, piştî felsefeya van ya asta fikirandina heyînxwazî *(ontolojîst)* derbasî serdema pira felsefeya pratîk dibe, ango helwestên Marksîzmê di nav van felsefeyan de dihone. Piştî vê honandinê <*taybetiya takekesiya gelemperîn*> derdixe holê. Lê esil serdema Sartre a ewilî, li ser ramana azadiyê ye. Wekî em dizanin ku romana wî ya <*Dilxeliqandinê*> bingeha xwe ji heyînxwaziyê digre. Ev romana wî, reşbîniya jiyana rastîn dipeyitîne, Sartre di esasê de destpêka tevgera helwesta xwe ya edebiyat û felsefeyê, ji pozîtîvîzma ***Husserlî*** digre, li gorî wî pozîtîvîzm derfeteke girîng bû, hiş û dinyayê ji hevdu cuda û îzolekirî nedidît, berovajiya wê;

hakimiyeta hişmendî û giranbûna dinyaya rasteqîn, di heman demê de dihat parastin.

***Li gorî Sartre ontolojî çi ye gelo?***

Ji ber binyada armanca tevgera hişmendiyê, li gor Sartre; ger em hêza xeyalê bidin ber çavê xwe, meyla têkiliya hişmendiyê û hîçayiyê, ew ê tespît bibe. Çeşnê hîçiyatiya wenî, encax bi redkirina rasteqîniyê derdikeve holê. Sartre li ser du têgehên giring rawestiya ye: a ewilî hebûniya ji bo xwe, a dudiyan hebûniya wekî xwe.

Di a ewilî de xwebûn tuneye, tûcarî nabe wekî xwe, ango tim durûtî ew ê têde hebe. Ya dudiyan nasnameyeke xwerû ye, wekî xwe ye, saf e, xalî ye. Yanî çi be, ew e. Sartre, kesayetan jî li ser wan helwestan dinirxîne. Li gorî sartre mirov xwe dihone, ango xwe dirûvîne, yanê heyîna xwe bi destê xwe diafirîne.

Talî, Sartre li ser hîçbûnê ramana azadiyê û xwebûna xweafirandinê rawestiya ye. Sartre, heyînê dike du cûreyan; a ewilî a ku nebeşerî ye, yanê ji heyîna bireserê pêktê, a ku wekî xwe ye, yanê çi be ew e û heye. A dudiyan heyîna beşerî ye, tûcarî ne xalî ye. Ango tim nakokiyê di xwe de dihewîne, tim ji bo xwe heye. Divê em di nerînên Sartre yên civakî, exlaqî, estetîkî û hwd jî, li gorî van binirxînin; <*heyîna ji bo xwe*> ji tiştê ku heye ji giştikan cûdatir e, va ye hîçayiya despêka niqteya azadiyê.

Wekî em dizanin ku Sartre azadiya heyîna civakî, bi awayekî radîkal parastiye û pozîsyoneke dayê. Sartre fikra xwe ya azadiyê ya radîkal jî, di berhemên xwe yên Hîçî û Heyîn û Mêşan de jî haniye zimên. Ji bo Sartre, azadî û heyîna civakî wekhev in.

Sartre dibêje ku di navbera însanan de, hertim pevçûn heye, loma jî dibêje <*cihennem yên din in*>. Divê di vê pevcûnê de ango şerrî de, tûcarî û bi tû awayî, bi radeyeke mezin azadiya min nayê birîn. Di hemû fikrên Sartre de, yên ku li ser ramana azadiyê ne; têkiliya wan bi estetîkê re heye. Talî Sartre û Camûs, bi qasî feylesofiya xwe, hewqasî jî wêjevan in.

Herdu jî, felsefeya xwe li ser heyînxwaziyê bilind dikin. Helbet ramana wan ya <*Heyînxwazî û Ramana Azadiyê*> him takekesî ye,

him civakî ye û him jî polîtîk e. Esil takekesiyê diguherîne *(dadigerîne, vediguhezîne)* û vediguherîne fikreke çalak û teorîk a civak û ramyariyê.

**Çorê Arda**
22.08.15

***Çavkanî***


***1-*** *Di Dîroka Felsefeyê de Pirsgirêka Însên. N, Dr. Mustafa Gunay, Weş. Ilya*
*2- Heyînxwazî. N, Jean Paul Sartre, Weş. Say*
***3-*** *Feylesofên Sedsala Bîstemîn. N. Margot Fleischer. Weş, Ilya*


Gelî Kurdan! Eger hûn naxwazin ji hev tarûmar û winda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, û bi hevaltî û dostaniya miletên din re pêş ve herin û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.

**Dr. Nûreddîn Zaza**

# Di Felsefeya Marksîst de Bandûra Felsefeya Xwezayê ya Hegel

Di ramanên Hegel de xweza, îdeyek e (heyîna teqez e) ku ji xwe der çûye û cihêreng bûye. Têgeha îdeyê ku têgehek razber (nedîtbar, soyut) û cihêreng e, yeko yeko vediguhere heyînan, ango dibe heyîn û bi vî awayî jî dibe heyînek, dibe heyînek ji derveyê xwe. Ji ber vê çendê jî yekîtiya îdeyê, di xwezayê de bi awayekî eşkere xwiya nabe, xwe vedişêre û nûxamtî ye, lewma jî em di xwezayê de piraniyê dibînin. Herweha heyînên yeko yeko yên ku di xwezayê de hene; hebûna xwe ji xwe wernagirin, ji îdeyê werdigirin û bi îdeyê re jî bi temamî ne guncan in, di navbera wan de lihevhatinek berbiçav jî tune. Jiber vê yekê jî, di xwezayê de herdem dibetiyek li ser kar e.

Derketina derêxwe ya îdeyê ku dibe bîyaniyê xwe, di xwezayê de tê dîtin. Heyîna teqez (heyîna mitleq) ji bilî xwe, li derveyê xwe dibe heyînek û dibe biyaniyê xwe. Di ramanên Hegel de bingeha ramana bîyanîbûnê, ku piştra di felsefeya Marksîst de bûye xwediyê cîhekî girîng, ji vê niqteyê tê. Serê binî yê xwezayê ew îde ye ku bi temamî bûye biyaniyê xwe û wisa jî, xwe daye der. Serê jor *(raser)* jî nîjada mirov e ku xwedîaqil e û têdigihêje hişmendiya xwe. Nijada mirovî jî; di xwezayê de dertê holê, û di xwezayê de dibe heyîn. Lê nîjada mirovî hêdî hêdî xwe ji xwezayê dûr dike, digihêje bîra *(hişê)* xwe, ber bi îdeyê ve (heyîna mitleq) ve diqeside, têdigihêjê û bi vî awayî, ew bîyanîbûn û xwe xerîbdîtin, ji holê radibe. Careke din, digihêje yekîtiyê.

Ango yekîtiya teqez; di ramanên mirovî de carekê din tê têgihiştin, ji nû ve tê raxistin. Bi vegotineke din xweza, kedeka mezin e û dixwaze ku bigihêje bîra xwe û koka xwe binase. Herweha armanca felsefeya xwezayê jî, şirovekirin û destnîşankirina vê berfirehbûnê ye ku gav bi gav pêk tê.

**Ali Gurdilî /**20.09.2015

felsefevan@hotmail.com

## Rewşenbîr û Daneheva Zanayiyê

Di vê nivîsarê de wê em ê behsa komnetewokeke civakî bikin, ku her diçe, di civakên hemdem de girîngiya wê zêdetir tê bihîstin. Ev komnetewoka civakî, rewşenbîr in. Bê guman, gelekî dijwar e ku mirov bikaribe danasînek gerdûnî a rewşenbîran bide û heta mirov dikare bibêje ku, ev yek ne gengaz e jî.

Pênasa têgeha rewşenbîriyê û naveroka wê, li gor dem û civakan cihêrengiyekê mezin nîşan dide. Ligel vê yekê, heta ku ji destê me bê wê em ê hewl bidin, da ku em bikaribin pênaseke giştî ya rewşenbîriyê raberê we bikin. REWŞENBÎR ew kes in ku, ji wê daneheva zanayiyê pareka mezin werdigrin, ku di rastiyê de ev daneheva zanayiyê, malê mirovahiyê a hevpar e û vê zanayiyê, di bin venêrîna *(kontrola)* xwe de dihêlin. Ji ber ku ji daneheva zanayiyê para mezin rewşenbîr werdigrin, li gor pîvana zêdebûna vê zanayiyê, hêza wan jî zêdetir dibe.

Rewşenbîr ne tenê malê sedsala 20ê ye, ji demên seratayî ya jiyana civakî û heta roja me, di hemû qonaxên civakî de hebûna rewşenbîran, hatiye dîtin. Di her qonaxa civakî de, asûn û rola wan jî, cihêrengiyek nîşan daye.

Li gorî bîr û baweriya min: Mirov dikare radeya girîngiya rola komek yan komnetewokeke civakî, li gor pîvana beşdarbûna rêveberiyê bipeyîtîne. Heke em li gor vê pîvanê li babetê mêze bikin; em dikarin bibêjin ku, di hemû dîrokê de bedla ku rewşenbîr herî zêde bihêz in, sedsala 20ê ye û qonaxa civakî jî, civakên wê de yê pîşesaziyê *(senayî)* ye. Li gor baweriya gelek ramanweran, ku wê em ê di pêş de li ser ramanên wan jî rawestin; yên ku di rêvebiriya civakên wê de yê pîşesaziyê de aktîv in, rewşenbîr in. Niha, em jî beşdarê vê ramanê dibin. Encax, pêwîst e em li ser wan guhartinên ku di encama pêşveçûn û berfirehbûna teknolojiyê de dertên holê rawestin û dahûrînin. Ji ber ku, di pêşerojeke nêzîk de wê destê mirovan ji pêvajoya hilberandinê were kişandin; dê tişt tiştan hilberînin.

Di rewşeke wiha de wê mirov, ber bi daneheva zanayiyê ve biqesidin, ku ev danehev çavkaniya xebatên afiraner in. Di encama

van pêşveçûn û berfirehbûnan de wê mirov, ji wê daneheva zanayiyê pareke nêzîkê hev bistînin. Di encama van guhertinan de mirovê pêşerojê, , *(diwarojê siberojê)* wê rewşenbîr bin.

Di dewra pîşesaziya pêşketî de sebebê herî girîng ya cudatiya di navbera mirovan de, radeya xwedîtiya wan a daneheva zanayiyê ye. Di vê dewrê de rewşenbîr, wek komnetewokeke biîmtiyaz dertêne pêşiya me, ku xwediyê radeya herî bilind a zanayiyê ne.

Piştî ku mirovên civaka pêşerojê dibin rewşenbîr, *(ronakbîr)* îmtîyazên rewşenbîran jî, ji holê radibin. Ev daneheva zanayiyê ku, malê hemû mirovahiyê tê hesibandin; di civaka pêşerojê de wê bibe çavkaniyeke wiha ku, hemû mirov bikaribin jê para xwe bigirin. Wê em ê jî hewl bidin da ku, em van dîtinên xwe bi daneyên zanistî bipeyîtînin. Bi vê armancê wê em ê bi pênaseyên têgeha rewşenbîriyê yên cihêreng, dest bi karê xwe bikin, ku ji aliyê ramanwerên cuda ve hatine nasandin.

**Li gor nêrîna C. Zimmerman**: <Peyva komnetewoka rewşenbîr, *(ıntelligentsia)* di wateyeke nûjen de yekemîn car di sedsala borî de li Rusyayê hatiye bikar anîn û ji wê rojê ve jî, wateyên cihêreng girtiye. Yekemîn car, ev peyv ji bo derbirîna çîna xwendevanan hatiye bikaranîn. Ferdên vê çînê herçiqas di nav vê sazûmanê de bin jî, ew ne endamê vê sazûmanê bûn. Herwiha ev peyv, ji bo nîşandana wan kesên ku ji gel sar bibûn, hatiye bikaranîn. Di vê dewra pêşîn de çîna rewşenbîr, ji girseyên civakî; bi temamî cuda dihate dîtin û di nirxandinan de jî, ev yek derdikete pêş. Ev ew mirov bûn ku, dixwestin hemû bila rê û rêzikên civakî ji binî ve hilweşin.> **(C. C. Zimmerman. 1964. Rp: 77)**

Pirsgirêka cudahiya rewşenbîran û gel, gelekî kevin e. Mesela Herakleîtos, berhemên xwe bi zimanekî tevlîhev û girtî dinivîsand û digot ku; <ez berhemên xwe, ne ji bo ku hemû kes fam bikin dinivîsînim.> Di vê xalê de wek tê dîtin; wiha tê bawerkirin ku, çalakiya ronîkirinê *(serwextkarî)* bi tenê di bin yekdestiya rewşenbîran de ye.

Lê piştra, derbirîna biwêja rewşenbîr wateya xwe ya berê winda kir, ku li gorî vê wateyê rewşenbîr, wek piştgirê hilweşandina

sazûmana civakî dihatin hesibandin. Herweha li gorî vê nêrînê rewşenbîr, ji civakê jî dûr dihatin dîtin.
Piştî vê guherînê ji bo derbirîna biwêja rewşenbîr, wateyekê nû hate pejirandin, ku li gorî vê wateya nû jî rewşenbîr, rasterast ne bi destê xwe be jî; di esasê de bi zêhna xwe, karekî giran bi cîh tîne. Piştî vê rewşê, di civakê de biwêja rewşenbîr ji bo wan kesên ku di warê teknolojî û îdarî de dixebitin û bi navê <pêsariyên spî - white collared> têne naskirin, hate bikaranîn. Peyva çîna rewşenbîr, ji peyvên ilm û pîşeyê, şumûldartir e.
**(C. C. Zimmerman. 1964. Rp: 77)**
Di civakê de bi giştî, hebûna du celeb karên mirovî tê pejirandin:
**1-** Karên bedenî
**2-** Karên zîhnî
Li gorî angaşteke kevin jî tiştê ku, wesfa bingehîn a rewşenbîriyê destnîşan dike, karê zîhnî ye.
Li gor vê angaştê rewşenbîr, di civakê de komnetewok in *(tebeqe)* û bi karên zîhnî mijûl in. Li gorî nêzîkayîtêdaneke duyemîn jî; rewşenbîrî, li gorî pîvana erk û asûna rewşenbîran tê nirxandin.
Di vê mijarê de sê (3) dahûranî dertên pêş.
Dahûraniya yekemîn ji aliyê ***KAUTSKY*** ve hatiye pêşkêşkirin ku, li gorî vê angaştê rewşenbîr kapîtalîst nayê dîtin. Asta wî ya jiyanê, wek burjûvayan e û ew bêgav e ku, demeke dirêj xwe di heman astê de bihêle. Lê rewşenbîr di heman demê de bêgav e ku, hilberîn û hêza keda xwe bifroşe jî. Rewşenbîr, li hemberî karkeran nakeve tu rewşên dijber jî. Belam, rewşa wî ya di jiyanê de û şert û mercên wî yên jiyanî, naşibin yên karkeran û ne mîna rewşa wan e. Di vê xalê de dijberiyeka ku ji vê rewşa mentalîteyê û di şeklê ramanê de, dijberiyek eşkere *(kifş, diyar)* dertê holê.
Di dahûraniya duyemîn de jî, rewşenbîr wek grubekî têne dîtin û ji wan re <*rewşenbîrên îdeolog*> tê gotin. Wezîfeya rewşenbîrên îdeolog; meşrûkirin û peyitandina gruba çalak e. Ev rewşenbîr ew kes in ku, hemû qabiliyeta xwe arasteyî sazûmana bicîhbûyî dikin.
Ew rewşenbîrên ku vî karî pêk tînin, grubekî biçûk in û hemû rewşenbîr, karekî bi vî rengî pêk naynin.

Di dahûraniya sêyemîn de jî; gelek rewşenbîr, li cem hêza çalak cîh digrin û ramanên wan diperêzin. Çawa ku beriya şoreşa burjûvayê li cem aderan *(esîlzadeyan)* cîh digirtin; piştî şoreşê jî, li cem burjûvaziyê cîh girtin. **(F. Bon, M. A. Burnier 1971. Rp: 11)**

Ramanwerê GRAMCİ, li ser kar an ramanan, damezrandina danasîna *(pênaseya)* rewşenbîran red kiriye.

Li gor nêrîna GRAMCİ: Di hemû çalakiyên mirovî de hêleka ku bi zekayê re têkildar e heye; lê hemû kes, di civakê de wezîfeya rewşenbîran pêk naynin. Gramci, vê wezîfeyê wiha diwesfîne: Her grûbeka civakî ku di cîhana hilberî de dertê holê; ne tenê di qada aboriyê de, herweha di qada siyasî û civakî de jî çend komnetewokên civakî tîne holê. Kapîtalîst bi xwe re; teknîsyenên sanayiyê, zanyarên siyasî û aboriyê û rêxistinkarên hiqûq û kulturekê nû jî, diafirînin.

Erka rewşenbîran; pêşnûmakirina rêkûpêkiya zanayî û teknîkên zanistî û ezmûnî ye û bo berhemekî, veguherandina wan e. Ya herî kêm hemû serkarên kargehan peywist e, ku xwediyê kapasîteya rêxistinkariya civakê bin. Ev rêxistîbûn, dewletê jî diguncîne. Rewşenbîr bi awayekî organîk, bi wê grûba civakî ku girêdayê wê ne; dertên holê. **(F. Bon. M.A. Burnier 1971. Rp: 14)**

Her grubeka civakî, dikare rê ji derketina rewşenbîran re veke. Gelek grubên civakî, di derketina holê a rewşenbîran de ne xwediyê berjewendiyekî ne. Lê di civakê de grubên herî girîng; ku di civakê de komnetewokên desthilat in an jî wê bibin desthilat, pêdiviyeke wan a mezin bi rewşenbîran heye.

Komnetewoka rawşenbîr a organîk di gruba desthilat de, *(li civakên rojava, burjûvazî)* navenda dahûrînê pêk tîne û seranserê welêt berpirsiyariya serwextbûn, rêxistîbûn û hayîdarbûnê, digre ser milê xwe. Komnetewoka rewşenbîr bi awayekî organîk berjewendiyên wê gruba ku pê girêdayî ye dide nasandin û wiha dike ku li desthilatê *(îktîdarê)* bimînin. Komnetewoka rewşenbîrên serwer, du fonksiyonên civakî bi cîh tînin:

**1- Erka desthilatiyê.** *(Di hemû astên civakê de rê li gruba çalak vedikin.)*

**2- Erka zanayiyê.**

Lewra, ji bo ku civak di rêyeka baş de be û wiha jî bimîne; peywist e, ku zanayiyê di destê xwe de bigrin. Ev komnetewok ne li desthilatê ye; lê derbirîna, desthilatiya beşa çalak e. Komnetewoka rewşenbîr hewl dide da ku, ji hêla nêrîna gerdûnî ve têbigihêje cîhana civakî. Komnetewoka rewşenbîr ya serwer, wesfên gerdûnî dide ramanên xwe û wan; wek ramanên aqilane û gerdûnî, yên yekta nîşan dide. **(F. Bon. M. A. Burnier 1971. Rp: 18- 19)**

Di Serdema Navîn de celebek komnetewoka civakî a ku, bi awayekî organîk girêdayê gruba çalak bû; dêra serdema navîn bû. **GRAMCİ** dibêje çavkaniya vê kategoriya rewşenbîran, <arîstokrasiya axê *(erd, zêvî)*> ye.

Di babeta pesindana saziya feodal de dêrê, piraniya erkên rewşenbîriyê di destê xwe de digirt. Dêr ew sazî bû ku, saziya feodal şirove dikir, meşrû dikir û tegehên xwe yên resen yên derbarê mirov û dinyayê de, dikire malê hemû civakê. Dêr dibû mêzêna civakê û kartekêra avabûnê. A ku zanayiyê di destê xwe de digirt, dewlemend dikir, sansûr û belav dikir; dêr bû. Di heman demê de dêr, navenda jiyana artîstîk û kulturî bû.

Gurza ku dêrê bi arîstokrasiya axê ve girê dide, nîşana têkiliya tebeqeya organîk û wê grubê ye, ku rê li zayîna wê vedike. Rahîb di wateyeke rasteqîn de, ne arîstokrat in. Lê dêr, rasterast girêdayê saziya feodal e. Dêr roleka din jî, ku di esasê de rola tabeqeya organîk e; dilîze: Dêr, erka asîmîlasyon û şêwegirtina bijarteyan *(elîtan)* jî bi cîh tîne.

Ader, xwediyê bunyeyeka girtî *(dadayî)* ne. Li hemberê vê yekê; bunyeya dêrê, ji wan kesên ku jêdera wan gundîtî û burjûvazî ye û xwedîwesf in re, vekirî ye. Di vê bandêrê *(rejîmê)* de dêr, ji bo serkeftina civakî wê bibûya bingeh. **(F. Bon. M.A. Burnier: Rp: 19)**

Li gor nêrîna **LİBSET** jî; rewşenbîr, lodeka civakî ye û ev loda civakî, ji afiraner û pêkhenerên çandeka nû pêk tê, ku ew jî ji mirovên wek zanyar, hunermend, nivîskar, mamoste û rojnamegeran pêk tê.

Her weha mirovên wek hiqûqzan, doktor û yên ku di karê serbest de ne jî, ew di loda rewşenbîran de cîh digrin. Çimku ew jî, pêkhenerên vê çanda nû ne. Bi gotineka kurt; ji afiraner, belavker û pêkhenerê kulturê re, rewşenbîr tê gotin. Li gor **LİBSET**; rewşenbîr xwe wek rexnekerê civakê dibînin, meyla guhartina civakê nîşan didin û gelek caran, dibine biyaniyê bandêra civakî.

Niha jî ez dixwazim wek beşa dawî, ramanên **RAYMOND ARON** vebiguhezînim we: Danasîneke misoger a rewşenbîran, gelekî dijwar e. Çimku ev danasîn, li her welatî û di her bandêrî de wateyên cihêreng werdigre. Ez ji we re pêşniyar dikim ku, hûn ji têgehekê şêweyî û raser- dîrokî ***(supra- historique)*** dest pê bikin. Li her derê û demê de rewşenbîr ew kes in ku, kulturê di destê xwe de digrin û dewlemend dikin.

Ev kultur jî, wek zanist, wêje û hunerê, tê aqilê mirovan. Ji van kesan re, rewşenbîr tê gotin. Wê ez ê ji vê danasîna *(pênaseya)* şîlo dest pê bikim û çend teybetmendiyên dema me, aresteyî we bikim:

**1-** Civakên sanayiyê, ji hemû kesan re wesfeka rewşenbîriyê mecbûr dikin û ev civak, bi awayekî misoger bi zêdebûna pîşeyên <karên ne bi desta> tê wesfandin. Mirov dikare hemû kesên ku bi wan pîşeyan mijûl in, tevlî vê kategoriyê bike.

**2-** Rewşenbîrên ku ji bo karên pevrayî *(kolektîf)* rasterast xwediyê wesfeke sûdewar in, di civakê de her diçe di rêza yekemîn de cîh digrin. Civakên nûjen rewşenbîr û teknîsyenan, wek mirovên herî sûdewar dinirxînin.

Di vê meylê de mirovên beyî ku, li benda hatiniyeke bin çalakiyên xwe pêk tînin û bi afirandin û vekolanên xwe; zêde balê nakşînin ser xwe ku mirovên xwedîkultur in, wek rewşenbîr nayêtin danasîn. Lê berevajiya vê yekê, mirovên ku ji bo birêveçûna ekonomiyê xwediyê zanayiyeke jêneger in, wek rewşenbîr an entelîjansiya *(intelligentsia)* têne danasîn. Li Yekîtiya Sovyetê entelîjansiya, hemû rêveberan *(les cadres)* diguncîne.

**3-** Hejmara belavkarên kulturê, bi awayekî bêpîvan zêde dibe. Ji ber zêdebûna xwendekaran, hejmara profesoran jî bivênevê zêde

dibe. Ji ber ku hejmara xwendevanên rojnameyan zêde dibe, hejmara rojnamevanan jî zêde dibe.

Di civakên weke yê me de *(Tirkiye a.g.)* rewşenbîr, profesyonel in. Vekolan an raman, êdî wek erkekî an jî wek karekî xweşik nayê dîtin, zêdetirê vê yekê; wek rêya *(şiklê)* serkeftina jiyanê tê dîtin.

Di roja me ya îroyîn de bivênevê, hemû fîlozof profesor in; lê em nikarin bibêjin ku, ev bûyer gerdûnî ye. Her diçe rewşenbîr, zêdetir dikevin rewşa teknîsyenan; bivênevê xwediyê zanayiyeke qismî ne, ku mirov dikare vê zanayiyê bikar bîne û vebiguhêzîne.

Li hemû welatan wêjezan wiha têne nîrxandin ku, ew xwediyê teknîka ji nû ve nivîsandinê ne.

Wêjezan bi rêya vê teknîkê, tiştên ku berê ji aliyê kesên din ve hatine nivîsandin; wan ji nû ve dinivîsîne. ji nû ve afirandin *(le rewriting)* wek karekî baş tê dîtin û pereyekî baş jî tîne. Di kovarên Emerîkî de anonîmtiya gotaran û nivîsandina wan ya ji aliyên ekîban *(tîm)* ve, wan meşrû dike. TİME bi rastî jî, berhemeke hevpar e. Çend nivîsevan têne cem hevdu û gotaran dinivîsînin. **(R. Aron, 1964, Rp: 297- 300)**

Li hemberê vê peresanê *(evrîmê)* rewşenbîrên kevneşoperest, bi awayekî ji ber xwe ve; li ber xwe didin. Dema ku rewşenbîr tê gotin ne tenê doktor, mihendîz an jî parêzer têne bîra mirov.

Di heman demê de alimên olî, ku carinan wek pêxemberan têne dîtin; tê bîra mirovan. Sedemê vê yekê jî ew e ku, ev mirov ne tenê ji ber zanyarî an pîşeyê *(meslekê)* xwe; lê ji ber ku ew xwedîerdem û xwedîkultur in, mafê wan ê gotinê heye û ji ber ku xwediyê kapasîteyeke wiha ne, ew rewşenbîr têne dîtin.

**(R. Aron, 1964, Rp: 300)**

Em ji van daneyan dest pê bikin û hewl bidin da ku çend danasînên rewşenbîran bidin: Ya yekemîn ku wê ez ê navê <rast> lê bikim, rewşenbîran *(intellectuels)* bi entellijansiya *(intellgentsia)* re yek *(wekhev)* dibîne.

Li gor vê danasînê rewşenbîr, di civaka sanayiyê de wezîfeya berhêlîkirinê tînin cîh û xwediyê kapasîteyekê teknîkî ne. Danasîna duyemîn ew danasîn e ku, di dewra yekemîn ya

destpêka endustrîbûnê de hatiye pejirandin. Di dewra belavbûna şarîstaniya rojava de meyleka wiha hebû, ku hemû mirovên zaningehê diqedandin; bi navê rewşenbîr dihatin wesfandin. Li bakûra Afrîkayê heke mirovek du- sê salan biçûya zaningehê; rewşenbîr dihate dîtin.
Li gor danasîna *(pênaseya)* sêyemîn jî rewşenbîr ew kes in ku, xwediyê pisporiyeke taybet a disiplînekê ne û di heman demê de jî; ji bilî pîşeya *(meslekê)* xwe, xwediyê desthilatiyeke ehlaqî û siyasî ne jî. Li Fransayê baweriya giştî, ev tîpa sêyemîn e. Ji bilî çalakiyên xwe yên pîşeyî, yên ku heta ji dest tê wek rewşenbîran dijîn û difikirin; rewşenbîr têne dîtin. **(R. Aron, 1964, Rp: 301)**
Me li jorê hewl da ku li gor nêrîna çend ramanwerên cuda, danasîna rewşenbîran bidin. Niha jî em ê hewl bidin ku bikaribin di perspektîfeke dîrokî de li ser rola rewşenbîran ku di qonaxên cihêreng yên civakî de leyîstine, rawestin û van babetan şirove bikin. Di qonaxa pêşîn ya civakî de ku, di vê qonaxê de civakê xwe wek eşîret an jî qebîleyan birêxistî dikir; hat dîtin ku rewşenbîr, efsûnbaz û mirovên kal *(pîr)* in. Girîngiya rol û asûna wan li gor pîvana alîkariya serpereştê qebîleyê, kêm an jî zêde dibû.

Di dema Antîk Yewnanê de rewşenbîr bi zanist, felsefe û hunerê mijûl dibûn û şêwirdarî û dersdariya mirovên desthilatdar dikirin. Berî Zayînê di sedsala V. û IV.an de ramanwerên sofîst, hunera <axaftina xweşik> *(rethorîque)* fêrî mirovan dikirin, ku ev yek di wê demê de bo serkeftinekê siyasî bêgav dihate dîtin. Sofîstan debara xwe, bi hatiniya dersdariyê pêk dianîn û bi piranî, ders didan zarokên arîstokratan. **(A. Şenel, 1968. Rp: 29-30)**
Di qonaxa feodal a civakî de zanist, felsefe, olzanist û çalakiyên zîhnî; ên wek hunerê, di destê zilamên olî de bû. Dêra ku bi xêra bexşan bibû xwediyê erdên *(zêvîyên)* mezin, di dewra dawîn ya feodalîzmê de di qadên civakî, ekonomîk û siyasî de serwer bû.
Bi vî awayî zilamên olî, bi begên feodal re bûne şîrîkê îktîdarê.
Di dewra Antîk Yewnan û Romayê û li Ewropaya Serdema Navîn di dema derbegîtîyê de şuxlên bo hilberandinê, bêrûmet û wek şuxlên kolê û serfan, hatine dîtin. Di pergala feodal de bi pêvajoya

endustrîbûnê re, berevajiya begên feodal; muteşebîs bêgav bû ku, bi awayekî çalak hilberandinê bike. Peywistbû ku şuxl di civakên sanayiyê de wateyeke nû bistîne; nexwe, wê tu rûmeta çalakbûna muteşebîsan tunebûya.

Luther û Calvîn, vê rûmetê dane kar û şuxlên bo hilberandinê. Nemaze, Calvîn çalakiyên bo dinyaya din û çalakiyên bo hilberandinê ji hevdu cudakir, pêşiyê da şuxlên hilberandinê û ew rûmeta ku ji bo muteşebîsan peywist dihate dîtin, da wan. Di destpêka endustrîbûnê de li welatên rojava, hem sermiyan û hem jî rêvebirina sermiyanê, di destê muteşebîsan de bû.

Di hemû veberhênanên xwe de muteşebîsan, bi serê xwe biryaran didan. Pêşveçûna teknîkî hewqas zû bi zû bi pêş ve diçû ku, kargehên mezin û organîzebûna wan wek dêw û muteşebîs jî, wek qambostan (*acûcan)* man.

Hasilê mirov dikare bibêje ku, bi berfirehbûna avahiya teknolojîk û organîzebûna wê ya civakî re kar, *(şuxl)* ji pêkanîn û birêvebirina şexs û malbatekî derketiye. Pêdiviya sermiyanê ya vê avahiya mezin a teknolojîk, bi awayekî bêsînor zêde dibû. Hêza muteşebîs û şîrîkatiyên malbatî ne bes bû ku, bo vê avahiya teknikî-rêxistînî têra xwe fînansmanê peyda bikin. Beramberê vê pêşveçûn û guherîna civakî, bo veberhênanên nû; peywist bû hemû çavkaniyên diravî werin bikaranîn.

Ji ber vê sedemê bi rêya senedên pişkî *(hisse senedi)* hewl dan, ku vê fînansmanê peyda bikin. Di encamê de şîrîkatiyên *(şirketên)* mezin, ku girseyên gel têde xwedîsermiyan in, hatin damezrandin; sermiyan û rêvabirina sermiyanê, ji hevdu veqetiya. Yên ku sermiyanê bi rê ve dibin rewşenbîr in; lewra, ew di civakê de zanayiyên ku hene, di destê xwe de digrin.

Di bin ronahiya zanayiyên li jor de; gelek ramanwer wiha bawer dikin ku, di civakên wê de yê sanayiyê de wê rêveberî bikeve destê rewşenbîran. Ji bo danasîna rewşenbîrên vê dewrê de têgehên wek teknokrat, burokrat, tekno-burokrat, entelijensiya, *(intelligentsia)* û merîtokrat, hatin bikaranîn.

Em hinekî jî behsa wan ramanweran bikin: **Wright Mills** di vê babetê de wiha dibêje: <*Di şanogeha (dika) kapîtalîzmê ya pêşwext de, yên ku makamên sanayiyê vegirtine; rêveberên kargehên mezin in. Ew nûneriya elîtên civaka nû ya ekonomîk dikin, tiştên ku herî zêde têne xwestin wan di destê xwe digrin, mirovan behrêlî dikin û projeyên mezin diafirînin.*> Ji demekê kevin ve tê zanîn ku, xwediyê malên bazarê û rêveberên wê; ji hevdu veqetiya ne û ê yekemîn, xwediyê hêzeka nerasterast e. Lê bi awayekî giştî, ji destpêka serdema me ve û heta roja me ya îroyîn, şoreşeka rêveberiyê tê dîtin û wiha tê fikirîn ku, wê ev rêveber dewsa *(şûna)* xwediyê milkên mezin bigrin û wê bibin çîna rêveber ya siberojê. **(C. W. Mills, 1966. Rp: 122- 123)**

***Li gor nêrîna Alaîn Touraine**: <Grûba çalak a nû, nikare berpirsiyariya veberhênanan hilgire ser xwe û xwedî li kezencê derkeve. Ev grûb ji wan kesan pêk tê ku, ew bi tenê veberhênanên nû pêşnûma dikin.>*

Îdeolojî û xizmeta wan, îdeolojiya dewlet û ekonomiyê ye; ya wê partiya ku li îktîdarê ye, ehlaqê wan ehlaqê sedemîtiyê ye, vebizava wan jî; ji fermankirinê zêdetir, berhêlîkirinek e.

Prensîpa beşa rêveber ya berê, xwedanî *(mulkiyet)* ye. Lê prensîba beşa rêveber a nû, alîkariya zanayiyê ye. Ango, bi asta perwerdeyê tê destnîşankirin. Teknokrasî, di heman demê de merîtokrasî ye jî. *(Meritocratie)* Merîtokrasî, çavdêriya mirovên xwedîdiplome dike û kesên ku nû beşdarê berokê dibin, wan dide bijartin.

**(A. Touraine, 1975. Rp: 9)**

**Dahrendorf** û **Galbraith** jî, heman ramanê parve dikin. Di bin ronahiya van zanayiyan de meriv dikare bibêje ku, wê rêveberiya civakên wê de yê sanayiyê di destê tekno-burokratan de be; an jî dertê holê ku, wê bikeve destê wan.

Em jî beşdarê vê ramanê dibin. Lê em dibêjin ku, wê ev dewr gelekî kurt be. Teqla *(rîtma)* pêşveçûna teknolojîk, wê di kurtedemekê de rê li guherîna sîstema civakî û avahiyên wê veke û wê di demekê kurt de guherînên mezin pêk werin.

Ji ber ku heta roja me ya îroyîn daneheva zanayiyê di bin kontrola beşeke civakî de bû, vê yekê; asûneke biîmtîyaz dabû wan. Em ji vê beşê re bi kurtî, dibêjin rewşenbîr. Heta roja me ya îroyîn

mirovan hewl dane ku, ji bo pêdiviyên xwe yên hovane; wek xwarin, vexwarin, wergirtin û vehewînê, *(sitariyê)* hilberînin.
Bi destê tiştan hilberandina tiştan jî, ku di serdema me de dest pê kiriye û her diçe belavtir dibe; mizgîniya qonaxeka nû a civakî dide me. Niha jî bo peyitandina ramanên xwe, ez ê hewl bidim da ku bikaribim çend zanayiyan vebiguhezînim we: Di qonaxa otomasyonê de em dibînin ku hêza kedê, di pêvajoya sanayiya çêkirinê *(îmalatê)* de li derve tê hiştin.
Di vê dewrê de makîne, bo hilberandinê êdî xwe bi xwe; xwe amade dikin, kontrolê dikin, hildibirînin û xwe kontrol dikin.
***M. Gardellînî:*** *<Heke makîneyek pêdiviya hêza mirovî îfade bike, wê demê ev yek; mekanîzasyon e. Lê heke makîne beyî ku pêdivî bi hêza mirovî bibîne; xwe bi xwe hilberandinê bike û xwe kontrol bike, wê demê di vir de otomasyon heye.>*
***M. Chevillotte jî wiha dibêje:*** *<Di otomasyonê de têkilîpêanîna mirovan, ji holê radibe.>* **(O. Tuna. N. Ekin. Rp: 16)**

Bi hatin û bikaranîna otomatîzasyon, sibernetizasyon, şimîzasyon *(chimisation)* û hwd re, êdî karên *(şuxlên)* hêsan ji holê rabûne. Ev teknîkên navborî, rasterast hemû kirariyên *(îşlemên)* teknîkê tevlî sîstema hilberandinê dikin û mirovan, dahf didin derveyê hilberandinê. Tê dîtin ku şuxlên mirovî, ber bi çalakiyên afirandêr ve têne guherîn. Çalakiya zanistî, teknîkî û afirandêrî, bi temamî karekî cuda ê mirovî ye û ne karekî basîd ê sanayiyê ye. Lewra, ew qutbûniya ku di navbera derfet û armancên mirovî de hebûn; ew ji holê rabû ne. **(Richta, 1974. Rp: 130)**
Şoreşa zanistî û teknîkî, li ser hêza mirovî ya afirandêr hate damezrandin. Di bin ronahiya van zanayiyan de dema ku mirov li bûyerê mêze dike, bi awayekî eşkere tê dîtin ku wê di dinya pêşerojê *(siberoj, diwaroj)* de hemû mirov bibin rewşenbîr. Çalakiyên afirandêr, wê ji layê rewşenbîran ve werin afirandin. Heta roja me ya îroyîn ji ber ku ew xwediyê daneheva zanayiyê bûn, ew wek mirovên biîmtîyaz derketibûn pêşiya me.
Ger di pêşerojê de rewşenbîra hemû mirovan were pejirandin, wê demê dê di civakê de komnetewoka rewşenbîran jî ji holê rabe.

Daneheva zanayiyê ku mîrata hemû mirovahiyê ye, dê bibe malê hemû mirovan.

**Prof. Dr. ONAL SAYIN**

***Jêder***


***1)*** *ARON R: La Lutte de Classe, Parîs, 1964, Gallimard*

***2)*** *BON, F. BURNÎER, M: Les Neuveaux Intellectuels, Parîs, 1974,*

***3)*** *MILLS, C.W. : Les Cols Blancs, Parîs, 1966, Peints.*

***4)*** *RİCHTA, R : La Civilisation au Carrefour, Parîs, 1974, Seuil.*

***5)*** *TOURAİNE, A: Anciennes et Neouvelles Classes Sociales, Nanterre, 1975, Faculte des Letteres.*

***6)*** *TUNA, O.-EKİN,N:Otomasyon, Stenbol 1970, weş. F. Îktîsadê.*


***7)*** *Zimmerman, C. Wergêr: KURTKAN, A: Dersên Sosyolojiya Nû. Stenbol, 1966. Weşanên Fakulteya Îktîsadê.*


**Werger: Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

***Serf:*** *Di dema pergala derebegîtiyê de, koleyê ku bi erd û zêviyan re hatine kirîn û firotin.*

***Civakên wê de yê sanayiyê:*** *Civakên ku ji dewra sanayiyê derbas bûne.*

***Çavkaniya Gotarê:*** *Semîner 2/3. Pirtûka vekolanên felsefe, perwerde, psîkolojî, civaknasî û Antropolojiyê. Weşanên Zan. Egeyê. Berfenbar 1983- Çileyapaşîn 1984. Çapxaneya Tîcaretê/Îzmîr. Rp: 121- 128.*




# Felsefeya I. Kant ya Ehlaqê

Feylesofê ku armanca tevgerên me yên ehlaqî wekî wezîfeyekî (erk, vatinî, peywir) dibîne, I. Kant e.

Kant wiha pêbawer e ku tevgera ji vatiniyê tê, tevgera rast e. Dîsa dibêje ku di gerdûnê de û li derveyî gerdûnê, tiştek tenê heye ku em dikarin wê bi baş binavînin. Ev tişt jî vatinî (wezîfe, erk, peywir) ye, xwestina (daxwaza) '**baş'** e. Lewma jî, armanca tevgerên me yên ehlaqî, ne bextewarî ye. Çimku bextewarî, li gor mirovan diguhere (guhêrbar) e.

**Kant wiha dibêje:** 'wiha tevbigere ku ev tevgera te, ji bo hemû mirovan bila bibe zagonek û tevgerîna li gor vê zagonê jî, bila bibe vatiniya (wezîfeya) hemû mirovan.'

Di vê xalê de mirov dikare bibê je ku I. Kant, ji zagona ehlaqê ya **subjektîv/kirdewar** dest pê kiriye û xwe gihandiye zagoneka ehlaqê ya **objektîv/neterefgir.**

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

# Thales û Teoriya wî

Dîroka felsefeya rojavayê, adeten ji vegotina jiyan u dîtinên Thales, filozofê ku xelqê Miletusê bû, tê dest pêkirin. Jiber ku berya Thales de tu ramyarekî filozof yê hatibe nasîn nîne. Ji vî alî ve bi wateyekî dikane were gotin ku ew yekemîn filozof bûye. Hin kesan, bona îspat bikin Thales 'yekemîn filozof' e, gotinekî Arîsto ji xwe re kirine delîl; Arîsto di berhema xwe ya bi navê Metafizîk de dibêje: 'Tales yê ku felsefe damezrand...'

Ji vê hevokê diyar dibe ku ew bi rastî yekemîn fîlozof bûye. Lê pirsgirêk ev e ku hemî kesên Metafizîk wergerandine zimanên din, hevoka Arîsto bi vî awayî vernegerandine an tercume nekirine; meselen hinekan ev hevoke wuha kulubandine zimanê xwe: 'Thales yê ku felsefekî wisa damezrand...' ev gotine, luzûmen *(bipêwîstî)* wateya yekemîn filozof bûna Thales nade. Dibe ku bi riya serlidana berhema Arîsto ya ku bi zimanê Yûnanî ye, pirsgirêk bête çareserkirin. Lê di her halî de, ku em ji gotina Arîsto raborin, ya rast ev e ku berya Thales de em rastî tu filozofekî naskirî nayên. Silsilek an rizêkek ji nêrînên zanistî yên Thales hejmartine ku emê têkildarî wan nebin. Çimkî ev nêrînene, kêmzêde di hemû pirtûkên diroka felsefê de cih girtine u hawce bi tehlîl kirin u fikrînekî hew qas dorfereh nîne. Meselen tê gotin: Wî, kusûfa rojê ya ku berya zayinê di sala 585an de rûda bû, pişbînî kiriye. An tê gotin: Yekemîn salnameya nucûmî *(teqwim)* wî nivîsiye. Ji nava nêrînên Thales, emê tenê sê nêrînên sereke û bingehîn vebijin û bikin mijara likolînê.

***Sê Nêrînên Bingehîn Yên Thales***

***1. Esasê Hemû Tiştan Av e***

Xuya ye Thales yekemîn ramyar e ku bawer kiriye li paş piratîya cîhana xwezayê de yekîtîyek li ser kar e; ango hemû tiştên cûrecûr yên cîhanê pêk tênin, xwedî yek çavkanî ne û ji yek tiştî hatine çê kirin. Bi gotinekî din hemû mevcûdat u heyberên cîhana maddî, sûret û rûyên guherbar yên regezekî herî sereke û herî dawî ne; regezê ku hemû jê çê bûne û serancam dê dîsa lê dagerin.

Heke em bi riya şibandinekê rave bikin dikanin bijên: Tişt, mîna pêlên oqyanûsekî ne; li gel ku ji hev cuda e û ne yek in û her yek xwedî bandûr û taybetmendîyên cuda ne, hemû ji zikê avê têne der û dîsa vedigerine avê. Wekî ku av regezê yekemîn û dawîn yê pêlan hemîyan e û her pêlek ji avê dest pê dike û bi avê dawî dibe *(helbet pêl di heman hal de ku pêl in av in jî, ne ku sêrida av bûn û niha pêl in u paşê bibin av).* Cîhana xwezayê jî, li gor dîtina Thales xwedî rewşekî wuha ye, ango tişt hemû ji tiştekî ku *'maddetu-l mevadd'* ê cîhane ye,[1] hatine çê kirin. Thales dibê: Ev maddetu-l mevadd an jêderka hemû tiştan, av e.

Derheqê vê raya ku me neqil kir de, du xal hene ku hêjayî gotinê ne: A yekem, pê hesîna bi vê yekê ku di pişt piratîyan de yekîtîyek heye *(piratîyê de yekitî)* [2] bi serê xwe karekî zor girîng e û zihnekî zehf deqîq u jêhatî yê felsefî dixwaze. Lewra ya ku em bi alîkariya sehekên xwe ji cîhanê bi dest dixin, jibilî piratî û cûrecûriyan ne tiştekî din e; ango em di cîhanê de mewcût û heyberên rengareng û cûrecûr dibînin ku her yek xwedî şikl, endaze û rengekî taybetmend e û eser û xusûsiyetên ji hev cûda ji xwe didin der. Eger em tenê bi riya sehek û hissên xwe bi cîhanê re rûbirû bibin, em qet cîhanekî yekpare û yeksan nabinin. Lewma, ferq kirina vê yekê 'ku berya Thales me ji tu kesî nebistiye' nîşaneya hizrekî kûr e. Xala diyem ev e ku baweriya bi *'piranîtiye de yekitî'* xwedî pêşferzekî *(presupposition)* ye ku ji eslê wênê *(yanî ji bawerîya navborî)* girîngtir e. [3] Ev pêşferz jî, pejirandina ferqa di navbera 'heyîn' *(reality)* û 'xuyîn' ê *(appearanse)* de ye.

Zîra heger em tenya li sehekên xwe guhdar kin, em tu caran yekîtîyekê îdrak nakin; li gel vê hindê heke kesek îddîa bike li pişt

---

[1] Di terkîba 'maddetu-l mevadd'e, pêyva 'mevadd' *(ku muzaf ileyh e)* pirejmarê peyva 'madde' *(muzaf)* nîne, çiko 'mevadd' li vêrê tê wateya 'tiştên cihana xwezayê' u 'madde' tê wateya 'maye' ango 'jêderk' a wan tiştan. Li gorî vê yekê, ev îstilah an biwêj naye vê manaye ku 'madde' bi xwe yek ji 'mevadd' a ye.

[2] Unity in Plurality.

[3] Helbet ev bawerîya hane xwedî hinek pêşferzên dine jî, lê ya berbiçav hama ew bû ku hate gotin.

piratîyên ku sehekên me şanî me didin de yekîtîyek heye, şor û gotina wî kesî bi tevahî li dijî wî tiştî ye ku sehekên me ji me re dibijin u pejirandina îddîaya wî kesî pêwîst dike ev yekê were qabûl kirin ku ‘heyîn’ û ‘xuyîn’ ji xeynî hev in ango ji hev cuda ne; ‘heyîn’ yanî tiştê ku birastî hebe ye *(=şey’un fî  nefsîh ango tiştê ji xwe heyî)* û ‘xuyîn’ yanî tiştê ku xuya zihnê me dibe an xwe pêşkeşî zihnê me dike ye *(=şey’un leda ezhanîna ango tiştê li cem zihnê me).* Bi tabîrekî din, her tiştê ku di alema tebîetê de ji xwe heye, ‘heyîn’ e û her tiştê ku em bi riya sehekên zahirî *(xuyakî)* ji alema tebîetê an ji xwezayê îdrak dikin ‘xuyîn’ a alema tebîetê li ber hêza îdrakger û têgijer ya me ye.

‘Xuyîn’a cihanê ‘her wekî me got’ piranîtiyan û cûrecûrîyan dide nîşan dan ango ji piratîyê hikayet dike. Bes *(nexwe)* eger em qailî yekîtîyekê bin ku ev kesretên *(piratîyên)* hane lê werin dagerîn, em neçar in qebûl bikin; cîhan, xwedî ‘heyîn’ekî ye ku ‘yekîtî’ya cîhanê pêk têne û xwedî ‘xuyîn’ekî ye ku ‘piratî’ya wê ye.

Ango cîhan dikane bi awayekî be û di zihnê me de bi awayekî din xuya be. [4] An ne, heger kesek bawer neke ku ji ‘xuyînan’ wêdetir ‘heyîn’ek heye, nikane bibêje; li gel hemû piratîyên ku dibîne, yekîtîyek li ser kar e.

Ferqa di navbera ‘heyîn’ û ‘xuyîn’ê de tê wê maneyê ku bi riya ‘xuyînan’ kifş bûna rastiyê an bi gotinekî din, li ev hatina

---

[4] Veqetandina ’heyîn’ u “xuyîn”ê ji hev ya ku me derbarê Thales de anî zimên, mîna veqetandina hane ye ku Kant di navbera wan her dûyan de pê qaîl bû. Lê dû ferqên wan ji hev hene: A yekem ev e ku gotina Kant –qe ne be li gor îddîaya wî bi xwe- ’pêşferz’ nîne, belkî “mesele”ye, çimkî pêşferz ji wî tiştî han re tê gotin ku ji yên din tê xastin wînî qabûl bikin bêyî ku delîlek ji re peyda kiribin. Lêbelê mesele mihtaçê delîl anînê ye u ji yên din tê xastin ku wênê, bona ku delîla wê bihêz e, bipejirinin u Kant ji vê îddîayê re delîl anîye. Ferqa diyem ev e ku gotina Thales tenya derheqê cîhana xwezayê de ye. Lê veqetandina Kant, ferq xistin navbera mijara nasînê her wekî ku heye u her wekî ku li zihnê me xuya dibe ye, çi mijara nasinê, tiştekî ji cihana xwezayê be u çi jî tiştekî ji cîhana derveyî xwezayê *(ango metafizîkê)* be ferq nake. Bi gotinekî din, şora Kant ji ya Thales ji alîyê misdaqî *(mînakî)* ve amtir u gelempertir e.

*mutabiqet-a)* zihn û eyn *(rastîya li devreyî zihn)* bi hêsanî ne mumkîn e pêk were. [5]
Ev îddîaya Thales ku dibê; 'esasê hemû tiştan av e', ji du îddîayan pêk hatiye: A yekem ev e ku 'tişt, xwedî esasekî ne' û ya duyem jî ev e ku 'ev esasê hanê, av e.'
Heya niha me her çi got, derheqê îddîaya yekem de bû, lê bersiva vê pirsa hane ku misdaq an mînaka eynî ya beramberî wî 'esas'î çi ye; bi riya îddîaya diyem hatiye dayin. Îddîaya yekem, şorekî *(gotinekî)* xurt u metîn e, feqet îddîaya diyem şorekî rast nîne; helbet her du îddîayên hane, hevdû pêwîst nakin ango ne mulazimê hev in û mirov dikane îddîaya yekem kabul bike û di heman demê de ya diyem red bike.

*Thales çawa an ji kuderê fêm kir ku jêderk û 'maddetu-l mevaddê' cîhana xwezayê, av e?*

Bo dirokzanên felsefeyê, bersivandina vê pirsê karekî çetin e. Hinekan gotine: [6] Sedemê ku ev fikre xistiye zihnê Thales, jiyana deryavanîyê bûye ku bi xelqê Miletusê re hebû ye. Lewra kesê ku zêde bi avê re mijûl dibe, dibîne dema av riwîn e, xwedî hêndek xusûsîyet e û ji ber germayê vediguhêre tiştekî letîftir *(teniktir) (helm)* û hinek eserên din ji xwe nîşan dide, her wisa dema ev ava hane diqerise hîn zêde tîr *(sift)* dibe *(tekasuf=density)* û vediguhêre qeşemê, eser u taybetmendîyên cûda peyda dike; dîtina van bûyeran dikane bibe sedemê vê yekê ku zihnê bîner, vê cereyanê sirayetî hemû heyokan bike u wana wek şiklên teniktir an jî tîrtirê avê bizane.
Aristo di Metafizîkê de ji vê mijarê re du delîlên felsefî yên din bibîrdixîne, lê wekî ku ji dirokzanên felsefeyê pir kesan îtiraf

---

[5] Beravajî vê pêşferzê, di Felsefeya Îslamî de "mutabiqeta zihn li gel eyn" wek pêşferzekî hatiye pejirandin, zîra di vê felsefeyê da, "mîna hev bûna alema/cîhana aqlî u alema eynî" tê xastin u ev jî tê vê manê ku; li hev hatina zihn u eyn an mutabiqeta zihn li gel rastîya derveyî zihn, gengaz e.
[6] Bn. Frederick Copleston, *Dîroka Felsefeyê (A History Of Philosophy)*, cîlda yekem: Yûnan u Rom, vergera Seyid Celaleddin Muctebevî, çapa diyem, Şirketê Întişaratê Îlmî u Ferhegî u Întişaratê Sirûş, Têhran, r. 32.

kiriye, her du delîl jî mubhem u zehf telvîhev in. Lewra mirov qanî jî nakin. Delîlê yekem wuha ye: 'Şayed wî *(ango Thales)* dîbe ku xwarina hemû tiştan ter e û germahî jî, ji terîyê çê dibe u heyîna xwe ji wê distîne; û pê re ew gihîştibe vê rawêjê.' [7]

Delîlê duyem jî ev e: 'Wî dîye ku tovê hemû tiştan xwedî tebîetekî terok *(mertûb)* e; hîmê tebîeta tiştên terok jî, av e u pê re gihîştiye vê engaştê.' Aristo bi xwe jî ferq kiribû ku her du delîl qanîger nînin. Lewma li pê delîlekî din dikeve û ji xwe re delîlekî sêyem peyda dike ku ewe hêdî ne delîlekî felsefî ye û ew jî, ev e: 'Dibe ku Thales ketibe bin bandûra bîr û baverîyên ol û mezhebên berê û gahabe encamekî hane...'

Qasî ku xuya dike, Aristo tu girîngiyek bi wî delîlî jî nedaye, çiko dibêje: 'Bi her hal, tê gotin ku Thales derheqê sedemê herî yekemîn de bawerîyekî wisa beyan kiriye.' [8]

Meseleya dî ev e ku mebesta Thales ji 'av' ê çiye? Gelo hema ew ava ku em bi nîşana $H_2O$ didin şanî kirin e an tiştekî din e? Av li gor raya diyema Thales dibe ku ava sade be, lê li gorî raya yekemîn li ser wateya avê, îxtilaf *(gengeşî)* heye. Kesên mîna Emîl Beriyê, qebûl nakin ku ewe tê wateya ava sade, bilam kesên wekî Rassel dibêjin: Mebesta ji avê, hema ew wateya hane ye ku em hemî pê dizanin.

Li gorî Rassel, ev raya ku dibê hemû tişt ji avê çê bûye, mirov bi tu awayî nikane wek reyekî ehmeqane qebûl bike: 'Bîst sal berî niha, teorîya ku hatibû pejirandin û ketibû rewacê digot; hemû tişt ji hidrojenê çê bûne, pêwîste neyê jibîrkirin ku hidrojen sêduduyên avê pêktîne.' [9]

---

[7] *Metafizîk (Mabedet-Tebîa),* r. 12, 13. Ji ber ku tu nivîseka Thales negiştîye ber destê me u berya Arîsto jî tu kesî derheqê nêrîn u dîtinên Thales de danezanek çê nekriye, em di van babetan de serî li gotinên Arîsto didin. Li ser vê yekê, melûmatên me derheqê wî de, melûmatên dereceya diyem in.

[9] *Dîroka felsefeya Rojavayê,* Vergera Necef Deryabenderî, Çapa Pêncem, Têhran, 1365 h., r. 59.

Di derheqê wateya peyva esil *(hîm)* de jî, dû şirove derxistine pêş: Li gorî şiroveya yekem, peyva esil tê wateya tiştê yekemîn û li gorî şiroveya duyem, tê wateya jêderk an hêmanê hemû tiştan. Gorî şiroveya yekem, berê, tiştê ku esl û esasê her tiştî ye, çê bûye û pişt re tebdîlî tişt an tiştên dî bûye û ew tiştene jî bi xwe tebdîlî tiştên dî bûne û hwd. Ev şirove bi vê yekê re lihev e *(nakûk nîne)* ku niha esl û esasê hemû tiştan tine be, çimkî di tebdîl bûnê *(vegoherînê)* de heya ku yê tebdîl dibe ji nav neçe, yê ku lê tebdîl dibe dernakeve holê. Bi gotinekî din, hetanî yê vedigore bi vegorînê re ji nav neçe, ji hundirê wî tiştek dernakeve heyînê. Helbet eve, tenê dema ku eslê hemû tiştan yek be wisa ye, lê heke ev eslê hane ne yek be belkî çend tişt bin, îmkana vê yekê heye ku eslê hemû tiştan hîna jî hebe. Bilam gorî şiroveya duyem, eslê tiştan her tim bi heyberan re heye; her wekî maddeya felsefî ya ku di goherîn û vegoherînan de her tim wekî xwe dimîne û tûşî guherînê nabe, tenê rû û sûretên *(formên)* maddê ji nav diçin û ciyê xwe didin sûretên dî.

***Gelo mebesta Thales ji wan her dû wateyan kîjan e?***

Di vê babetê de di navbera dirokzanên felsefeyê de nêrînekî hevbeş û yekgirtî nîne. Hinek dibêjin mebesta wî, 'tiştê yekemîn' e û hinek jî bawer dikin mebesta wî, 'maye' ango 'jêderk'a yekemîn e. Anaksîmender –ku emê paşê qala wî bikin- gotina Thales ya derheqê eslê tiştan de wisa red kiriye wekî ku mebesta Thales ji têgeha 'esil' wateya diyem bûye. Ji gotinekî Arîsto jî, eynî encan derdikeve: 'Li gorî ew *(Thales)* dibêje, yê ku heyber gî, jê ne û jê çêbûne û herî dawîyê, dê têde tine bibin –gewher *(cewher)* baqî dimîne lê hemû erez û halên wî diguhêrin- eslê *(mebdeyê, regezê)* [10] heyberan e.' [11]

## *2. Erd li ser Avê Sekiniye*

Sêwirana *(tesewwura)* ku derbareyê erdê de bi Thales re hebû, ne mîna 'kadekî soberok li ser avê' bû, belkî li gorî ditîna wî, mîna

---

[10] Stoikheion.

[11] *Metafizîk*, s. 12.

qursekî ku li ser avê soberokî be bû ango bi şeklê stûwanekî kêmbilind bû; lewra Arîsto dibêje: ‘Thales, erd wekî laşê dara qutkirî ya li ser avê soberokî be, dizanî.’

Derheqê vê nêrîna Thales de jî dû xal hene ku em pê îşare bikin: A yekem ev e ku; heke em vê nêrînê *(li ser avê sekinîna erdê)* bi nêrîna yekemîn re bipîvin, em ê bibinîn ku nêrîna yekemîn ji hêla çiyetî *(mahîyet)* ve nêrînekî felsefî ye.

Bilam nêrîna duyem ji vê hêlê ve nêrînekî tecrubî ye; lewra pêkan *(mumkîn)* e ku îro jî kesek bi awayekî ciddî alîgir u parezvanê nêrîna yekemîn be ango bawer bike esl û esasê hemû tiştan av e û heger bixwaze bawerîya xwe bi riya dêlîl bipeyitîne pêwîste delîlekî felsefî wêne. [12]

Bê goman red kirina bawerîya wî jî, bi riya delîlê felsefî dikane pêk were. Çiko; esasen gava em qala ‘eslê tiştan’ dikin, pêwîste em ji heddê *(sînorê)* tiştên mehsûs *(sehokî)* derbas bin ango ji tîxubê tiştên sehkirî wêdetir biçin. Û her delîlê tecrubî yê ku bo red an îspat kirinê hatibe anîn, bi çi awayî dibe bila bibe, têkildarî ‘xuyîn’a cihanê ye, hal ev e ku eslê *(hêmana)* tiştan têkildarî ‘heyîn’a cihanê ye. Bilam nêrîna duyem wisa nîne u bi hêsanî dikane pê delîlê tecrubî were red kirin. A duyem jî ev e ku nêrîna duyemîn a Thales, ne li ser hîmê nêrîna wî ya yekemîn e, ne jî encama wê ye; yanî semedî were pejirandin ku ‘av, li ser erdê sekinîye’, ti pêdivîyek pê nîne ku em qebûl bikin ‘hêmanê hemû tiştan av e.’

Bi gotinekî dî, ev nêrîn her dû, di ber hev de ne, ne di dirêjahiya hev de; ango ne li pê hev in, belkî li ber hev in. Li ser vê yekê, ji van dû nêrînan her yek bi serê xwe dikane were pejirandin; bilam Arîsto di vê babetê de, wekî ku nêrîna duyem encama nêrîna yekemîn be, axaftî ye: *‘Thales yê ku damezrînerê felsefekî wiha ye, dibêje ku av, hîm u esas e (lewma dibêje ku erd li ser avê soberokî ye)’* [13]

Divê em vê xalê jî li her dû nêrînên ku me ji Thales neqil kir zêde bikin: Carna di hinek olan de, hindek nêrîn tên dîtin ku ger çi mîna

[12] Bi gotinekî îroîn, delîlê pêşîn *(apriori)* pêwîste were anîn ne delîlê paşîn *(aposteriori).*

[13] *Metafîzîk*

gotinên Thales in lê di rastîyê de ji xeynî hev in û pêwîste ew nêrîne bi van gotinan re neyên telvîhev kirin. Meselen di Qurana Pîroz de hatiye gotin ku: وَجَعَلْنَا مِنَ الْمَاءِ كُلَّ شَيْءٍ حَيٍّ *'Me her tiştê zindî ji avê afirandîy' (Embiya/30).*

Hinekan wateya vê ayetê bi wateya nêrîna yekemîn ya Thales re eynîhev zanîne, lê qet wisa nîne; ferezen heke ev ayet wuha bûya: '*we cealna mine'l-mai kulle şey'in heyya' (me her tişt ji avê zindî kir)* nêzikatîyekî maqûl di serê mirov de disêwirî, bilam di vê ayetê de 'ceale' fiêlekî *(kiryarekî)* yek –mefulî- ye *(û tê meneya xuliqandin, afirandin û çê kirinê),* peyva 'heyy' jî rengdêra 'şey' e, ne ku bona 'ceale' têrkerê *(mefulê)* diyem e. Lewra ji nav sê qisim heyberan tenê dû qisim ango heywanat û nebatat dikanin mebesta Quranê bin ne ku tişt hemû. [14]

Hinek kesan jî goman kirine ev ayete: 'Textê Xwedê li ser avê ye' *(hûd/7)* wekî nêrîna diyem ya Thales e. Lê wekîhev bûna van li ser bingehekî sehîh nîne û heta eger em wateyên zef bilind yên ku di van her dû ayetan de hene li ber çav negrin, maneya zahir ya van ayetan jî bi nêrîn û ditînên Thales re li hev nayê; îzaha vê yekê bila bimîne daku di ciyê xwe de were dayîn.

***3. Asinruba (Miqnatis) Candar e***

Ji bona em vê ditînê fêm bikim dibe em lê binêrin ka çima mirovan bawer kirine ku ji bilî wî qalibî maddî *(peyker an beden),* xwedî tiştekî dî yê bi navê 'rih' *(= nefs, can, giyan an revan)* [15] in? [16]

Ango pêhesîna bi vê xalê, cara yekemîn li kuderê dest pê bû û zihnê mirov çiwa gihêşte vê yekê ku mirov candar û xwedî rih in? Xala diyem ev e ku çi qewimîye daku hinek mirov 'candarbûnê' li heyberên din jî belav bikin û hemûyan an ji wan hinekan 'candar' bihesibinin?

---

[14] Jibîlî vê jî, li gorî nêrînekî deqîqtir/hûrtir, tiştên zindî *(heyy)* tenê şamilî heywanan dibin u şamilî rehekan nabin.

[15] Em ferqên ku di navbera van peyvan de hene, li vira nagrin ber çav.

[16] Helbet gava nobet hate likolîna bîr u bawerîyên Soqrat, emê nêrîn u nezerîyatên ku derbareyê rih de hatine îbraz kirin bi dorferehî bigrin dest.

Ku em werin ser pirsa yekem, hîna bersivekî ku dawî li hemû niqaşan anîbe lê nehatîye dayîn; mirovnasan *(anthropologists)* vê derbarê de nêrîn u dîtinên cûda îzhar kirine ku eger çi ji wan hinek ji yên din bihêztir in lê ji wan tu yek qethî *(teqez)* nîne. Em ji van nêrînan îşaretî çendekan bikin:

**1-** Hin kesan gotine: Gava însên xwe di avê de an di sethekî din î sîqalkirî de didît bi xwe re difikirî, eqlê xwe dişixuland u digot ji bilî min kesekî din jî *(di avê de an di neynikê de)* heye ku eger em nebêjin beşekî min e, zef mîna min e. Însên bi vî awayî, bawerîya xwe bi heyberekî din anî ku ji demên qedîm *(antîk)* ve jê re 'hemzad/hevza' *(heyberê ku bi welidîna mirov re ew jî diwelide)* digotin. Di rastiye de, yê ku em jê re 'nefs' dibêjin hema 'hevza'yê fîlozofên berê ye. Heke ev nêrîn rast bûya, dibû ku mirov bawerîya xwe bi candarbûna hemû tiştan bianîya, çiko teswîr û wêneyê her tiştî di avê de *(an di neynikê de)* xuya dibe.

**2-** Hin mirovnasan gotine: Heydarbûna mirov ji vê yekê ji cîhana xewnê hatiye der; mirov di xewna xwe de dibîne ku diçe derna, bi hin kesan re hevdîtinê pêk tîne, deng dike û hwd…

Dema mirov ji xewê şiyar dibe serincê didê *(mulaheze dike)* ku li alîyekî bi guwahîya kesên dî, li cîyekî sekinî maye û di heman demê de bi guwahî û şahîdiya xwe çûye cîyên dî û kar û xebat encam dane. Li alîyê din nikana ji van guwahîyan tu yekê înkar bike, lewra bawer dike ku ew, dû ta ye: Yek beden e *(ku mijara guwahîya kesên din e)* û yê din rih e *(ku mijara guwahîya wî ye);* ev nêrîne ji ya pêşîn zaf qewîmtir û bihêztir e.

**3-** Hinek mirovnasên din, 'dîtina mirîyan di xewê de' kirine palpişt u dibêjin: Însanên ku dimrin *(bi taybet di çend rojên yekem yên piştî mirinê de)* pir caran dikevin xewnên heval u hogirên xwe. Ev yekê dibe sebeb ku ferd, digel wî heyberî ku defnî axê hatiye kirin, bi heyberekî dinê jî ku bi tevahî mîna wî ye –ku di xewnan de wan dibîne- bawer bikin.

**4-** Hin kesan jî hewl dana ku vê yekê bi palpiştîya 'serpêhatîyên mirîyan' bidin peyîtandin; di domahîya dirokê de carna dibû ku di hin kesan de ku li gorî dîtina kesên din temamen mirî dihatin

hesibandin, hal û rewşên cûda peyda dibûn *(mînanî kêmbûna dereca germahîya bedenê, hetanî sifrê daketina pestoyê xwînê, vebûna pelkên çavan, sekinîna qelb u hwd... bi gotina deqîqa îlmî, ji nav çûna hemû nîşanên jiyanê),* bilam ew ferdên ku mirî hatibûn hesibendin ji demekê şunde dîsa vedigerîyane jiyanê û di derheqê ew tiştên ku li domahîya peyda bûna nîşanên mirinê bi wan re dîtibûn de gotinên balkiş dihanîn zêmin. Ji van gotinan re 'serpêhatîyên mirîyan' dibêjin. Ev yeke *(vegerîna li jiyanê)* îro li gel pêşveçûna zanist û teknîkên nû û hebûna techîzat û alavên pijîşkî, ji berê zef pirtir diqewime û bi riya fenomenê 'îhya'yê yan 'ji nû ve zindî kirin'ê *(resuscitation)* gelek kes pêştî ristek emeliyatên pijîşkî li jiyanê vedigerin. Li gorî mirovnasan, 'sepêhatîyên mirîyan' bona însanan di wateya îspat bûna rih *(nefs)* de bûye. [17]

**5-** Hinekan gotine: Merasîmên ku ol û mezheban destûr dane ji bona mirîyan werin li darxistin, bûye bais ev hizre têkeve zihê mirovan ku mirî şayet hîna ji kesayet û nasnameyekî berxwedar in ku hema rihê wan e. Ev nêrîne –wekî ku xuya ye- nêrînekî sexîf û bê bingeh e. jiber ku ya rast ev e ku adap û emelên dînî yên jibo mirîyan tên lidarxistin, encama bawer anîna bi hebûna nefsê ye, ne ku bawer anîna bi hebûna nefsê, encama adap û merasîmên dînî be; eve, telvîhev kirina cîgehê sedem *(îllet)* û encamê *(melûl)* ye.

Ku em werin ser pirsa diyem pêwîste bête îzan kirin: Ajo û saîqên ku hinek fîlozofên qedîm/antîk *(qudema)* sewqî bawer anîna bi anîmîzmê *(tevcandar engarî; hizra ku hemû tiştan candar diengarîne an dihesibîne)* kirine u bûne baîs ku ev fikre di zihnê wan de zîl bide, ji bonî me ne diyar in; lê mirov dikane ji rizêkek emare u qerîneyan xalekî fêm bike ku ew jî ev e: Wekî xuya dike, însan ji despêka jiyana xwe li ser vê gilovera axîn bi vir ve, li ser vê bawerîyê bûye ku heger heyberek <*candar*> bête hesibandin pêwîste; ya 'hereket' bike *(biherike)* ya kanibe tiştekî din bide 'herikandin' *(yan jî ev her dû xislet pê re hebin; yanî him biherike him jî biherikîne);* ango pîvanê

[17] Îro serpêhatîyên mirîyan di nava mijarên nû yên kelamî/teolojîkî de jî, ciyê niqaşê ye u ji bona peyîtandina "xulûda nefsê" yanî ebedî bûna wê, jê sûd tê girtin.

candar bûnê, 'hereket'e *(çi bi forma herikînê (livînê) çi jî bi ya herikandinê (livandinê) be).* Nexwe jibo ku candar bûna heyberekî were peyitandin; ya pêwîste em îspat bikin ku ew heybere livok *(muteherrik)* e yan livanger *(muherrik)* e.[18]

Yûnaniyên qedîm *(antîk)* ku ji hêla olî ve bi şirkê *(îzedanperestî=polythesim)* qaîl bûn, bawerî pêanîbûn ku Xwedê dikanin di qada cîhana heyînê de tiştan bidin livandin û her xwedayek jiber ku dikanî tiştek ji halê sukûnê derxista, navê *'xwedê'* lê dikirin. Hinek fîlozof jî *(wekî Thales)* peyda bûn ku herikîn û herikandin an jî livîn u livandin wek pîvana zindî bûnê dizanîn, bilam bi hebûna xwedayan an îlahan bawer nedikirin.

Hîngê, di vê cihana tijî hereket ya bê Xwedê de, jibilî ku sedemê herikînê di tiştê herikok *(livok)* bi xwe de bête zanîn tu çarekî din tinebû. Ji dîtina van fîlozofan ve, rih *(giyan an revan)* sedemê herikînê an hereketê bû; ango heya derketina van fîlozofan, li ser dû xalan îttifaq hebû: Yek ev bû ku nîşana jîndarî an zindî bûnê, herikîn û herikandin *(yan jî, ji her dûyan yek)* e, ya din ev bû ku yê tiştan diherikîne an wana dixe hereketê xwedayek ji xwedêyan e. Fîlozofan xala yekem pejirandin lê ya diyem înkar kirin; bi gotinekî din, di tiştê herikok an livok bi xwe de li pêyî sedemê herikînê digerîn, ne di xwedêyan de, ango sedemê herikînê ji yê diherike dizanin ne ji xwedêyan.

Gava ev qediyeya hekanî ku: 'heke tiştek herikî *(livokî)* be, muherrikê *(livangerê)* wî di hundirê wî de cî girtiye *(ango candar e)'* hate pejirandin, ev pirse tê holê ku gelo tişt 'hemû' herikî u livokî ne *(û lewma ewe hemî candar in ku dibe anîmîzm)* yan ji wan tenê 'hinek' wuha ne? Thales –li gor xuya dike- ji nav tiştan tenê hinek tişt herikokî û livokî dizani bû; ango hemû tişt candar nedihesiband; lê hin dîrokzanên felsefeyê – yên wekî Capleston- [19] gotine: Nêrîna Thales, awayekî din yê anîmîzmê *(hemû candar*

---

[18] Li hinek zimanan de, dema ku navê tiştan hatine danîn ev pîvan(ê hereketê), li ber çav hatiye girtin; meselen Ereb ji heyberê ku canê wî nîne ango bêcan be re "cemad" dibêjin. Cemad tê wateya heyberê ku bê liv u bê hereket e.

[19] *Dîroka Felsefeyê*, cîlda yekem: Yûnan u Rum, r. 33.

*engarî)* bûye. Me got ku li gor ditîna Thales, 'herikandin' jî mîna 'herikîn'ê nîşana candarbûnê ye. Lewra Thales, asinruba *(miqnatisê)* candar diengaşt *(dihesiband);* zîra asinruba heger çi tiştên din nade livandin, lê bi kişandina wan ber bi hêla xwe ve, wana mecbûrî livîn u herikînê dike. Gelo ji alîye mentiqî ve durist e ku em 'herikandin'ê an jî 'herikîn'ê wekî pîvanê xwedî rihdar an candarbûnê li ber çav bigrin? [20]

Kesê ku bi riya hereketê/livê hebûna rih dipeyîtine ango îspat dike, ji hêla ontolojîk *(heyetînasî, hebûnnasî)* ve duçarî bi xwe re muqayesekirinê *(qiyasa bi nefsê)* ango mirovwar engariyê *(anthropomorphism)* bûye an bi gonetekî kelamî, duçarî 'teşbîh'ê ango 'şibihandin'ê bûye. Mirovwar engarî tê vê manê ku mirov ew tiştê *(yên mîna hestan, îhsasan u înfîalan)* ku di nava xwe dibîne li tiştên din belav dike ango li wan temîm dike; meselen eger kesek bibêje ku heyber hemî aşik u evîndarê hev in *(an jî hemî dijberê hev in),* ew kese qaîlî cûreyek 'qîyasî xwe kirin'ê an 'mirovwar engarî' yê bûye. Helbet tenê ji ber ku rayek an nêrînek ji qîyasî xwe kirinê û ji gelemperîkirinê derketibe holê, wê nêrînê bê bingeh dernaxa; belkî pêwîste derbareyê wê nêrîne de behs û nîqaşekî cûda were kirin. Em vê nîqaşê haweleyî beşa ku têkildarî Soqrat e dikin. [21]

---

[20] Ev şore di felsefeya îslamî de bi qeydekî an bi şertekî hatiye pejirandin. Ew şert jî ev e: Hereket an liv, tenê gava ku ne yeksan be *(la ala wetîretîn wahîde ango ne li ser rewşekî monoton be)* dikane bibe nîşana hebûna rih an nefsê. Çimkî livîna yeksan u yekreng ya tiştekî, ji tebîeta wî tiştî tê der ango liva wî tiştî, livekî tebîî *(dijberê liva qesrî)* u xweza ye. Lê ji ber ku tiştekî tenê, nikane xwedî livînekî neyeksan be, di liva neyeksan de qet'en tiştek li ser kare ku jê re nefs *(rih)* tê gotin.

[21] Xala ku li dawîya vê beşê de pêwîste were bibîrxistin ev e ku di warê nêrînên Thales de u esasen di warê bîrûboçûnên her fîlozofekî de divê mirov pişta xwe pê berhemên ku misilmanan nivisîne girinede. Ji ber ku misilman di warê dîroknivisînê de hew qas ne bi hêz bûne (1). Wek mînak Şehristanî di berhema xwe ya bi navê *el-Mîlel wen-Nîhel* de –ku di warê dîroka bîrûbawerîyan de ji pirtûkên herî serekê yên misilmana ye- dibêje: Thales bawer pê anîye ku gerdûn xwedî "mubdî" bûye *(ji yê ku bê kereste, bêyî ku ji tiştekî alîkarîyê bigre, ji tinebûnê diafirîne re "mubdî" tê gotin v.)* u ji bilî vê, digotiye: Hin dem bihorîne ku têde "mubdî" hebûye lê di heman demê de "mubedda" tinebûye. Şeristanî pişt re ji rûpelekî zêdetir cih dide parastina ditîna Thales u li ser vê babetê nîqaş dike ku

**Ferzan Yezdanî**
belqis55@yahoo.com.tr
22.01.2015

***Jînenigarî:*** *Ferzan Yezdanî, xwendakar û şagirtekî kurd e. Li sala 1980'ê li navçeya Dîlokê ya bi navê Nizibê/Belqîsê di meha Çileyê de çavê xwe li cîhanê vedike. Zarokatiya xwe li gundê xwe derbas dike. Li gund dibistana seretayî diqedine û dûre, fêrî Quranê û adabên olî dibe. Li ser pêşniyara memosteyê xwe yê Quranê û eleqedariya ku pêre hebû, berê xwe da medresêyên seydayên kurd û li cem wan dest bi hînbûna zanistên neqlî/dînî dike. Piştî ku hînî zanistên neqlî dibe, bere bere pêre eleqeya bi zanistên eqlî peyda dibe. Li ciyekî ku kevneşopiya zanistên eqlî bi taybet ya felsefî têde zindî ye, digeriya. Lewra piştî lêgerînekî kurt diçe Îranê û li vir tehsîla xwe tevî rêbaza klasîk ya medresî bi ya nûjen jî didomîne. Beşa pisporiya wî felsefe ye û niha di asta perwerdehiya bilind de, teza xwe dinivîse. Ji bilî zimanê zikmakî bi farisî, erebî, tirkî u heya redeyekî bi îngilîzî dizane. Zewicî ye û bavê çar zaroka ye.*

---

çiwa mumkîn e ku "mubdî" hebe lê "mubedda" yanî yê ku tê îbda kirin ango tê xuliqandin pêk nehatibe (2). Eve di halekî de ye ku tu kesî ev şore bi liv nekriye ango negotiye ku Thales bawerî bi xwedêyekî anîye u hebûna mubdî, bêyî hebûna mubedda *(xaliqê bê mexlûq)* pejirandiye. Li alîyê din di berhema Îbnî Qiftî ya bi navê *Tarîxu-l Hukema* de hatiye gotin ku Thales şagirdê Fîsaxûris e u li ba wî, fêrî felsefê bûye u yekemîn kes e ku ji heyberan re aferînendeyek li ber çav negirtiye(3). Hal ev e ku Thales berya Fîsaxûris jiya bû u fasileya zemanî ya ku di navbera her dûyan de heye, ji tu kesî re veşartî nîne.

(1) Şehîd Mutahherî di vê derbarê de dibêje: "Li nava beşên îlm u merîfetê yên giridayî çanda îslamî de, beşa ku ji alîyê seyra dîrokî ve ji hemû beşên din zêdetir nenasî maye, felsefe ye… Fîlozofên îslamî ne tenê bala xwe li seyra dîrokî ya van meseleyan nedane, hin caran ji ber hêndek sedemên taybet rê li ber telvîhevî u çewtkarîyê vekirine u gotinên ku ji vî alî de rê li ber mirov şaş dikin anîne zimên." Bn. Murteza Mutahherî, *Mecmûeyî Meqalat*, Întişaratê Cîhan Ara, Têhran, r. 9-178.

(2) Ebu-l Feth Muhemmed Bîn Abdulkerîm Bîn Ahmed eş-Şehristanî, *el-Mîlel wen-Nîhel*, Teshîha Muhammed Seyid Keylanî, Daru-l Marîfe, Beyrût, r. 61-64. (3) Îbnî Qiftî, *Tarîxu-l Hukema*, Vergera Farisî ya sedsala yazdehemîn, bi xebatkarîya Behîn Darayî, Întişaratê Zanîngeha Têhranê, r. 1-150.



# Di Utopyaya 'Bajarê Xwedîerdem' de Aqlê Pratîk

Farabî (870-950) ku li rojavayê wekî Alpharabius tê nasîn, di teoriya xwe ya 'Yên Aqilmend' de dibêje ku di pêşiya Xwedê de, di destpêkê de aqlekî yekemîn derketiye holê û ji aqlê yekemîn, bivênevê aqlekî din der çûye û giyan û asîman çêbûne.
Di warê şirovekirina bûyerên xwezayê de teoriya Arîstoteles ya 'Madde û Formê' qebûl kiriye. Li gor ramana Farabî, sedemê hemû heyînan Xwedê ye û hemû heyîn, ji Xwedê weke aqil der çûne û heyîna ku herî zêde ji Xwedê dûr e jî, made ye.
Wezîfeya mirovan jî, divê ji madeyê xwedûrkirin û ji bo nêzîkbûna Xwedê, zelalkirina rih be.
Li gor dilêrîna Farabî; bextewariya civakî encax bi riya rasteqîniyê ku ew jî hilbera aqlê pratîk e, bi rastî û başiyê dikare pêk were. Farabî wisa dixwaze ku bi riya aqlê pratîk, hem mirovên desthilatdar û hem jî yên ku têne birêvebirin (hemwelatî), xwe bigihînin civaka îdeal ya xwedîerdem. Hêmanên vê civaka îdeal ya xwedîerdem, di berhema xwe ya utopîk de ku navê wê 'Bajarê Xwedîerdem' e, destnîşan kiriye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

# Diyalektîka Budîzmê

Di Budîzmê de, ne cihê Xwedê û ne jî cihê pirtûkekê pîroz, ku bi awayê wehiyê hatiye hinartin heye. Kêm zêde di wan olên din de, mirov dibîne ku rewişt <*ehlaq*> li ser hîmê başî yan xirabiya tevgerên mirov bi cîh bûye. Mirov li gorî semaxa Xwedê tevdigerin, tiştên ku Xwedê diferme baş in û tiştên qedexe dike jî, xirab in. Bûdîzm, di vê mijarê de cuda ye. Li gorî budîzmê jî, qencî û berxwîdariya piraniyê, pîvana başî û xirabiyê ye.

**Nêrînên Gautama Buddha yên Aborî û Civakî**

Di warê aborî û civakî de, nêrînên Buddha cewaz in. Ji bo rahîb û rahîbeyan, riya xizmetekê baş destnîşan kiriye.

Buddha, yên ku ne li gorî pîvana vê mengiyê jiyane jî, wan bi <*serfkarên bêxêr yên dewletmendiya netewe*> bi nav kiriye. Ji wan re, jiyana komavayê *(communal)* pêşniyar kiriye. Di sîstema rahîb û rahîbeyan de, komunîzma aboriyê ava kiriye. *(ji bilî alavên şexsî yên ku ji layê kesan ve têne bikaranîn; weke cil, kotika parsê û hwd)*

Hemû tişt, malên komavayê dihatin dîtin. Xanî, bostan, amûratên çandiniyê, keryole, destên livînan û hwd, hemû xwedaniya *(mulkiyeta)* komavayê bûn. Ew erdên ku bexşên komavayê dibûn jî; ew ji bo siberoja komavayê, li ser navê komavayê hatine qeydkirin. Belam di komavaya budîst de aboriya <*ekonomiya*> komunîzmê, demekê dirêj berdewam nekiriye.

Li gorî qeydên <*sanchî*> û <*bharhurtê*> hê di sedsala 2-ê de *(B.Z)* rahîb û rahîbeyan, bi hatiniya xwe li perestişgehê çeper û stûnan didane çêkirin. Ev yek jî, nîşan dide ku ew ji bilî tiştên xwe yên şexsî yên bikaranînê, xwediyê xwedaniyekê şexsî jî bûne.

Li gorî baweriya Buddha: bingeha monarşiyê, di çavkaniyekê pîroz de bû. Kraltî jî, hilbera berfirehbûna xwedaniya taybet bû. Xwedaniya taybet, di navbera mirovan de rê li newekheviyê û dabeşbûnên çînî vedikir. Bi vê encamê re di navbera mirovan de, nerazîbûn û şer dest pêkir; ku di encamê de bi awayekî eşkere yan bi dizî, mirovan destê xwe dirêjî malên hevdu kirin. Lewma jî, ji

nav xwe dadgehekî hilbijartin û e wî jî; hêza gel, ji bo armancên jixwerexwaz civand û bû kral.

Di wê dewra ku Buddha jiyaye de, ciyewazibûna aborî û civakî tûj bû. Buddha, ji bo ku bikaribe wê newekhevitiya civakî ji holê rake; hemû hewl dana xwe, daye keşîşxaneyên komavayan. Belam, e wî çareserkirina vê newekhevitiya civakî, di pîlanên gerdûnî de didît. Bi nêrînên xwe yên dijberê kastparêziyê, çend encaman bi destxist. Lê heta yek ji holê nehatana rakirin, hêza wan ne digihêjte ya din. Lê dîsa jî, komavayên Buddha ji bo wan beşdarên kastên jêr, ji hêla mafên şexsî ve çend mafan dida wan.

Budîzmê, ti caran ferqûmelitiyê nexistiye nav nîjad, welat û mirovan. Lewra, budîzmê bi tundî wekheviya hemû mirovan diparast. Budîzmê, dixwest ku di jiyana civakî de <*jiyaneke bi hevre*> ava bike. Ji ber ku Budîzmê tu ferqûmelitiyê nedixist nav kulturên cihêreng, mîsyonerên budîzmê jî; ti caran zordestiyekî li çanda tu neteweyan nekirine û vê yekê, ne anîne aqilê xwe jî.

**Felsefeya Budîst**

Di çend mijaran de mirov dikare behsa gelek lêzêdekirinên xweser bike, belam, lêzêdekirinên budîzmê yên di warê felsefeyê de bêhempa ne. Encax, mirov nikare bibêje ku vê felsefeyê alikariya felsefeya Marx kiriye, yan gihêjtiye bingeha wê felsefeyê. Gotina vê yekê, çewtiyek e. Encax, mirov dikare bibêje ku xwendekarên felsefeya bûdîzmê, çêtir yan êdî hêsan dikarin ji felsefeya marksîst fêhm bikin. Em dizanin ku felsefeya Hegel, di berfirehbûna felsefeya marksîst de rolekê girîng leyîstiye û marksîzmê jî, li gorî erka xwe, nakokiyên felsefeya Hegelî ji holê rakiribû.

Di felsefeya Hegel de ew rasteqîniya ku serberjêr disekiniya, bi rêbaza pêzewariya *(materyalîzma)* diyalektîk, li ser piyan hate rûniştandin. Hegel, di wê hizrê de bû ku raman yan zêhn, bingehîn e û made jî hilbera wê ye. Heke mirov bi awayekê berfireh budîzmê binirxîne, wê demê mirov nikare bibêje ku budîzm dişibe mengîweriya *(îdealîzma)* Hegel.

Ramana felsefeya xwendegeha <*Yogacharayê*> jî, ne madî û dînamîk e. Ev xwendegeha felsefî jî mîna wek Hegel, hêzr û ramanê rasteqîniya bingehîn dibîne.

Akîdeya bingehîn ya budîzmê, <*her tişt, bi dawî ye*> ye. Ango, dawiya her tiştî heye. Piştra hatiye gotin ku <*yên berdemî (demdemî), bêdawî yan dînamîk in; yên neberdemî (nedemdemî) jî, ne rasteqîn in.*> Bi vî awayî, felsefeya budîst li vê dinyayê hebûna tiştekî bêdawî yan statîk, qebûl nedikir. Ango, li gorî vê felsefeyê her tişt bidawî ye. Înkara Xwedê yan giyanê jî, encama vê hêmanê *(prensîpê)* ye. Felsefeya budîst, pesnê xwe bi nepejirandina giyanê ***<anatmavada>*** dide.

Tarîxa zayîna Buddha, li dema Upanîşadan <metnên pîroz> rast tê. Zanayiyên Upanîşadan, girîngiya herî mezin didane giyanê. *(Giyana şexsî, yan jî giyana cosmîk)* Giyan, ne madî ye, bêdawî û tiştekî naguhor e. Budîzmê, di destpêkê de vê felsefeya bêdawitiyê <*bênatiyê*> hilweşandiye. Li hemberî <*atmavadayên upanîşadan*> *(ku li gorî vê felsefeyê, rih heyîna bêdawî û naguhor e)* lixwekirina navê <*anatmavada*> yê *(ku di vê felsefeyê de jî giyan nayê pejirandin)* ji ber vê sedemê ye. Dînamîzma felsefeya Budîst, ango rewşa herkbûna hemû tiştî, *(flux)* bi temamî nêrînekê cihêreng nîşanî me dide. Yên baweriya xwe bi giyanê tînin, yan bênatîparêz in jî; bêgav mane û baweriya xwe bi guherîna dinyayê anîne. Lê, wê baweriya xwe ya heyînekê bêdawî jî domandine. Ji vê yekê re, ***<Atman>*** yan jî ***<Brahman>*** digotin. Budîstan wiha digotin: <*Dema ku em li gewdeya dareka mûzê mêze bikin, wê em ê bi temamî rastê tebeqeyên li ser hevdu werin. Hilikeke din, tune. Mîna vê yekê, di gerdûnê de tu tişt (Atman yan Brahman) hilikeka bêdawî nahewîne. Lewra, li vê dinyayê regezek (ûnsûrek, nûveyek) bêdawî tune.*>

Çavkaniya valahîparêziyê, ango voidismê *(shunyavada)* jî, ji xwe ev der e. Ji bo şirovekirina têgîhîna dînamîzmê, mînaka ewran yan gura lembê dihat nîşandan. Dinya jî, mîna ewran herdem diguher e. Elmasa herî hişk yan jî hesin, herdem diguher e.

***Ê baş e, wê demê ferq yan manendiya (mînanîtiya) guherîna şeklê pêşîn û dawîn çi ye?*** Bersiva vê pirsê ji bo budîstekê wiha ye: <*Manendiya wan, ya di rêxistîbûna wan de ye.*>
Encam, herdem dişibe sedemê ku çavkaniya çewtiya yekîtiyê *(oneness)* jî ev der e. Gura lembê, herdem diguher e. Encax, ji ber ku ew gura *(alaw)* nû, dişibe ya kevin, em wan heman gur dihesîbînin yan jî, em wê encamê jê derdixin.

**Teoriya Sedemîtiyê**
Piştî bêqeyd û bêmerc, pejirandina dawîndariya hemû dinyaya der û hundir, pêwîstî bi teoriyeka sedemîtiyê derkete holê. Yên atoman û madeyê, mîna tuxleyên naguher dibînin; dikaribûn biparastana ku hatina wan ya cem hevdu, wanekên *(nesneyên)* nû diafirînin. Yekbûn yan jihevçûna wan, dibû tekabûlê derketin û xilasbûna tiştan. Heçî budîzm bû, baweriya xwe wiha bi tuxleyên naguher nedianî. Tu tişt, ne xwediyê hilikeka bêdawî bû. Ango, tişt *(vastu)* na, lê bûyer hebûn. Buddha, ji bo şirovekirina zagona sedemîtiyê termînolojiyekê cihêreng bikaraniye; ku ew jî, <*zayîna pêgirtî - pratitya samutpada*> ye. Dema ku Buddha vê termînolojiyê berfireh dikir, wiha vedigot: <*Dema ew hebû (piştra) ev derkete holê û ji ber ku ew hebû, ev çêbû.*> Bi awayê gotina wî: <*ev tê zayînê.*> *(asmin sati idam bhavati)* Yên diqede *(temam dibe),* dibe sedem, yên piştî sedemê jî encam e. Dema sedem hebû, encam bi temamî tunebû. Dema ku encam derketiye holê, wê demê sedem jî bi temamî winda bûye. Di naveroka sedemê de hilikeka bêdawî ya ku xwe vediguhêzîne encamê, tune.
Di navbera wan de, ji bilî danûsitandineka demhatinî ve; ku yek piştî yekî tê, yan ew ê dî piştî wê ya din tê, tu têkiliya wan tune.

**Kollektîviya Sedeman**
Dema ku meriv, dinyayê di nava herkekê de dibîne û ne weke kombûna tiştan, lê weke kombûna bûyeran bibîne; wê demê têgeha <*zayîna pêgirtî*> *(origination)* bivênevê dertê holê. Tunebûna teoriya zemînekê *(substratum)* bêdawî *(ebedî)*, bivênevê wan nêzîkê

baweriya bûyeran kiriye û bi vê yekê re jî; budîstan wiha bawer kirine, ku dinyaya me ji bûyeran pêkhatiye, ango çêbûye. Nepejirandina wan ramanên kevin, yên derheqê zagona <*sedem–encamê*> bivênevê, rê li zagona <*zayîna pêgirtî*> vekiriye.

Bi gotinekê din: Zayîna pêgirtî, ketiye dewsa teoriya sedem-encama kevin. Felsefeya budîzmê di vê babetê de jî ji wê dilêrîna kevin, ya têgeha <*sedemek, yek yan ji yekê zêde encaman derdixe holê*> hilweşandiye. Li gorî felsefeya budîzmê tu tişt, *(li gorî wan dharma)* ji tiştekê nayê zayînê. Her encam, ne xwediyê sedemek tenê ye, çend sedem bi hevdu re, rê li encaman *(bireseran, nesneyan)* vedikin. Ji vê teoriyê re, ***<kollektîviya sedeman>*** *(hetusamagrivada)* hatiye gotin. Fîlozofê qedirbilind **Dharmakirti** wiha dibêje: <*Tişt; ne tenê ji tiştekê, ji hemû sedemên kollektîv têne zayînê. Dema ku çend sedem têne cem hevdu, encamek dertê holê û kêmasiya sedemekê herî biçûk jî, wê rê li derketina encamê bigre.*>

Li gorî vê felsefeyê; encam, ji sedemê bi temamî cewaz e.

Bi gotinekê din: Derketina holê ya encamê, veguhêrînekê *(guherînekê)* wesfînî ye û ev veguhêrîna wesfînî *(derketina encamekê seranser cihêreng, ya holê)* heke hemû sedemên ku pêdivî bi wan heye û xwedîpîvan in necivin, ew pêk nayê. Ev têgeha sedem–encamê, veguhêrîna wesfînî û wê kollektîviya çendaniyê *(nîcelîteya ku kollektîviya sedema ye)* diguncîne.

## Danasîna Rasteqîniyê

Di bin ronahiya têgîhîna vê dinyayê de ramanwerên budîst, ji nû ve <*yên rasteqîn û yên ne rasteqîn*> nasandine.

Ji bo ramanwerên berê, ev danasîn gelekî hêsan bû: <*Yên bêdawî/ebedî, di hilika xwe de naguhor e (immutable) yan jî; yê naguher (unchangeable) xwediyê encamekê rasteqîn e (noneternal) û dikare biguhere, yan jî; yên ku ji hilika xwe ve diguherin, ew ne rasteqîn in.*>

Belam, di budîzmê de cîh ji rasteqîniyên wiha re tune. E wan, tişteke rasteqîn wiha dane nasandin: <*Yên ku, xwediyê hêza tevgera rasteqîn e.*> *(arthakriyasamartham)* Şêrînahî û nan, tiştên rasteqîn in. Lewra, muktedîrê tevgereka rasteqîn in. Ango, xwediyê hêza

têrkirinê ne, muktedîrê vê yekê ne. Heçku, ew nan û şêrînahiyên di xewnan de, ne rasteqîn in. Lewra, ew ne xwediyê hêza têrkirina zikên me yên birçî ne, ew ne muktedîrê vê yekê ne.
Ji yên xwediyê vê tevgera nesnel ya muktedîr re, ne tenê rasteqîn; herweha rasteqîniya mitleq tê gotin. Li gorî baweriya ramanwerên berê, yên rasteqîn ne xwediyê vê tevgera nesnel ya muktedîr bûn. Lewra yên di hilika xwe de naguher e, ew bêdawî û tekûzbû.
***Ê baş e, delîlên wan tiştên ku li derveyê sehekên me ne, delîlên wan çî ne?*** Rasteqîn, pêwîst e xwe bi ezmûnekî nesnel îspat bike ku tu tişt bi tenê li ser hîmê aqil, rasteqîn nayê dîtin. Di vê babetê de ***Dharmakirti*** wiha dibêje: *<Heke nesne wiha bin, wê carê em kê ne?>* Aqil, ne mitleq e û bi tenê, tevgera nesnel û ezmûn, pîvana rasteqîniyê ne. Ev çekek mezin bû, lê ne hate bikaranîn. Ji bo vê yekê jî, sedemek hebû. Pêşveçûna hemû zanistê li ser hîmê vê yekê bi cîh dibe, ku ev hêmana pejirandina rêzaniya nesneyan e.

**Made û Hiş**
Di felsefeya budîst de, di babeta laş û hiş û made û hiş de, ramanên cuda hene. Di nava budîstan de mengîwerên *(îdealîstên)* kitparêz, *(menist)* dibêjin: *<Bi tenê, hiş rasteqîn e.>* Lewra, rasteqîniya wan *(ango hiş)* dînamîk e.
Yên din, ango dualîst jî; yeko yeko û bi awayekî ji hev cuda, hebûna made û hiş, dipejirînin. *(kaya sthitam manah)* Lê herdu enî jî; heta pîvanekî wê peywendiya ku di navbera hiş û made de heye ku ev yek peywendiyekê beramber e, radixin holê. Ango rajêriya *(bindestiya)* hiş, ya li hemberî madeyê radixin holê. Parastkarên angaşta duyemîn jî, cihêrengbûna hiş û madeyê nepejirandine û gotine ku: *<Dinyaya madeyan, mîna avê û pêlan, dengvedaneka hiş e.>* *(transmutation:parinama)* Ev yek, nêzîkî felsefeya Hegel e.
Heke, di dewsa hevoka *<made, dengvedana hiş e.>* de; hevoka *<hiş, paresana (evrîma) made ye.>* bête bikaranîn; wê mengîweriya budîst, ji wê rewşa xwe ya serberjêr, were rizgarkirin.

Di felsefeya wan de, awayê ramaneka wiha hebû. Dema ku encam li gorî sebebê bi temamî cihêreng be, wê demê ne dijwar e ku mirov bibêje hiş ji madeyê berfireh bûye, belê ev yek pêkan e.

Angaşta pêzewariya *(materyalîzma)* diyalektîk ew e ku hiş, ji madeyê berfireh dibe. Lê ti caran, nabêje hiş made ye. Berawajiya vê yekê, dibêje hiş bi temamî ji madeyê cihêreng e û berfirehbûna wê ya herî bilind e. Di dema Buddha de, hem ramanwerên ku giyanê bêdawî *(ebedî)* didîtin û giyanê ji layê hilikê ve naguher dihesibandin hebûn û hem jî; ramanwerên pêzewar *(materyalîst)* yên ku hebûna giyanê *(rih)* nedipejirandin û ku ji asta pêzewariya mekanîk, xwe rizgar nekiribûn, hebûn.

Buddha û şopgerên wî, çend regezên *<pêzewariya pêşwext>* parastibûn, encax ew ne amade bûn ku ve felsefeyê bi pêzewariyê *(materyalîzmê)* biwesfînin.

Ramanwerên Budîst, hê di destpêkê de ji bo şopandina navînrêyekê biryara xwe dabûn. Di wê derê de jî, xwestibûn ku xwe di navbera ***<teîzm>*** û ***<materyalîzmê>*** de bihêlin.

Heçku di mijara tinebûna bêdawiyê de, e wan navînrêyekê ne pejirandibûn. Ji bo vê yekê tenê ye ku Budîzm, ol tê hesibandin.

Li hember vê radîkalîzma wan, ew baweriya wan ya *<zayîna ji nû ve>* û girêdaniya wan, ya bi nehêniya ***<yogayê>*** mîna olên din e.

Êrîşên bi tundî, yên ku ramana budîst li hember akîdeyên ava pêk dianî, bi vê gotina fîlozofên hîndîstanî yê ***Dharmakirtî***, wiha tê îsbatkirin: *<Pejirandina desthilatdarekî û yekemîn afiraneriya (vedayê), bi riya weftîzên pîroz daxwaza bidestxistina nîrxekî û ji bo bexşandina gunehên kastparêziyê; eza û cefaya ku li laşê xwe dikin, ev in taybetmendiyên bodekiyê.>*

**Rahul Sankrityayan**

**Çavkanî:** Budîzm û Felsefe. Rahul Sankrityayan. Weger: Sibel Ozbudun. Weşanên Veguhêrîna Civakî. 1988 Stenbol. Rp:7-14


**Werger: Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

# Di Felsefeya  Îbnî Rûşd de Bandûra Arîstotales

Îbnî Rûşd (1126-1198) di Serdema Navîn de wekî damezranerê Arîstoparêziyê tê dîtin û li gor bîr û baweriya Rûşd, Arîstoteles tekane fîlozof e. Dîsa li gor baweriya Rûşd, heke mantîqa Arîstoteles tunebûya, wê demê ne zanist û ne jî zanayî pêk nedihatin.

Îbnî Rûşd, berhemên Arîstoteles şirove kiriye û bi awayekî taybet, wan rave kiriye. Mirov dikare bibêje ku rojavayê Arîstoteles bi saya xebatên Îbnî Rûşd naskiriye. Îbnî Rûşd wiha parastiye ku hemû tiştên di ol de ne, mirov dikare wan bi riya aqil îsbat bike.



Li gor ramana Rûşd; made û zeman, bêdestpêk û bêdawî (ezelî û ebedî) ne, ango eternal in. Ango, dibêje ew her hebûn. Dîsa dibêje ku hege livdarî tunebe, zeman jî nikare were fikirîn. Îbnî Rûşd, wisa bawer dike ku rih bêmirin (zindebar) e, lê <rihê mirovî> ezelî ye. Di berhemên xwe de, li ser lihevkirina ol û felsefeyê û li ser hevnegirtîna fîlozofan, rawestiya ye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

# Pêvajoya Peresanê ya Bêdawî

Li gor destnîşankirinên îro ku li gor asta zanistê ya îroyîn û derfetên teknolojîk hatine diyarkirin, di gerdûnê de ji sed mîlyaran zêdetir ezmangirav *(galaksî)* hene. Li ezmangirava kakişînê *(samanyolûyê)* jî, ku rojgera me jî têde ye; dîsa hatiye peyîtandin ku ji sed mîlyaran zêdetir stêrk hene. Di vekolanên çavdêrxaneyan de hatiye dîtin ku li fezayê, pêwrên *(nebûlayên)* nû nû pêk tên, teqîna stêrkan û qulikên reş têne destnîşankirin û di asteka kozmîk de û bi awayekî gîrgîn, peresan tê çavdêrîkirin.

Zanista ezmannasiyê *(astronomiyê)* ku van yekan bi me dide zanîn, wekî mijûlahiyeka mirovî ya herî kevnare; îro jî coşeka bêhemta dide vekolanên zanistî yên hemdem û şaxêka gelekî pêşveçûyî ye. Zanayiyên ku di sedsala dawî de hatine bidestxistin, bûne sedema guherîna ramanên me yên derheqê made, vejen *(enerjî),* pêkhatina dinyayê û afirîşê. Hebûna **<*Gerdûna Kozmîk*>** ji bilî hişkbaweran, ji aliyê hemû kesan ve hatiye pejirandin. Teoriya **Charles Darwîn** ya **<Peresanê>** li Tirkiyeyê jî bûye sebebê minaqeşeyên mezin û li gor zanayiyên hemdem minaqeşekirina vê teoriyê, mecbûriyeteka zanistî ye. Zanayîyên me yên derheqê *<Makrokozmos> (Gerdûna Makro)* û *<Mîkrokozmos> (Gerdûna Mîskoskopîk)* de yên beriya dused salan ku wê demê teoriya Darwîn hatibû pêşkêşkirin, li gor zanayiyên dema me; di asteka cihêreng de bûn.

Bi taybetî jî di derheqê vekolandina fosîlên di kûrahiya bin erdê de, gelekî tengasî *(zehmetî)* dihatin dîtin. Di wextên pêş de jî pêşveçûna di zanistên arkelojî, paleontolojî *(fosîlzanî)* û antropolojiyê û vedîtina *(keşfa)* radyoaktîvîteyê, bi awayekî misoger rê li destnîşankirina temenê fosîlan û nirxandina daneyan, vekiriye. Di roja me de temenê jêmayên fosîl û mayiyên din, bi pirranî bi rêya bikaranîna karbona radyoaktîv yan jî bi potasyûma radyoaktîv tê destnîşankirin. Rojgera me jî, wiha tê fikirîn ku beriya, çar û nîv mîlyar salan çêbûye.

Jêmayên zindiyên pêşîn yên di tebeqeyên herî binî yên erdê de, aîdê kevza *(alg)* behrê ne û temenê wan, nêzîkê sê (3) mîlyar salan

kevin e. Ber bi tebeqeyên jorîn ve, jêmayên din yên ku ji dewra nêzîk in, hatine dîtin.

Mesela temenê jêmayên dînozoran, sed, sed û pêncî salan kevin e. Jêmayên **Homînîdên** ***(mirovokiyên)*** pêşîn jî, encax du mîlyon salan kevin in. Jêmayên **Homo Sapiensê** jî ku weke nîjada mirovên îro tê hesibandin, xwe digihîne pêncî hezar salan beriya roja me.

Di bin ronahiya van zanayiyan de, em nikarin bibêjin ku hemû zindî bi derbekî de û di demekê de çêbûne. Ji xwe ev yek jî, ji aliyê nebawermendên peresanê ve tê vegotin. Belam ev raman, bi rasteqîniyên ku hatine destnîşankirin re dikeve nakokiyê. Heke hemû celeb zindî bi carekî çêbûbûna, wê demê divabû em di hemû tebeqeyên erdê de rastê fosîl û jêmayên hemû celeb zindiyan bihatana. Delîlekî berdewamiya peresanê yeka din jî, di tipê de bikaranîna dermanên antîbîyotîk in.

Weke tê zanîn antîbîyotîk, li hemberê mîkroorganîzmayên ku rê li nexweşiyan vedikin tê bikaranîn. Piştî bikaranîna antîbîyotîkê, heta demekê antîbîyotîk berxwedana laş bilindtir dike. Lê piştî demekê antîbîyotîk bandûr û hêza xwe winda dike û laş, carekê din nexweş dikeve.

Hatiye destnîşankirin ku sedema vê yekê, derketina holê ya celebên nû ye, ku li hember antîbîyotîkan xwediyê hêzeka mezintir ya berxwedanê ne. Ev yek, delîlekî zanistî yê peresanê ê vekirî û eşkere ye û destnîşan dike ku kirûya peresanê, bi awayekî sereqet didome.

Di roja me ya îroyîn de, nexweşiyên wek AIDS û şevba berazan jî, ji van celeb mîkroorganîzmaya ne û hatine peresîn. Hemû vekolanên zanistî ku xwe dispêrin rêbazên hemdem nîşanê me didin ku peresana xwezayê ne tenê li ser rûyê erdê, di asteka kozmîka peresanî de li hemû fezayê heye û bi rêya ketumetbûn û veguhêrîna made û vejenê, pêk tê. Ligel daneyên zanistî hewqasî xurtin jî, hinek naxwazin ku baweriya xwe bi van rastiyan bînin.

Ev yek, encax dikare bibe helwesta mirovên ku rasteqîniyan dilewitînin û ji vê yekê jî, berjewendiyên şexsî bidest dixin.

Wekî hemû cîhanê li welatê me jî, *(li Tirkiyeyê a.g)* jî girseyên gel, bi perwerdehiyeka paşverû û hişkbaweriyan, têne berhêlîkirin. Ji bo rêvebirineka hêsan yên ku dilêrîna ummet û ebdîtiyê xurt dikin, yên ku herdem li dijê zanist û hunerê derdikevin, in. Di van welatan de yên ku li dijê vê zordestiyê jî derdikevin, herdem zanyar û hunermend in.
Di tu dema dîrokê de ne hatiye dîtin ku civakek dev ji zanist û hunerê berdabe û ligel vê yekê bi pêş ketibe. Ne hatiye dîtin ku ew civak ji hêla şaristaniyê ve xwe bilind kiribe. Rêveberiyên ku xwe dispêrin darêzorê û raseriya hêza tunekirinê, tu carê nikarin bibin rêveberiyên mayende û berhemên delîlên şaristaniyê li pişt xwe bihêlin. Berhemên ku niha kitêbxane û muzexaneyan tijî kirine, hemû ji şaristaniyên ku rûmetê nîşanê huner û zanistê dane, mane. Divê tu caran neyê jibîrkirin, ku di civakan de zanist û huner ya serbest hene, yan jî tune nin.

**Prof. Dr. Abidin Kumbasar**

***Çavkaniyên Gotarê***


***1-*** *Darwin, C. Kokê Celeban. Weşanên. 1984.*

***2-*** *Kaufmann, W. J. Peresana Gerdûnê û Çêbûna Stêrkan. Weş. Arkadaş. 1979.*

***3-*** *Silk, J. Kurtedîroka Gerdûnê. Weşnên TUBİTAK sala 1997an.*

***4-*** *Hoagland, M.B., Kokên Jiyanê. Weşanên TUBİTAK. 2003.*

***5-*** *Ditfurth, Hoimar Von. Şeva Bêdeng Ya Dînozoran. Weşanên Alan. 1990*



**Werger: Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

# Di Felsefeya Îmamê Xezalî de Îman û Aqil

Xezalî (1058-1111) berî her tiştî li hemberî helwesta yekkirina aqil û îmanê derketiye û di nav çerçoweya felsefeya îslamê de, di warê epîstemolojiyê (felsefeya zanayiyê) de xebatên xwe pêkaniye. Pirsên (pirsgirêkên) ku wî dixwest çareser bike, pirsên wekî: 'Gelo em dikarin ji zanayiyeka misoger behs bikin?, Zanayiyên ku em bi riya aqil û sehekan têdigihêjine wan, gelo ew zanayiyên misoger in?, Gelo felsefe dikare zanayiyên misoger (tequz) bide me?' ne.



Li gorî bîr û baweriya Xezalî; aqil, di babetên olî de dikeve nakokiyê û sehekên me jî, herdem me dixapînin. Ji ber vê yekê jî, zanayiyên ku xwe dispêrin aqil û sehekan, ne misoger in û divê neyêtin pejirandin. Ya ku esas e, îman e. Xezalî, îman û aqil, ji hevdu cihê kiriye û ya îmanê hilbijartiye û felsefeyê xistiye xizmeta îmanê (olê). Xezalî ji ber ku ferasetê (sezgiyê) weke çavkaniya zanayiyê pejirandiye, wekî nûnerê entuîsyonîzmê yê rojhilatê hatiye qebûlkirin. Li hemberî helwesta fîlozofên ku dixwestin îman û aqil li hev bînin (wan bi hevdu re girê bidin) rabûye û hemû rexneyên xwe di pirtûka xwe ya bi navê 'Hevnegirtina Felsefeyê' (Tehafût el Felasife) de îfade kiriye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

# Teoriya Arîstoteles ya Made û Formê

Di dîroka felsefeyê de teoriya ***<made û formê>*** teoriya Arîstoteles e. Teoriya îdeayan ya Platon wek navenda felsefeya wî dihate dîtin. Wekî vê yekê, teoriya made û formê ya Arîstoteles jî, weke navenda *(xala herî bingehîn)* felsefeya wî tê dîtin. Arîstoteles wiha xwestiye ku sîstemeka mantiqî, zanistî û ku bi temamî xwe dispêre aqil, ava bike. Ji bo vê yekê jî di serdema xwe de hemû zanayiyên ku mirovan wê demê wan bidest xistibûn, top kiriye û xwestiye ku wan rave bike. Arîstoteles beravajiya Platon, giraniyê zêdetir daye cîhana sehekî ya ku em dibînin, dibihisin û dest didinê. Bi vî awayî jî, Arîstoteles xwestiye ku dinyaya me şirove bike. Platon *(Eflatûn)* jî, wek tê zanîn bala xwe zêdetir daye cîhana ne madî *(îdea-ramanî)*. Li gor bîr û baweriya Arîstoteles, îdeayên Platon ji cîhana madî cuda û dûr in û di warê şirovekirina cîhana madî de jî bêhez in û nikarin cîhana madî şirove bikin. Arîstoteles ji ber van sedeman, teoriya Platon rexne kiriye. Li gor baweriya Arîstoteles îdea weke ku Platon dibêje ne li derveyê nesneyan, war û demê ne. Îdea <*hilika*> hemû heyîna ye û di naveroka wan de ye. Ew wanekên *(nesneyên)* ku em wan bi saya sehekên xwe dinasin, xwediyê hilikeka hevpar in *(formek-lewneka wan heye)* û ev xala hevpar, di nav piranîtîya heyînan de, nûnerê yekîtîyê ye. Ango, yekîtiyê temsîl dike. Form, di heman demê de şekil dide madeyê û form ew şekl e ku em wê yeko yeko di heyînan de dibînin.

***Ya ku şekil dide madeyê, ev form e.***

Di vê xalê de tê dîtin ku Arîstoteles ji bo pirsgirêkên yekîtî, pirranî, naguhêrbarî û çêbûnê, rêyeka nû ya çareseriyê tîne. Made, derfetek *(îmkanek)* e, dibetîyek e, ya ku wek hêz e û ya ku wê bigihêje şeklekî ye. Form jî, vê madeyê digihêjîne şeklekî *(şeklekî dide madeyê)* û wiha dike ku ew dibe tiştekî li holê yê bilewn û rasteqîn. Made di destpêkê de ne nesneyeka diyar *(kifşkirî)* e, hê ne bûye <*ew*> an jî <*ev*> nesne. Bi sînor e û hê ne bûye heyîneke misoger.

Mesela perçeyeke ji mermerê, li gor peykereka ku ji mermerê hatibe çêkirin; hê ne hatiye destnîşankirin, hê şekil ne girtiye. Ev bi tenê derfetek e, ku hê ne bûye heyîneke misoger. Dema ku li gor forma xwe, ew mermer wekî peykerekî derkeve holê, wê demê wek heyînek destnîşankirî (kifş), ango wek peykerekî dertê holê. Weke vê yekê, di bingeha hemû heyînan de madeyeka yekemîn *(an jî sereke)* heye û ya ku li gor formên cihêreng şekil digre û dibe heyînên destnîşankirî jî, ev madeya yekemîn e. Bi vê teoriyê re Arîstoteles xwestiye ku guherîn û çêbûna ku di heyînê de pêk tê, ne bi awayekî mekanîk û bi hêzeka ji der; lê ji bandûreka hindurîn û bi awayekî dînamîk *(organîk)* şirove bike. Xwepêkanîna formê ya di madeyê de, tevger *(liv-hereket)* e. Bi vî awayî form, made û tevger, bi hevdu re têne hizirkirin û çêbûna di gerdûnê de, bi vê yekê tê şirovekirin.

***Li gor Arîsto, di çêbûnê de çar (4) sedem xwedî bandûr in:***

**1-** *Sedemê madî*

**2-** *Sedemê formel*

**3-** *Sedemê tevgerîn*

**4-** *Sedemê mebestî*

Heke em mînaka peykerê bidin: Mermer, sedemê madî ye. Şeklê mermerê, sedemê formel e. Peykersazê ku peykerê çêkiriye, sedemê tevgerîn *(çalak)* e. Armanca peykersaz jî, sedemê mebestî ye. Ji bo derketina holê ya peykerê, ev çar sedem peywist in. Ji bo hemû heyînên di gerdûnê de jî, em dikarin vê yekê bibêjin. Arîstoteles gerdûnê, ji hêla made û formê ve wek giştek qedemebûyî dibîne. Heyîna ku dereceyeka jêrîn e, ji bo heyîneka ku li jora wê ye *(raserê wê ye)*, <*made*> ye. Lê ji bona heyîna ku di binê *(jêra)* wê de ye, form e. Mesela keresteyên înşaatê li gor xanîyekî, made ye û xanî, forma wê ye. Lê li gor darê, form e.

Di binê herî kûr ya vê qedemebûnê de, madeya yekemîn ya ku bi temamî bêform e, heye. Di cîhê herî bilind ya vê qedemebûnê de jî, **<*forma zelal*>** heye. **<*Forma zelal*>** ne hewcedarê madeyê ye. Ev bi xwe nalive *(tevnagere),* lê ya ku madeyê dilivîne, ew e. Têgeha forma zelal ya Arîstoteles, dişibe **<*nous*>** yan jî **<*qencê herî gewre*>** ya Platon.

Bi gotineka din forma zelal, ji bilî xwedê ne tu tişt e. Ew bi xwe nalive, lê ji ber ku gerdûn ber bi wî ve diqeside û berîya wî dike; yeko yeko heyîn dertêne holê, guherîn û çêbûn pêk tên. Ango, xweza û gerdûn, ber bi xwedê ve diqesidin û dixwazin ku bigihêjin xwedê. Xwedê, armanca gerdûnê ya ku dixwaze bigihêjê ye.

*Felsefeya Arîstoteles a xwezayê, girêdayê teoriya wî ya made û formê ye.*

Formên ku di xwezayê de hene, çiqasî nêzîkê xwedê bibin, nirx û qedrê wan jî, hewqas bilind dibe û digihêjin rasteqîniya xwe. Hilkişîna fenomenan ya ber bi xwedê *(ber bi jor)* ve, bi du awayan pêk tê. Ji bûyerên serberdayî yên li ser rûyê erdê, ber bi esmanan ve bilindbûneka rêkûpêk heye. Wek vê yekê, dîsa rih jî ji cihveguhastineka mekanîk dest pê dike û heta ku zanayiya aqil bidest dixe, hildikişe. Li gor vê nêrîna Arîstoteles heyînên ku di gerdûnê de hene, li cîhê diyar û li qedemeyan *(pêling-ast)* cîh digrin.

***Li ser rûyê erdê formên herî jêr ax, av, hewa û agir in.***

Ev hêman ber bi navendê ve yan jî wek ku ji navendê dûr dibin, tevdigerin. Ax û av, ber bi navendê ve diqesidin. Agir û hewa jî, ji navendê dûr dibin. Li gor vê nêrînê her hêmanek berbiçûneka xwe ya xweser heye, cîhekî wê ya diyar heye û ber bi wê derê ve diqeside. Di vê xalê de mirov dikare bibêje ku di felsefeya Arîstoteles de ji zêdetirê çendanîtiya wê, çawaniya *(wesf)* wê girîng e. Tiştê ku taybetmendiya heyîneke pêk tîne û heyînê ji heyînên din cihêreng dike jî ev taybetmendiya wê ye ku hilik û forma

heyînê pêk tîne, ye. Arîstoteles têkiliya giyan *(rih)* û madeyê jî, li gor teoriya made û formê dinirxîne. Li gor baweriya fîlozof laş, made û rih jî, form e. Guherînên ku di laş de têne dîtin, ji bo derketina holê ya formê ye. Ji ber vê yekê jî destnîşankarê guherînan yên ku di laş de pêk tên, rih e. Ango, form e.

Dîsa Arîstoteles dibêje ku armanca jiyaneka bi erdem û ehlaqî, jiyaneka bextewar e. Lê ji bo ku mirovek bikaribe jiyanek bextewar bijî, divê ew hilika ku di nava xwe de ye û forma xwe baş pêk bîne. Lê tiştê ku ji bo mirov taybet e û hilika wî ya resen û armanca wî pêk tîne, aqil e. Nexwe, wê demê em dikarin bibêjin bextewarî rewşeka wisa ye ku encax yên ku aqlê xwe bikar tînin û li gor aqilê xwe tevdigerin, e. Di babeta felsefeya wî ya dewlet û civakê de jî, em dikarin bibêjin ku Arîstoteles li gor Platon, jê realîsttir e. Arîstoteles civakeka îdeal pêşnûma nekiriye, lê li ser dewlet û şeklên rêveberî yên ku hene, bi awayekî kûr rawestiya ye û wan rexne kiriye. Li gor nêrîna fîlozof dewleta herî baş, ew dewlet e ku hemwelatiyên xwe ji hêla ehlaqê ve baş û dirist perwerde dike û wan digihîne. Ji bo vê yekê jî divê dewlet karê perwerdehîyê bixe destê xwe û ew bi xwe, vê yekê bi rê ve bibe.

Teoriya Arîstoteles ya zanayiyê jî, dîsa girêdayê teoriya wî ya made û formê ye. Rasteqîniya ku hilik, form û xala hevpar ya wanekan pêk tîne, di heman demê de têgeha wan e. Ev têgeh, têgehek berfireh *(bergehdar)* û tevayî *(giştî)* ye. Ya ku yeko yeko bingeha hemû nesneya ye, ew taybetmendiye ku li cem hemûyan heye, ye. Nesne, yeko yeko ji wê têgeha ***<tevayî>*** têne holê û peyîtandina *(îspatkirina)* vê pêvajoyê jî, karê *(erka)* zanistê ye. Lê armanca sereke divê ne têgihîştina ***<tevayiyê>*** be. <*Tevayî*> ji bo ku yeko yeko zanayiya yên tekane *(yekhejmar)* didine me, ew girîng in. Tê dîtin ku Arîstoteles, li gor Platon; di cîhana sehekan de zêdetir girîngiyê dide nesneyên yeko yeko. Ango, nesneyên tekane. Wekî ku me berê jî gotibû, Arîstoteles di vê xalê de gotiye ku divê zanist derketina nesneyên yeko yeko ya ji tevahiyê, şirove bike û ev yek, divê armanca zanistê be.

Rênîşandarê vê pêkanînê jî, zanista mantiqê ye.

***Li gor fîlozof huner, teqlîd (qopî) e.***

Huner jî li gor bikaranîna tiştên ku teqlîd dikin an jî li gor alavên *(haletên)* ku di dema pêkanîna hunerê de bikar tînin, ji hevdu cihê dibin. Mesela wêje, jiyanê û mirovan teqlîd dike. Ango, bi rêya qopîkirinê ji nû vedijîne. Di dema pêkanîna vê yekê de jî alavên bikaranîna wêjeyê; peyv, aheng û teql *(rîtm)* e. Armanca hunerê, ehlaqî ye. Huner wê bi awayekî, hestên mirovan bilind bike û bi vê yekê jî wê mirovan ji tirs û îhtîrasan *(dildariyan)* rizgar bike. Di dawiyê de jî, wê rih were pakijkirin û zelalkirin.

Filozof bersiva pirsa <*delal çi ye?*> jî daye û wiha gotiye: <*Tiştekê ku em bikaribin jêre bibêjin ew delal e, divê ku ew xwediyê sê taybetmendiyan be: rêkûpêkî, rêje û hevnêrî/sîmetrî.*>

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weş. Soran. 2015**

# Hevpeyvîn bi Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru re

Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru akademîsyenekî kurd e. Di sala 1976an de hatiye dinyayê. Zanîngeha Selçukê, Fakulteya Îlahiyatê xelas kiriye. Teza xwe ya doktorayê di sala 2007an de li Zanîngeha Ankarayê, li Enstituya Zanistên Sosyal, li ser 'Nêrînên Metafizîk ên Yahya İbn 'Adî' daye.

Di sala 2014an de bûye Doçentê Felsefeyê. Li ser Felsefeya Îslamê, Melayê Cizîrî, Di Nav Suryaniyan de Kevneşopiya Felsefeyê û Felsefeya Tesewufê û Îşrakîtiyê xwediyê, xebat û berhemên akademîk e. Niha li Zanîngeha Artukluyê di beşa Felsefeyê de mamostetiyê dike. Em ligel kek mamoste Mehmet Nesim Doru, li ser jiyan, civak, felsefeyê û projeyên wî peyîvin.

**Ali Gurdilî:** Mamoste di destpêka vê hevpeyvînê de, li ser navê xwînerên Kovara Felsefevan ez gelekî spasiya cenabê te dikim, ku te daxwaza me ya vê hevpeyvînê qebûl kir û ev fersend da me. Malî ava.

**Ali Gurdilî:** Di bîr û raya kurdî de, ez dizanim ku cenabê te mirovekî naskirî ye. Ligel vê yekê jî, ez ji cenabê te rica dikim ku tu bi hevokên xwe hinekî xwe bi xwînerên me bidî naskirin. Yanî, tu li kû hatiyî dinyayê, zarokatî û xwendina te li kû berdewam kiriye?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Ez beriya her tiştî ji bo xebatên te yên bê hempa di warê felsefeyê de spasiya cenabê te dikim û serkeftinê ji te û hevalên te re dixwazim. Ez di sala 1976an de li gundê Taqyanê ku giredayî navçeya Silopî ye hatime dinyayê. Piştî dibistana seretayî û ya navîn min li Silopî qedand ji bo lîseya îmam-xetîbê ez derbasî bajarê Batmanê bûm. Piştî du salan ez derbasî bajarê Qeyseriyê bûm û min li wir lîse di sala 1994an de xelas kir. Heman wê salê min fakulteya Îlahiyata zaningeha Uludağê bi dest xist. Ji ber ku malbata min koçî Qonyayê bûn ez jî piştî du salan derbasî zaningeha Selçukê bûm. Di sala 1999an de ez

ji wê zaningehê mezûn bûm û tayina min wekî mamosteyê ‘Çanda Ol û Zanîna Exlaqê’ derket bajarê Amedê. Min li wir neh salan mamostetî kir. Di vê pêvajoyê de min mastera xwe li zanîngeha Selçukê, li ser ‘Teoriya Zanînê di Felsefeya Fexreddînê Razî de’ temamkir û ji bo doktorayê derbasî zanîngeha Enqereyê bûm.
Min li ser mijara ‘Nêrînên Metafizîk ên Yehya Ibn Âdî’ pileya doktorayê di sala 2007an de dest xist. Piştî du salan, di sala 2009an de, ez wekî alîkerê Doçentiyê derbasî zanîngeha Şirnexê bûm.
Piştî du salan ez derbasî zanîngeha Mêrdînê fakulteya Edebiyatê beşa Felsefeyê bûm. Di sala 2014an de ez di beşa felsefeyê de bûm Doçent. Min li derveyî welêt jî hin tecrûbeyên akademîk bi dest xistin. Min 15 mehan di zanîngeha Oxfordê ‘Oriental Institute’ û zanîngeha Londonê di ‘School of Oriental and African Studies’ê de lêkolînên akademîk meşandin. Niha jî ez di zanîngeha Mardîn Artukluyê de lêkolînan derbarê felsefeya Islamê, hizra Suryaniya û felsefeya tesewuf û Îşraqê dikim.

**Ali Gurdilî:** Li ser xêrê be, beriya demekê berhema te ya bi navê ‘Melayê Cizîrî, Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri–Melayê Cizîrî, Ramanên wî yên Felsefî û Tesewufî’ ji aliyê Weşanxaneya Nûbihar’ê ve hate weşandin, ku bi rastî jî pêdiviya me gelekî bi berhemeke wuha giranbiha hebû. Ji kerema xwe re, tu dikarî hinekî naveroka berhema xwe şirove bikî?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Wekî berê jî min got, ez di sala 1990an de ji herêma Botan derketim û nezî bist salî ji derve mam û di sala 2009an de ez derbasî zanîngeha Şirnexê bûm. Piştî ez vegeriyam welêt, bîr û bawerî û nirxên herêma me bala min zêdetir kişandin û min lekolîn li ser çanda herêmî kir. Di vê çarçoveyê da nêzî sê salan min hin çalakiyên wekî sempozyûma Şirnex, Hezex û Cizîrê meşand. Bi sedan akademisyen hatin herêma me û gotarên li ser çand, huner, dîrok, bîr û baweriyên herêma Botan pêşkeş kirin. Min jî di van sempozyûman de hin gotarên li ser bîr û baweriya herêma Botan pêşkeş kirin.

Ji bo beşa felsefeyê û bi teybetî di warê felsefeya Islamê de Melayê Cizîrî zêdetir bala min kişand. Piştî lêkolînên min ên derbarê Melayê Cizîrî, min dît ku Mela ji bo hizra Kurdî xwedî roleke mezin e. Ev rol ji du aliyan ve tê dîtin.

Ya yekem, Mela pêşîkeş û serokê helbest û edebiyata Kurdî, nemaze zaravayê Kurmancî bû. Ji zemanê Mela ve û heya îro jî helbestvanên Kurd di bin bandora Mela de man. Helbestvanên edebiyata klasika Kurdî yên wek Remezan Cizîrî, Feqî û Xanî; helbestvanên serdema modern ên wek Hacî Qadirê Koyî, Cegerxwîn, Hejar û Seyîd Qedrî Haşimî û gelek helbestvanên dî jî bûn şakirdê Melayê Cizîrî. Ya duyem Mela cara yekem felsefeya Tesewufê di forma Kurdî de anîbû ziman û ji bo hizra Kurdî bû minakek bê hempa. Ya rastî berî Mela jî hin feylesofên Kurd ên wekî Hellacê Mensûr, Şehabeddinê Suhrewerdî, Şemseddînê Şehrezorî, 'Eynu'l-Qudat el-Hemedanî, Mele Camî û Baba Tahirê 'Uryan derketibûn, lê bele Mela felsefeya tesewufê cara yekem bi zimanê Kurdî vesaz kir.

Mela di Dîwana xwe de li ser gelek babetên felsefî wek ontolojî, zanîn û evînê sekinî û li ser şopa Muhyîddîn Îbn 'Erebî felsefeya Tesewufê gihand hizra Kurdî. Ji aliyek dî ve Mela li ser felsefeya insên jî gelek bala min kişand. Ji bo Mela, mahiyet û rastiya insên yek e. Însan heyber û bûneverekî îlahî û pîroz e. Ji xwe Mela hebûnê jî wek çemberek bêdawî dinirxîne. Di vê çemberê de hebûna insên di cihekî navendî de ye. Însan, teybetmendî û navên xudayî di xwe de dihewîne û ji bo sîstema îlahî mîsalek şênber e.
Dema dibêje: '***Sultan ji bala hate xwar lahut bi nasute vesar/Peyweste bu nuqta medar dewra 'uruce ger we da',*** mebesta wî pîrozbahiya însên e. Lê însan çiqas pîroz be jî, li hember zatê îlahî mecaz e û çi rasteqîna wî ya otonomîk tune ye.

Mela vê baweriya xwe ya teybet di vê malikê de tîne zimên: ‘***Em têk hewîyat în yeqîn ism în ji mesder muşteq în/ Mewhûm û laşey’ mutleq în ‘eks în di nêv ayîne da’***.
Li gorî Mela însan li hember yekîtî û hebûna teqez tiştekî mewhûm e. Lê di nav sîstema ‘esl û suret, kulî û qismî, yekîtî û piraniyê de di mertebeyeke pîroz û bala de ye.

Melayê Cizîrî ji bo felsefeya Îslamê jî pir girîng e. Di Dîwana xwe de cih dide her sê rêbazên felsefeya Îslamê ku ew rêbaz Meşaîtî, Îşraqîtî û Felsefeya Tesewufê ne. Mela ne feylesofekî Meşaî be jî, di helbesta xwe de zanîn û qîmetê vê felsefeyê û têkiliyek wî ya teybet bi Îbn Sîna re nîşan dide. Hin têgehên wek *burhan, wacib, îmkan* ku di felsefeya Îbn Sîna de pir girîng in, di Diwana Melê de jî cihên xwe digirin.

Mela navê Îbn Sîna du caran hildide û cih dide hin pirtûkên wî yên bi navên *Şîfa, Necat, el-Îşarât we’t-Tenbîhat* û *el-Qanun fit-Tıb*. Felsefeya Işraqê jî, ku damezrînerê wê felsefeyê Şehabeddînê Suhrewerdî bû û pir tesirên felsefeya Zerdeştî û Platonizma nû di wê felsefeyê de hatibû dîtin, di Diwana Melê de cih digiri. Mela her çiqas cih dabû felsefeya Meşşaî û Îşraqî jî her wiha ne Meşşaî û ne Îşraqî bû jî. Mela di ontolojî, felsefeya zanîn û di meyldariyên xwe yên taybet de, bo nimûne şîrovekirina evînê û sembol û têgehên ku bikaraniye, em dikarin eşkere û teqez bêjin ku ew li ser şopa felsefeya tesewufê meşiyabû û bibû ‘Îbn ‘Erebî an jî Mewlanayê Kurdan’.

**Ali Gurdilî:** Bawer dikim ku xebata te ya **‘**Dîwana Seyîd Qedrîyê Cizîrî’ jî li ser xêrê be niha temam dibe ne wisa? Ji kerema xwe re hem derheqê xebatên xwe yên bi kurdî û hem jî derheqê vê xebata xwe de, tu dikarî hinekî me agahdar bikî?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Belê, min edisyon-krîtîka li ser Dîwana Seyîd Qedrî Cizîrî temam kir û ji weşanxaneyê re şand. Di demek nêz de wê bê çapkirin. Ez dixwazim peşiyê behsa Seyîd

Qedrî û Dîwana wî ya bi navê *Diwana Îrfan* bikim. Seyîd Qedrî jî yek ji helbestvanên ekola Melayê Cizîrî bû. Lazim e em ji bîr nekin ku Cizîra Botan di hizra Kurdî de roleke mezin digire. Cizîra Botan li ser bingeha xwe ya zanistî, edebî û Tesewufî navendekî xurt bû û ev hêza wê ya di vî warî de bûye taybetmendiyeke sereke ji bo bajêr.
Di encamê de, em dikarin bêjin ku Cizîr di dîroka Kurdan de wek hiş û qelb e. Zanyarên vî bajarî bi çêkirina kevneşopiya hizra Kurdî û bi nûneriya zimên û edebiyata Kurdî hem ji aliyê hişî û hem jî ji aliyê qelbî û manewî ve bûne rêberên gelê Kurd. Seyîd Qedrî Haşimî jî endamek ji vê kevneşopiyê bû. Berhema wî di vê kevneşopiyê de ku me li jor behskir cihekî girîng digire.

Li gorî lêkolîna me Seyîd Qedrî di helbest û naveroka *Dîwan*a xwe de pir zêde di bin bandora *Dîwan*a Melayê Cizîrî de maye. Ji ber ku, Dîwana Melayê Cizîrî di demeke dirêj de û heta îro jî li medreseyên Kurdan hatiye xwendin, jiberkirin û ji aliyê qesîdebêjan ve bi miqam hatiye şîrovekirin. Seyîd Qedrî di *Dîwan*a xwe de sê helbestên Melayê Cizîrî 'texmîs' û yek helbesta wî 'tesdis' kiriye. Seyîd Qedrî di terz û uslûbê de û heman di naverok û bikaranîna têgehên Tesewufî de jî di bin bandora Melayê Cizîrî de maye. Di *Dîwan*a Melayê Cizîrî de babeta herî sereke bêguman tewhîd û wehdet e. Bi gotineke dî; Mela, peyrewê felsefeya wehdetu'l-wucûd (yekitiya hebûnê) e û Seyîd Qedrî jî vê felsefeya taybet di *Diwan*ê de diparêze.

Seyîd Qedrî, di dîtina xwe ya Tesewufî de meqamê wehdetê wek armanca heyber û jiyanê bi kar aniye. Li gorî wî di rêya peydakirina heqîqetê de lazim e ku sûfîyên di rê de ne, li pey vî meqamî bigerin. Di sîstema *Dîwan*a Seyîd Qedrî de ev meqam ku meqamê tewhîdê ye, bi têgeha 'la la' tê binavkirin. Ev têgeh di *Dîwan*a Melayê Cizîrî de bi 'wehdeta mutleq' an jî 'wehdeta sirf' hatiye binavkirin. Seyîd Qedrî ev têgeh di van malikan de bi vî şiklî aniye ziman: ***'Biçin (la la) û (la la la) biçin tev em biçin bala/Be (hû) yê (hû)yê der bala dilê min tu dilê min'.***

Ji bilî vê berhemê ez hin berhemên dî jî amade dikim. Di zaningeha Mardin Artukluyê di beşa Felsefeyê de rêvebiriya amadekirina 'Ferhenga Felsefeyê bi Kurdî' dimeşînim. Di vê komîsyonê de çend hevalên me yên akademîsyen hene û her yek ji wan çend têgehan ji bo vê ferhengê amade dikin.

**Ali Gurdilî:** Li gor baweriya min, heke em rûbirûkirineke banegehî bikin; wê demê em dikarin bêjin ku felsefeya îslamê jî mîna felsefeya filehî felsefeyeke skolastîk e. Lêbelê, felsefeya îslamê jî, felsefeyeke xweser e. Lê ji ber hinek astengiyan, bi dinyayê re têkiliya xwe birrî ye û ketiye nava ramaneke skolastîk. Mesela dema em li felsefeya rojavayê mêze dikin, em dibînin ku ramana pêşketinê giraniya xwe zêdetir nîşan dide.
Ango hest û ramana çêbûnê, pêşdetir e. Ramana rojavayê, li ser pêşketina dinyayê û li ser şiklê guherînê rawestiyaye. Lewra jî, ramana rojavayê ya bingehîn li ser pirsa zanayiyê ye, lê digere da ku bizanibe ev zanayî ji ku tên û sînorên vê zanayiyê, çi ne? Bêguman di ramana rojavayê de mirov dikare bibêje ku têgeha zanayiyê li pêş e. Baş e, ji bo felsefeya îslamê gelo meriv dikare behsa tiştekê wiha bike?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Mamoste, ev mijareke pir dirêj û hewceyî gengeşeyê ye. Ya rastî, li gorî baweriya min ev qalibên derheqê felsefeya berê de bi piranî di xwe de anakronizmê dihewînin. Bo nimûne, hin kes felsefeya serdema navîn bi sifetê 'tarîtî'yê bi nav dikin. Bi dîtina min di hemî serdeman de tew di felsefeya Yewnanê de jî hin kesan bawerî ji zanayiyê bilindtir dîtine. Ev dîtin dibe ku di serdema navîn de xuyatir û eşkeretir bibe. Feylesofên wek Augustîn, Boethius, Abelardus, Thomas Aquinas di bîr û baweriyên xwe de, li ser vê xetê meşiyane. Lê belê li gorî dîtina min, ev rastî tenê bi serê xwe nabe sedema şûndemayina wê serdemê.
Ji bo vê şûndemayinê, lazime hin sedemên dî yên siyasî, aborî û civakî hebin. Bo nimûne, hemparên wan ên serdema navîn li

rojhilatê ku feylesofên Îslamê bûn, di zanist û teknîkê de pir pêş ve çûbûn. Yek ji wan jî feylesofekî Kurd bi navê Îsmaîl Ebû'l-Izê Cizîrî bû. Li ser robotên otomatik lêkolînê dikir û damezrînerê zanista Sîbernetîkê bû. Yek zanyarê Islamê ku bi navê Ibn Sîna di felsefe û zanista Tibbê de şehîrê wextê xwe bû û bê hempa bû.
Yek ji wan jî Ibn Xeldûn bû û di zanista ilmê civakî de hêjî girîngiya wî berdewam dike. Lê, ev zanistên Islamê jî, wek feylesofên Mesîhiyan îman ji zanayiyê bilindtir didîtin û qe nebe çi nakokî dinavbera îman û zanayiyê de nedidîtin. Lewra bi dîtina min em nikarin bêjin serdema navîn bi temamî û bi hemî heremên xwe serdemek tarî bû û di vê serdemê de ilm û zanist û teknîk paş ve mabû.

Piştî vê derbasokê ez werim ser bersiva pirsa te. Ya rastî, feylesofên Islamê yên klasik ku wek Kindî, Farâbî, Îbn Sîna û Ibn Ruşd di felsefeya xwe de bi piranî felsefeya Aristoteles şopandine. Lê feylesofên Mesihî nemaze yên ku di serdema felsefeya Patrîkan û hinek di serdema Skolastîk de jî bi piranî li ser şopa felsefeya Plato meşiyane. Plato ji bo dînê Mesîhî wek çavkaniyek bijûndar hatibû dîtin. Ji bo baweriya piştî jiyana vê dinyayê, gunehê ewil, îzahkirina teslîsê û hin esasên baweriya ola Mesîhî, îdeayên Plato û fikra tevayî (universal) wek delîlek felsefî hate bikaranîn.

Hetta hebûna Îsa û xudatiya wî û meseleya afirandina gerdûnê ji tunebûnê (ex-nihilo) jî li ser esasên Platonîzmê dihate îzahkirin. Feylesofên Mesîhî, 'Demirgus'a Plato diguhertin û jê afirandinek diderxistin. Ev problemên giran, girêdayî ola Mesîhî bûn. Serdema felsefeya Patrîkan nîqaşên felsefî bi piranî li ser van mijaran derbas bû. Piştî sedsala VIII. felsefeya Îslamê derket û heta sedsala XIII. bi xurtî û geşbûnê dewam kir. Ji bo rojava ev serdem serdemek bê bereket û bê xêr û bêr bû. Em nikarin navê yek feylesofekî ji vê serdemê bînin rojevê. Lê belê di heman serdemê de felsefeya Îslamê serdemek zêrîn derbas kiriye. Piştî sedsala XIII. li rojava hêdî hêdî hevnasîna felsefeya Aristo tê rojevê. Ev jî bi bandora felsefeya Ibn Ruşd û Ibn Sîna çêdibe.

Bi kurtasî, ez dikarim bêjim ku guhertina dinyayê û pêşveçûna şaristaniyê ne giredayî yek sedemê ye. Felsefe jî, zanisteke konjenkturel e. Eger hûn di warê siyasî, leşkeri, aborî û civakî de xurt bin felsefeya we jî wê xurt bibe. Ev mijar di dîrokê de jî bi piranî bi vî şiklî ta îro dewam kiriye.

**Ali Gurdilî:** Mamoste, li Zaningeha Artukluyê li beşa Felsefeyê dersên we yên bi kurdî jî hene, yan temamî bi tirkî ne?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Ya rastî, di beşa me de perwerde sih ji sedî bi zimanê Ingilîzî ye û zimanê sereke Tirkî ye. Lê belê hin dersên me yen bijarte yên wek 'Hizra Kurdî di serdema Îslamiyetê de', 'Metnên felsefeyê bi Kurdî' , 'Di Felsefeyê de termînolojiya Kurdî' jî hene. Xwendekarên ku van dersan hilbijêre dikarin van dersan bixwînin.

**Ali Gurdilî:** Li gor bîr û baweriya cenabê te, gelo meriv bibêje 'felsefeya kurdî' rast e yan jî 'felsefeya kurdan'? Ez dibêm meriv dikare bibêje 'felsefeya ziman', lê meriv nikare bibêje 'felsefeya kurdî', yan 'felsefeya tirkî'? Gelo ez xelet difikirim, yan?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Bi min, di vê mijarê de mebest muhîm e. Eger mebesta me ji 'felsefeya Kurdî' literatura felsefeyê di zimanê Kurdî de an jî felsefeya feylesofên Kurd be, em dikarin vê gotinê bikar bînin. Wê deme, mebesta me ji 'felsefeya Kurdî' ne felsefeya zimanê Kurdî ye. Mebest, felsefeya di zimanê Kurdî de ye. Bo nimûne, yekî Kurd an jî ne Kurd be, fikr û ramanê xwe yên felsefî di zimanê Kurdî de anîbe ziman ew wek felsefeya Kurdî tê nirxandin. Bi dîtina min gotina 'felsefeya Kurdan' ji 'felsefeya Kurdî' noqsantir û neehîltir e. Ji ber ku felsefe xebatek hizrî ye. Netewa hizrê tuneye.

Netew ji bo hizrê wek dever, zeman û hawir faktorek e. Mebest ji felsefeya Kurdî, ne netew û etnîsîte ye. Mebest çand û ziman e. Yekî ne Kurd jî be, dema bi zimanê Kurdî felsefeyê bike, ew dibe

felsefeyek Kurdî. Ev tespit, ji bo hemû felsefeyan eynî ye. Çawa mebesta me ji ‘felsefeya Yewnan’ê ne netewa Yewnanê be, di ‘felsefeya Kurdî’ de jî mebest ne neteweya Kurd e.

**Ali Gurdilî:** Di gotareke xwe de, tu dibêjî ‘heta ku meriv ji felsefeyê fam neke, meriv baş tênagihêje ramanên Mewlana Melayê Cizîrî. Ango, ji bo têgihijtina ramanên Mela, pêdivî bi zanayiyên felsefî heye.’ Ji kerema xwe re, tu dikarî sebebên vê gotina xwe şîrove bikî?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Belê, Mela zanyarekî mutesewif e. Tesewuf, piştî Ibn ‘Erebî dikeve bin bandora felsefeyê, nemaze felsefeya Platonizma nû. Di felsefeya tesewufê de, mijarên ontolojîk, epistemolojîk û ew mijarên dî yên hizrî bi têgehên tesewufî, lê bi şêweyên felsefî tên neqişandin. Ji ber ku Mela jî felsefeya tesewufê şopandiye lazim e em felsefeyê bizanin û welê helbestên wî fêhm bikin.

**Ali Gurdilî:** Li gor bîr û baweriya Melayê Cizîrî, meriv nikare evînê (eşqê) pênase bike. Lê belê kesên ku evîn tecrube kirine, ew dikarin evînê teswîr bikin. Û perdeya sirê ya ku li ber evînê ye, encax bi ilmê marîfetê, ango bi çavê dil dikare were rakirin.
Em dizanin ku gelek feylesofên îslamê jî, yên wekî Îmamê Xezalî, behsa ‘çavê dil’ kirine. Gelo meriv dikare têgeha ‘çavê dil’ wekî ‘ferasetê’ jî bibîne, ku entuitisyonîstê Henrî Bergsonî jî behsa vê yekê kiriye?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Rast e, Mela ji bo çavê qelbî têgehek teybet bi kar aniye. Ew jî ‘eynu’l-îyan’ wate ‘çavê çavan’ e. Di helbesteke xwe de dibeje: **‘Li yetmeinne qelbî ‘eynulyeqîn dibexset/‘Eynul’eyan divêtin kafî nehin dîrayet’**.

Mebesta Melê li vir ev e: ji bo zanîna heqîqetê hizirkirin û dîtin û destxistina tiştekî şênber, ne kafî ye. Ji bo têgihiştina mijarên bilind

çavkaniyek ji aqil û hişê ango ji rasyonalîzm û sensualizmê bilindtir pêwist e ku ew jî merîfet e ango feraset e. Feylesofên mutesewif bi piranî li ser vî esasî ne. Bergson jî li ser vê hizrê meşiyaye.



**Ali Gurdilî:** Li gor bîr û baweriya cenabê te, di felsefeya Melayê Cizîrî de di navbera eşqê û delaliyê *(spehîtî)* de, têkiliyeke çawa heye? Û di vê nêrîna xwe de, gelo Melayê Cizîrî di bin bandora kîjan feylesofan de maye?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Lazim e em bizanin ku Melayê Cizîrî, di felsefeya xwe de di nav çembera felsefeya tesewufê de maye. Di vê çarçoveyê de zêdetir felsefeya Îbn Erebî şopandiye û mijarên wî jî bi piranî li ser wehedul-wucûdê wate yekitiya hebûnê, merîfet û evînê ye. Ji bilî Îbn Erebî bandorên mutesewifên wek Hellacê Mensûr, Mevlana Celaleddin û Camî jî li ser felsefeya Mela xuya dikin.

Li gorî Mela, di navbera evîn û spehîtiyê de pêwendiyek pêwîst heye. Evîn ji xwe re heyberekê dixwaze di heman demê de spehitî jî ji xwe re dildarekî dixwaze. Eger yek ji van kêm be, ne evîn dibe evîn, ne jî spehîtî dibe spehîtî.

Dema ku behsa pewîstiya spehîtiyê li bal evînê ve dike dibêje: '**Husn û cemalê xwest evîn/Vêk ra di yek zati civin',** û dema behsa pewîstiya herduya bi hev re dike dibêje: **'Husn û cemal û 'isqe ye aram di perdê da neye/Mehbûbê lew hetta heye nabit di perde'w xilwe da'.**

**Ali Gurdilî:** Meriv bi çi awayî dikare felsefeya Melayê Cizîrî ya heyînê şirove bike? Em dizanin ku gelek feylesofên îslamê ji nêrînên feylesofên antîk yewnanî ketumet bûne. Bi taybetî jî ji Herakleîtos, Platonîstên nû û ji Plotînos. Gelo meriv dikare bibêje ku felsefeya Melayê Cizîrî ya heyînê jî, berdewam û vebûneke wan felsefeyan e?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Çi belgeyên rastûrast di destê me de nînin ku em bikarin bêjin Mela, felsefeya Yewnanê an jî felsefeya Plotîn (ku yek ji Platonîstên nû bû) yekser bi dest xistiye. Lê belê ji ber ku wî felsefeya Îbn Erebî şopandiye û Îbn Erebî jî bi tesîren Platonîstên nû felsefeya xwe vesaz kiriye, em wê demê dikarin bêjin di felsefeya Mela de tesîrên Platonizma nû tên dîtin. Li gorî Mela, hebûn ji yekîtiyê derketiye piraniyê.

Ev derketin jî bi teceliyan çêbûye. Her heybereke ku em di alema ji der ve temaşe dikin û pê dizanin teceliyek ji zatê mutleq wate hebûna mutleq e. Alema ji der ve, ji bo zatê mutleq wek neynikekê ye. Çawa ku di neynikê de sûretek xuya dike û em nikarin bêjin ev sûret eynî eslê xwe ye û dîsa em nikarin bêjin ku ev sûret dijberî eslê xwe ye. Heman alem jî ji bo zatê mutleq bi vî şiklî ye.
Alem ji zatê mutlek ne cûda ye lê ne zatê mutlek bi xwe ye jî. Ev tiştên ku ji der ve em dibînin çiqas ji bo me bi piranî xuya bikin jî di eslê xwe de xwedî yekîtiyê ye. Lê herkes vê yekîtiyê nikare bibîne. Ji bo dîtina vê yekîtiyê hin teybetmendiyên tesewufî lazim in. Ew jî meqamêm 'fena' û 'beqa'yê ne.
Di meqamê fenayê de sûfî û zatê mutleq dibin yek û sûfî bi çavê zatê mutlek hebûnê dibîne û dema vedigere alema şênber êdî çi

duyîtiyê nabîne. Her tişt jê ra yek xuya dike. Ev jî mertebeya beqayê ye. Ji bo van mertebeyan hin teybetmendiyên hizrî, qelbî û bedenî lazim in ku ew jî di felsefeya tesewufê de tên hînkirin.

**Ali Gurdilî:** Li gor baweriya cenabê te, Melayê Cizîrî herî zêde ji kîja feylesofê îslamê ketumet bûye û çima? Ji kerema xwe re, tu dikarî hinekî şirove bikî?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Weke li jorê hatî gotin, Mela bi piranî di bin bandora Îbn Erebî de maye. Lê belê di hin cihan de bin bandora Îbn Sîna, Îbn Seb'în û Hellacê Mensûr de jî tê dîtin. Lê felsefeya tesewufê ji ber ku rêbazek teybet e û şakirdên vê rêbazê kevneşopiyek cûda ava kirine mela jî lazim e di nav vê kevneşopiyê de bê dîtin û bê nirxandin.

**Ali Gurdilî:** Melayê Cizîrî, gelo çima çêbûn yan jî derketina holê ya heyînan, bi eşqê şirove dike? Di felsefeya wî de, wateya 'eşqê' çi ye gelo? Dema ku dibêje 'Ji bilî av û ax û agir û bayê hêmaneke pêncemîn jî heye ku evîn e û ew bingehê van her çaran e.' gelo mexseda wî çi ye?
Di vê xalê de, gelo meriv dikare Melayê Cizîrî hem wekî feylesofekî îdealîst û hem jî wekî feylesofekî matertyalîst binirxîne? Çimku bi qasî ku ez dizanim, evînê mîna hezeka (hêmaneke) ku serwerê wan çar madeyên dî ye dibîne ne wisa? Yan ez xelet im?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Ekolên hizra Îslamê her yekî ji wan rêbazek cûda ji xwe re ava kirin. Ehlê Kelamê wate teolojiya Îslamê peywendiya nav Xuda û hebûn/mirov de bi mînaka efendî/ezbenî (reb) û köle/benî (ebd) îzah kirin. Feylesofên Meşşaî ev peywend bi peywandiya wacib û mumkinê şîrove kirin. Mutesewifên musulmana ev peywendî dûrî mirov dîtin. Li gorî wan, ev peyvendiyên hene navber û valahiyek mezin têxe navbera Xuda û hebûnê.

Dîsa li gorî wan di van peywendiyan de têgihiştina mirov bi Xuda re ne mumkin e. Ev li gorî wan şaşiyek e. Mutesewifan peywendiyek nû û ji wan peywendiyên dî cûdatir anîn ziman. Li gorî wan, di navbera Xuda û hebûn/mirov de lazim e peywendiya aşiq û meşûq hebe. Wê demê di navbera mirov û Xuda da dûrîtî, netêgihiştin û biyanîtî çênabe. Mela jî di dîwana xwe de ji vê hessasiyetê hereket dike û evînê wek mijarek ontolojik dinirxîne.

Li gorî min em nikarin iddiaya materyalizma Mela bikin. Mela di malika ku te jî anî ziman de dibêje: '**Me cewher 'unsurek xamis numa iro di tali da'.** Şîrovekerên Dîwana Mela dibêjin ev unsura pencemîn evîn e. Ya rastî em jî dikarin welê şîrove bikin. Çi mehsûra wê jî tune. Lê em welê şîrove bikin jî, Mela di vê malikê de îzahkirina kêmasiya her çar unsurên madî dike û dibêje heta unsura menewî wate evîn nebe em nikarin hebûnê îzah bikin.

Ev jî nîşan dide ku çi têkiliya wî bi felsefeya materyalîzmê ve tune ye. Lê belê ez dixwazim bala we bikişînim ser şîroveyek dî. Piştî ku min pirtûka xwe ya li ser Mela weşand, min hin agahiyên dî li ser vê mijarê bi dest xistin. Di felsefeya Îxwanê Sefa de unsura pêncemîn ji bo melekan tê bikaranîn. Ev unsur tebieta wate siruşta asîmanî ye û di mertebeyên hebûnan de ji bo melekan tê gotin. Li gorî vê agahiyê mebesta Mela dîtina melekekê ye û standina agahiyên semavî ye. Lewra em di şîroveya vê malikê de bi lezgînî hereket nekin baş e.

**Ali Gurdilî:** Bi destûra te, dixwazim pirseke jî li ser felsefeya Mensûrê Hellac (Hallac-ı Mansur) bikim. Li gor bîr û baweriya cenabê te, Mensûrê Hellac bandoreke çawa li tevahiya felsefeya îslamê kiriye? Gelo meriv dikare felsefeya Hellac jî, wekî felsefeyeke panteîst bihesibîne?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Hellac di felsefeya Îslamê de damezrînerê du têgeh û fikrên nû û balkêş e. Ew têgeh û fikr 'rasteqina/heqîqeta Muhemmediye' û 'ene'l-Heq' in. Zanyarên

Îslama Ortodoks ev têgeh li dijî Îslamê dîtin û Hellac bi kuştina wî ceza kirin. Li gorî wan, ev fikr nemaze ya dawî wateya wan ittihad û xulûl e wate 'yekbûn'a Xuda û alem e. Lê Mela fikren Hellac ji bo wehdetu'l-wucudê wek manîfestoyekê dibîne. Di Dîwana xwe de du caran erênî behsa Hellac dike.

Di van malikan de dibêje: '**Hostayê 'işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot/ Remza enelheq her digot bawer bikin Mensûr e dil', 'Ji enelheq bi lebên le'li xeberdari buwîn/Bi gulaba serê zulfa xwe te Mensûri kirin'.** Li gorî Mela, fikrên Hellac bi îtihad û xulûlê nayên şîrovekirin. Ji ber ku di îtihad û xulûlê de du zat hene. Lê di fikra wehdetu'l-wucûdê de du zat tunene. Wekî me di serî de jî gotî, li hemberî zatê Xuda çi otonomiyek cûda tuneye. Mela fikren Hellac ji bo wehdet û yekîtiya zatê mutleq bi kar tîne û pesnê Hellac dide. Ya rastî ez jî wek Mela difikirim û di vê meseleyê de Hellac wekî mezlûm û şehîdekê Îslamê dibînim. Lê belê ez dixwazim bala we li ser mijarek dî jî bikişînim.

Di hizra Kurdî de heya tevgera Xalidîtiyê fikr û ramanên Hellac bi erênî hatine nirxandin. Eynu'l-Qudat, Mele Camî û hwd. Xalidîtî wek şaxek ji terîqeta Neqşebendî di nav formên Îslama skolastîk û formên şerîetê xwe vesaz kir û demek kurt de li Kurdistanê û heremên dî belav bû. Damezrînerê vê ekolê Mewlana Xalidê Şehrezorî bû û bi kesayetiya xwe ya şoreşkerî û karîgerî bîr û baweriya Kurdî kir bin tesira xwe.
Piştî Mewlana Xalid rewşenbîr û helbestvanên Kurd ên di medresa û dergahên terîqetê de nekarîn ji çembera vê fikra nû derkevin. Piştî vê guhertinê êdî fikr û ramanên Hellac bi nerêyî hate nirxandin. Yek ji wan helbestvanan jî Seyîd Qedriyê Cizîrî bû. Di helbestekê de dibêje: '**Sirê imkan ji seraperdeyê lahût me didî/Tu li halê şehê Mensûrê Helac pê nekevî'.**

Vegerêm pirsa te ya duyem; bi dîtina min, fikra wehdetu'l-wucud bi panteizmê nayê îzahkirin. Ji ber kû, di panteîzmê de siruşt wek Xuda tê nirxandin. Lê wekî li jor min got, di felsefeya

wehdetu'l-wucûdê de peywendiya Xuda û sirûştê an jî hebûnê wek mînaka neynikê tê nirxandin. Hebûn li hember zatê Xuda, ne aynê wî ye û ne xeyrê wî ye jî. Ev felsefeyek teybet e û bi dîtina min tenê di felsefeya tesewufê de heye û çi beranberiyê vê felsefeyê di wan sîstemên dî de tune ye.

**Ali Gurdilî:** Ji bo xwînerên felsefeyê yên ku bi kurdî dixwînin û ku dixwazin bi kurdî felsefe bikin, gelo pêşniyazên cenabê te çi ne?

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Ez berî her tiştî cesareta wan a xwendina felsefeyê bi Kurdî, pîroz dikim. Karê wan ne hêsan e. Lê belê lazime her kes di warê xwe de fedakariyê bike. Îro pirsgirêka me ya herî mezin kêmasiya têgehên felsefî ye.
Sedemên kêmasiya têgehan di zimanê Kurdî de pir in û em nikarin li vir vê mijarê niqaş bikin. Lê li ber çav e ku Kurdî, zimanekî bêxwedî û bêkes maye û em jî îro vê zehmetiyê dikişinîn. Ji ber ku nifşên piştî me van zehmetiyan nekişînin, lazime em lêkolînên xwe zêdetir bikin. Gelek caran pêdivî bi çêkirina têgehan heye û ji ber vê jî lazim e xwendekarên me di vî warî de şareza bin. Ji ber vê jî lazime pir bixwînin û pir binivîsin. Li gorî pêşiyan em baştir in lê li gorî paşiyan em zeîf û kêmtir in.

**Ali Gurdilî:** Mamoste, li ser navê xwe û li ser navê xwînerên Kovara Felsefevan, ez gelekî spasiya kekê xwe dikim û di kar û barên te de jî serkeftinê dixwazim. Malî ava.

**Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru:** Ez jî ji bo te û xebatkarên kovara we gelek spas dikim. Ev karên ku hûn dikin karekî pîroz e. Ji we re Serkeftinên dilî dixwazim. Mala we jî ava.

**Hevpeyvîn: Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**12.10.2015**

**Jêderên Giştî**

**1-** Di Felsefeya Mewlana Melayê Cizîrî de Evîna Ontolojîk-Molla Ahmed El-Cezerî'nin Felsefesinde Ontolojîk Aşk-Ontological Love on Molla Ahmad Al-Jazari's Philosophy. Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru. Gotar.

**2-** Di bin Ronahiya Meseleyên Felsefeya Tesewufê de Melayê Cizîrî-Melayê Cizîrî in the context of Philosophy of Mysticism. Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru. Gotar.

**3-** 'Di hizra Melayê Cizîrî de rewşa ontolojik û epistemolojik ên Heqîqet û Mecazê.' Doç. Dr. M. Nesim Doru. Gotar.

**4.** Ekolên Felsefeya Îslamê di Dîwana Melayê Cizîrî de. Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru. Gotar.

**5.** Di Hizra Hebunê ya Melayê Cizîrî de Qedrê Ontîk ya Însan.
Doç. Dr. M.Nesim Doru. Gotar.

**Berhemên Doç. Dr. Mehmet Nesim Doru**

**1.** 'Pira ji Rojhilatê ber bi Rojavayê ve: Suryanî. –
Doğudan Batıya Köprü: Süryaniler Ankara, 2007.'

**2.** 'Melayê Cizirî, Ramanên wî yên Felsefî û Tesewufî - Melaye Cizîrî: Felsefi ve Tasavvufî Görüşleri, İstanbul, 2012.'

**3.** 'Li Cem Suryaniyan Felsefe - Süryanilerde Felsefe, Yaba Yay., İstanbul, 2012.'

## Di Serdema Navîn de Rewşa Felsefeyê

Di Serdema Navîn de wateya teqez *(girîng)* ne di gerdûnê de ye, lê di yên ku ew afirandiye de ye û mirov, encax bi îmaneka xurt dikarin xwe bigihînin wê wateyê. Xwedê afiranerê gerdûnê ye, yê ku yekemîn car gerdûnê çêkiriye ew e û di heman demê de, mebesta wê ye. Li gorî termînolojiya ***Arîstoperest,*** Xwedê him sedemê çalak ***(causa efficiens)*** û him jî, sedemê armancê ye. ***(causa finalis)*** Ji ber vî sebebî bi serê xwe tenê, ti qîmeta gerdûnê tune. Qîmeta wê, ji rêza duyem *(talî)* ye. Ew ji hêla gihêjtina armancê ve di nav xwe de, pergaleke hîyerarşîk û bi qedeme, nîşan dide. Ev pergal ji hêmanên binî ve dest pê dike, ji mirovî derbas dibe û heta xwe digihêjîne Xwedê. Mirov li ser rûyê erdê, nûnerê Xwedê ye û rihê mirovî, di rewşa herî dawî de girêdayî Xwedê ye.



Di vê xalê de felsefe weke zanyariyeke di gerdûnê de, li gor zanyariya ku pişta xwe daye îmanê, ji rêza duyem e. Ew encax, li cem îman û teolojiyê; xwediyê erka **<*xulamtiya teolojiyê*>** û **<*derbaseya odeya îmanê*>** ye. Lê di dawiya serdemê de her çûye, felsefe rêya xwe ji teolojiyê cihê kiriye û ketiye rewşeka dijberê teolojiyê. Di dawiya vê pêvajoyê de felsefeyê, berê xwe daye **<*xeta aqil*>** û teolojiyê jî, berê xwe da **<*xeta îmanê*>** ku, di herî dawiyê de jî, dilêrîneka **<*rastiya cotik*>** derketiye holê.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

# Die Protestantische Ethik und der Geist des Kapitalismus

**Serbend 1-** Max Weber, civaknas û ramanwerekî alman e û bi xebatên xwe yên li ser ramana îktîsad, civaknasî û civaknasiya olê, tê naskirin. Max Weber xebata xwe ya **<*Rihê Kapîtalîzmê û Ehlaqa Protestan*>** ku navê wê yê orjînal <*Die Protestantische Ehtik und der Geist des Kapitalizmus*> e, di navbera salên 1904-1905an de nivîsandiye û berhem cara yekemîn di sala 1905an de di kovara **<*Archiv fur Sozialwissenchaft und Sozialpolitik*>** de, weke du beşan hatiye weşandin. Di berhemê de, di pêşveçûna rihê kapîtalîzmê de li bandûra ol tê lêkolîn; gelo ka kapîtalîzm ji olê ketumet bûye yan na? Ger ketumet bûbe ev ketûmetbûneke çawa û bi çî rengî ye û ger bandûrek hebe, em ê kîjan hêla kapîtalîzmê bispêrin vê yekê? tê vekolandin.
Nivîskar wiha bawer dike û diparêze ku di pêşveçûna rihê kapîtalîzmê de bandûreka mezin ya ehlaqa prosteniyê heye.
Di vê wateyê de ne li kapîtalîzmê, li rihê ku kapîtalîzmê pêkaniye, ango li <*rihê kapîtalîzmê*> vekolaye. Li hêla din jî nivîskar wiha dipejirîne ku kapîtalîzm bi tenê li Ewropaya Rojava, bi riya bandûra sîstemên bawerî û nirxên civakê, derketiye holê.
**Serbend 2-** Berhem, bi pêşgotina Weber ya ku ji bo çapa sala 1920an nivîsiye, dest pê dike. Di vê pêşgotinê de Weber behsa rexneyên ku ji aliyê ***Felix Rachfol***, ***Werner Sombart*** û ***Lujo Brentano*** ve li berhemê hatine kirin, dike û van rexneyan dibersivîne. Herweha dîsa di pêşgotina xwe de Weber, behsa nêrîneka dinyayê ya ku Ewropayê weke navend dibîne û bêhampatiya şaristaniya Ewropayê dike û dibêje ku taybetmendiyên ku şaristaniya Ewropayê xwediyê wan in, li tu dereke din peyda nabin. Di beşa yekemîn ya berhemê de bi sernavê **<*Pirsgirêk*>** ê li mezheban, tebekebûna civakî, rihê kapîtalîst û têgeha pişeyê ya ***Luther*** vekolaye. Di vê beşê de Weber bi awayekî taybet, li ser têkiliya cihêrengiya mezheban û rihê

kapîtalîst rawestiya ye, piştra jî dilêrîna jiyanê ya Katolîk û Protestanan, rûbirû kiriye. Di beşa duyemîn de jî li ser têkiliya ehlaqa pîşeyî ya protestaniya asketîk, bingehên olî ya asketîzma dunyevî û dîsa li ser têkiliya asketîzm û rihê kapîtalîst rawestiya ye. Weber bi vê xebata xwe re hemû hêlên ajoya *(guduya)* qezenckirinê ku bi awayekî xwezayî li cem mirovan heye, têkiliyên di navbera ehlaqa prostestaniyê û rihê kapîtalîst de hene û hemû hêlên têkiliyên bazirganî û çandî, raxistiye holê.

**Serbend 3-** Weber, wiha diparêze ku ajoya bidestxistinê, qezenc û hesta karkirinê, bi kapîtalîzmê re ne heman tişt in. Qesta wî ya ji kapîtalîzmê, kapîtalîzma endustriyel ya nûjen e. Li gor baweriya Weber, di pêvajoya dîrokî de gellek civakan; çalakiyên ekonomîk yên ku wesfên kapîtalîst di naveroka xwe de diguncînin pêkanîne.

Bengîniya kar û kezencê jî, di her serdem û civakê de hatiye dîtin.

Belam, taybetmendiya kapîtalîzmê ya veqetîner, rêlibergirtina mengîniya kar û kezencê ya ku bi vegirtin, spekulasyon û bi macerayan pêk hatiye, ye.

Ango rêlibergirtina, van ajoyên derêaqil e. Yê ku kapîtalîzmê derxistiye holê, ne spekulator û ne jî, sermayedar in. Tiştê ku kapîtalîzmê derxistiye holê, mirovên karhez yên rast û dirist yên ku bi karên xwe mijûl in û tu sextekariyan nakin, in. Mirov dikare bibêje ku ev mirov bi temamî bi karên xwe ve mijûl bûne. Ekonomiya kapîtalîst, li ser kezenca ku bi riya pevguheranê pêk tê hatiye damezrandin û tevgereke aştîxwaz e.

Kapîtalîzm bi şeklê ku li rojavayê derketiye holê, wekî dem û dezgeyeke *(îşletmeyeke)* bîrokratîk; bi awayekî aqilane xwerêxistîkirina keda azad e.

Dem û dezgeyeke domdar û aqilane, herdem li pey kezenceka ku xwe nû dike û berhemdariyê ye. Di vê wateyê de meriv dikare ya kapîtalîzmê, bi hebûna dem û dezgeyên ku ji bo bidestxistina kar, disîplîneka aqilane û xwerêxistîkirina hilberandinê binasîne.

Di dem û dezgeyên ku bi awayekî bîrokratîk xwerêxistî kirine de karsaz, bi awayekî profesyonel, xwe dispêrin keda bi meaş.

Bi riya bikaranîna vê kedê, dixwazin ku kar bikin û sermayeyekê bicivînin. Xwestina herî zêde ya karkirinê, ne li gor hêza karkirinê ye û di heman demê de xwesteka daneheveka bêsînor e jî.

**Serbend 4-** Yek temamker û ya din jî bivênevê, du şertên kapîtalîzmê hene. Şerta temamker, hêla madî ya kapîtalîzmê tîne holê. Ev jî; hebûna çîna bûrjûvaziyê, bajarîbûn, berfirehbûna teknolojîk ya endustriyel û hiqûqa rasyonel in. Şertê bivênevê jî, asketîzma *(rihê kapîtalîzmê)* ku berê xwe daye dinyayê ye.

**Serbend 5-** Li gor baweriya Max Weberî, hemû welatên rojavayî yên ku piştî tevgera Reformê bi pêş ve çûne, Protestan in. Herçiqas di destpêkê de kapîtalîzm li welatên Katolîk derketibe holê jî, kapîtalîzma endustrîyel; li welatên Protestan *(Hollanda, İngilîztan, Almanya û Amerîkaya ku ehlaqa pûrîten dipejirîne)* bi pêş ve çûye û berfireh bûye.

**Serbend 6-** Çar rêyên cihêreng yên ravekirina Protestaniyê hene: Kalvenîzm, Pietîzm, Metodîzm û Tevgera Baptîst.

**Serbend 7-** Dilêrîna Max Weber ya ehlaqa Protestan, di esasê xwe de xwe dispêre raveya Kalvenîst, dazanîna teqdîrê ya îlahî û Asketîzma dinyewî. Mirovên Kalvenîst, ji ber dilêrîna xwe ya bextparêz *(qederparêz);* ji şaxên din yên Protestaniyê vediqetin. Asta herî bilind ya çanda kapîtalîst ku baweriyeka derbasdar e, Kalvenîzm e. Hêmana *(prensîpa)* bingehîn ya Kapîtalîzmê, dazanîna *(doqtrîna)* teqdîra îlahî ye.

***Li gor Belavoka Mezin Ya Westminstera 1647an, pejirandinên bingehîn yên vê dazanînê ev in:***

***1-*** *Xwedê, gerdûnê ji navûdengê xwe afirandiye.*

***2-*** *Mirov, nikarin bigihêjine Xwedê.*

***3-*** *Çûna bihûşt yan jî dojehê (cennet û cehnemê), ji berê ve kifş (diyar) e.*

***4-*** *Ji ber ku mirov nikarin bigihêjine Xwedê, ew bi çûna xwe ya bihûşt an jî dojehê jî nizanin.*

***5-*** *Mirov divê li vê dinyayê bişuxulin û xizmeta navûdengê Xwedê bikin.*

***6-*** *Her cure zewqa dinyewî, kêf û şahînî, qedexe ye.*

**Serbend 8-** Mirovekê ku baweriya xwe bi vê yekê bîne, wiha bawer dike ku Xwedê, wê bi nîşandayîna tiştekî vê yekê pê bide

zanîn. Mînak: Wekî ku meriv xwediyê behreyeke *(yetenekeke)* taybet be. Heke mirov ne xwediyê hinek wesfan be; wê demê dê ev ê ji bo ku bikaribe bigihêje rizgariyê, ber bi dewlemendiyê ve biqeside û wê bixwaze, ku bibe dewlemendek. Lewra dewlemendî, yek ji nîşana rizgarbûnê ye û yên dewlemend jî, mirovên hilbijartî ne.

Kalvenîst, li dijê dilêrîna bextparêz dernakevin, beravajiya vê yekê; ew bextparêz in. Di vir de pirsgirêka bingehîn ya şexsan zanîna, yan jî pênezanîna vê zanayiya ku ji berê ve diyar e, ye. Pêdivî pê tune ku meriv wekî ku di dilêrîna Katolîkî de heye; birçî û tazî bijîn. Heke bişuxulin û bi ser bikevin, ev yek nîşan dide ku ew ji wan mirovên ku hatine hilbijartin in. Bi vê yekê jî dê ew bi dewlemendiya xwe, îbadetên xwe bînin cîh. Ango heke tu zengîn bî, ev yek tê wê wateyê ku te îbadeta xwe bi cîh aniye.

**Serbend 9-** Luther, bi raveya teolojîk ya Serdema Navîn ve girêdayî ye. Di dazanîna wî de jiyana olî, xwe dispêre çanda hestan û tu mahneyan, li têgeha pîşeyê *(meslekê)* bar nekiriye.

Li gor baweriya wî, tiştekî ne baş e ku mirov perên xwe li faîzê razîne û dîsa, divê mirov li pey dewlemendiyê nebeze. Ji bo miroveke pêkanîna erka pîşeya xwe, îbadeta herî raser û tevgereka herî baş ya ehlaqî ye. Jiyaneke wek ya keşeyan *(keşîşan)* xweperestî ye û hilbera nehezkirinekê ye ku bi vê yekê, xwe ji hemû wezîfeyên xwe dide paş.

Mijûlahiya pîşeyî, dengvedana hezkirina cîrantiyê ye. Şuxlên mirovan a bi serê xwe, tê wateya şuxla ji bo <*mirovên dinê.*> Di bin kîjan şert û mercan de be bila be, pêkanîna erkên dinyewî; dilê Xwedê xweş dike û ji xwe, ev yek xwestekeka Xwedê ye jî.

Ji ber vê yekê jî, her pîşeya ku mirov bi dilê xwe û bi serbestî hilbijarti be, di qata Xwedê de; xwediyê heman girîngiyê ne.

**Serbend 10-** Lê di Kalvenîzmê de hesta bi serê xwe tenê û rewşa rih, wekî tiştekî xapînokî tê dîtin û di naveroka wateya *(têgeha)* pîşeyê de, pêşnûmayeke olî heye. Ji bo ku mirov bikaribe bigihêje rizgariyê *(xwe ji guhehan biparêze û bibe mirovekê Xwedê jêhezkirî),*

divê mirov di jiyana filehtiyê de çalak be û karên ku navûdengê Xwedê gewre dikin, pêk bîne.
Şexs divê herdem, vê ramana hilbijartin û qewirandinê, li ber çavan bigire û çavdêriya xwe bike. Armanca tekane ya Kalvenîstekê, bilindkirin *(zêdekirina)* çalakiyên civakî û navûdengê Xwedê ye. Ev xusus, mijûlahiya pîşeyî jî diguncîne. Hezkirina ji cîranên xwe, ji bo xizmeta navûdengê Xwedê hatiye vegotin. Nexwe, ne ji bo armanca xizmeta afirandeka ye.
Yên ku hatine hilbijartin, dêrên Xwedê ne û wê wiha jî bimînin.
Di Kalvenîzmê de şexs ji bo bikaribin hebekî be jî, wê bara bextê xwe yê ku diyar e sivik bikin û bibin serdestê wê tirsê û ji xwe ewle bin, divê xwe bidin karên *(pîşeya)* xwe. Encax bi vê yekê şexs dikarin xwe ji wê gumanê dûr bikin û bibin, yek ji wan mirovên ku hatine hilbijartin. Bi vê yekê rewşa xwe, garantî dikin.
**Serbend 11-** Bi aqlê xwe ku bisînor hatiye afirandin, mirov nikarin têbigihêjine aqlê afiraner yê bêsînor û hemû cure ragihandin jî, hatiye qedexekirin. Ji ber vê yekê, sêhr û efsûn, hatiye qedexekirin. Pêvajoya jiholêrakirina sêhr û efsûnê û hemû cure baweriyên batil ku bi cihûtiya kevin dest pê kiribûn, bi Protestaniyê encam daye.
Ramana bi alîkariya dêrê û ayînê gihêjtina rizgariyê, di navbera Protestan û Katolîkan de, ferqeka mezin e. Li cem Katolîkan ayînên dêrê, pîroz in û ev yek, ji bo şexsan di warê kêmasiyên şexsî de weke alaveke parsengkirinê tê dîtin.
Mirov dema ku gunehekê dike, diçe cem rahîb û efûya xwe jê dixwaze. Erkeka bi vî rengî ya rahîban, heye. Belam di Kalvenîzmê de, qedereka naguher ku ji destpêkê ve hatiye kifşkirin, heye.
**Serbend 12-** Xwedayê Kalvenîzmê ji bawermendan ne karekî baş, lê sîstemeka ku xwe gihandiye pîroziya kar *(şixul)* dixwaze. Bi riya vê sîstemê wê tevgera ehlaqî ya mirovan, ji bêrêziktî û serberdayiyê xilas bibe û wê jiyana wan, bi rêbazeka naguhêr ve were girêdan.
**Serbend 13-** Asketîzm, beravajiya raveya Katolîk ya Serdema Navîn; jiyaneka ronak û hişmend, ji xwe re dike armanc. Xîzmeta ji

bo navûdengê Xwedê, ancax bi şixul dikare pêk were. Xerckirina demê ya vala, gunehê herî mezin e.
Xeberdana beradayî, luks û xewa zêde, ji hêla ehlaqî ve tu caran nikare were qebûlkirin. Nexwestina şixul, nîşana kêmasiya pîroziyê ye. Li cem Luther mijûlahiya pîşeyî, qedereke ku divê mirov sitûyê xwe li ber bitewîne û xwe bi pêş bixe, ye. Belam di Kalvenîzmê de, ev yek fermanek *(emirek)* e. Neyarê Asketîzmê yê tekane, sitandina zewqa xwezayî ye.
Protestaniya asketîka dinyewî, li hember wê zewqa ku bi malhebûnê re tê derketiye û serfkariyê, bi taybetî jî serfkariya luks, bi sînor kiriye. Digel vê yekê, dîsa jî kezenca mal ji qedexeyên ehlaqa Katolîk *(kevneşopî)* rizgar kiriye û vê yekê, wekî fermana *(xwesteka)* xwedê dîtiye.
Li hemberê zewqa bedenî û girêdaniya malên dinyayê, kezenceka sûdmend û aqilane, hatiye parastin. Li ber xerckirina beredayî ya ku hatiye kezenckirin, rê hatiye girtin û bi awayekî aqilane, bikaranîna sermayeyê hatiye teşwîqkirin.
Hilberandineka zêdetir, qezenc, berhevdana sermayeyê û xwenûkirina veberhênanê, baş hatiye dîtin û serfkarî, hatiye qedexekirin. Ji hêla ehlaqî ve tiştê ku li dij hatiye derketin; rihetiya serwetê, tiraliya dewlemendiyê û ya herî girîng jî, ji hewldana bidestxistina jiyana **<*pîroz*>** dûrketin e.
Kapîtalîzm heta ku Kalvenîzm dertê holê, di warê xwerêxistîkirina hêza kedê de ne xwediyê helwesteke aqilane ye û bi awayekî kevneşopî tevdigere.
Berhevkirin, şixulîna bêrawest ya bi rêkûpêk û aqilane ya ehlaqa Protestan, rê li pêşveçûna kapîtalîzmê vekiriye. Di vê wateyê de Kalvenîzm ji bo qezenceka mezintir, serbestberdana çalakiya ekonomîk ya taybet, parastiye.
**Serbend 14-** Di pêşveçûna îktîsadî ya USAê de, rola ehlaqa Pûrîten gelekî mezin e. Bi taybetî jî bi xêra cemeetên ku ji aliyê çîna navîn ve hatine rêxistîkirin, ehlaqa Pûrîten belav bûye. Ehlaqa Pûrîtên di derketina holê ya şexsperestiyê de jî, xwediyê roleke girîng e.

Di dilêrîna vê ehlaqê de mirov, ji têkiliyên mirovî û hevaltiyê ne ewle ne û baweriya xwe pê naynin; bi tenê ji Xwedê bawer in û jê ewle ne. Pûrîten, bi tenê bi rewşa xwe ya ruhî û rizgarbûna xwe re eleqeder in. Lewra, dibe ku yên herî nêzîk jî hatibin lahnetkirin.
Xwestina feqîrtiyê, ji xwestina nexweşiye ne cihêreng e û wekî heman tiştî tê dîtin û ev yek ji hêla pîrozbûna kar ve, tê şermezar kirin. Çimku di rewşeka wiha de şexs, zererê didin navûdengê Xwedê. Tiraliya begên feodal û quretiya yên ku piştra dewlemend bûne, bi xezebî têne pêşwazîkirin. Ligel vê yekê ehlaqa bûrjuvaziyê ya ku xwe gihandiye astekî, tê pejirandin.
**Serbend 15-** Mezheba Katolîk, ji bo axretê ji vê dinyayê rûbadanê fêrî bawermendên xwe kiriye. Ango ji bo dinya dinê, divê mirov ji vê dinyayê rû ba bide. Katolîk, baweriya xwe bi kêmkezencê anîne. Faîz, heram e û alîkariya feqîran, xêreka mezin e. Vê rewşê jî, rê li ber kapîtalîzmê girtiye. Tam jî di vê xal *(qonaxê)* de, Protestanî tevlî mijarê bûye û kapîtalîzmê, bi pêş ve biriye.
**Serbend 16-** Weber dilêrîna ***Karl Marks*** ya materyalîzma dîrokî, red dike. Ew, tevgera ekonomîk bi tevger û helwestên olî şirove dike. Di vê wateyê de jî, avahiya jêrîn *(ekonomiyê),* li gor avahiya jorîn *(ol/dîn)* şirove kiriye. Têgeha statûyê li cem têgeha çîn, bi cîh kiriye. Li têgeha Marks ya çîna civakî ku xwe dispêre milkiyeta alavên ekonomîk, hinek îmtîyazên mezhebî û hinekên ku ji zayînê ve tên, zêde kiriye.
**Serbend 17-** Di jiyana kapîtalîst de mirovî, ji bo şuxul *(kar)* heye. Karsazê îdeal ew e ku ji kar nareve û xwe di civakê de nade pêş û qure nake. Weber wiha bawer dike ku serwet ji bilî hesta **<*cîbicîanîna pîşeyê xwe*>** tiştekî din nade mirov.
Pere, deyn û kredî, di sîstema kapîtalîst de têne teşwîqkirin. Sîstem, bi demê re vediguhere kefeseka ji hesinî. Dinya me jî, her diçe bêgav dimîne ku di nav vê kefasa hesinî de kar bike.
**Serbend 18-** Bandûra kapîtalîzmê piştî ku hestên olî têne derbaskirin, dertê holê. Hewldana gihêjtina rizgariyê, bi demê re û bi windabûna kokên olî re, cîhê xwe ji feydeperestiya dinyewî re hiştiye.

Ramana ***<Xwedê ji wî karî (tiştî) hez dike ku bi dijwarî pêk tê,>*** cîhê xwe ji ehlaqeke pîşeyî ya bûrjuva re, dihêle.

**Serbend 19-** Karsazek heta ku di nav sînorên rastiyên lewnî *(formel)* de bimîne, tevgera wî ya ehlaqî bêleke be û serweta xwe baş bikar bîne, bi ramana ku ew *<ebdekî hezkirî ye>* dikare li pey qezenc û berjewendiyên xwe bibeze. Di ser van hemûyan de jî asketîzma olî, karkirên ku baş dixebitin û ev rewşa wan ji aliyê Xwedê ve jî wiha hatiye xwestin, dide bin imrê wan. Herweha ev newekhevîtî, xwestekeka Xwedê ye jî. Çimku bi vê yekê Xwedê, ebdên xwe ezmûn dike. ***Calvîn wiha gotiye:*** *<Gel; ango girseya karkir û zeneetkaran, heta ku feqîr bin dikarin bi Xwedê ve girêdayî bin.>* Ango, ne hatiye xwestin ku girseya gel û karkir, dewlemend bibin. Lê ***hollandiyan*** vê yekê hebekî nerm kirine û gotine ku: *<Mirov, dema ku bêgav dimînin dixebitin.>* Ravekirineka bi vî rengî ya kapîtalîzmê, piştra; saziya hilberandina keda erzan derxistiye holê.

**Serbend 20-** Li gor baweriya Weber, di destpêkê de Ehlaqa Protestaniyê, kapîtalîzmê destnîşan kiriye. Lê piştî ku kapîtalîzm bi pêş ketiye, bûye destnîşankarê Protestaniyê. Li gor baweriya wî, ol ji rewşa destnîşankar derketiye û hatiye destnîşankirin ku ew yek jî, rewşeke dramatîk e.

**Gamze Arslan**

Lêkolîna pirtûka Max Weber ya bi navê *<Rihê Kapîtalîzmê û Ehlaqa Protestan>* Gamze Arslan, li Zaningeha Silêman Demirel xwendekara doktorayê ye.

**Çavkanî: E- Akademî**

**Werger: Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com



# Xweza di Felsefeya Arîstotales de

Di felsefeya Arîstotales (B.Z.384-322) de xweza, hêmaneke tevgerînê ye, her dem diguhere û xwediyê bandêrekê (sîstemekî) ye. Di xwezayê de tu guherînên bêrêzik (serberdayî) tune nin û hemû guherîn bi rêz, bêrawest û xwedîarmanc in. Lewra, ev guherîn <teleolojîk> in. Ango di pêşiyê de ew encamê tiştekê ne, ku ew jî di xwezayê de ji xwe hene. Lewra, xweza dewr û dewranên din, ji nav xwe derdixe (diafirîne).

**Li gor felsefeya Arîstotalesî, xweza...**

**1-** Guherînên ku di xwezayê de çêdibin bi rêz, bêrawest û xwedîarmanc in. Lewra, ev guherîn bi awayekî 'teleolojîk' çêdibin. Bi gotineke din: Ev guherîn ji tiştekê xwezayî çêdibin û piştra, xweza domeneke (heyameke) din ji nav xwe derdixe holê û ev guherîn jî, guherînên hûndirîn in.

**2-** Guherînên xwezayî, bi hêlaka qenc ve ne. Lewra, xweza bi awayekî bêrawest xwe dikemilîne. Ev nêrînên Arîstotales, ramana rojavaya Ewropayê xistiyê bin bandûra xwe û ramana Ewropayê, jê gelekî ketumet bûye. Xwiyaye ku Arîstotalesî xwezayê, mîna tişteke zindî ditiye û wisa jî şirove kiriye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
18.09.2015

# Taybetmendiyên Felsefeya Sokrates

Sokratesê ku navê wî ketiye gelek efsaneyan û wekî fîlozofê herî navdar yê dîroka felsefeyê tê hesibandin, yek levzek *(hevokek)* jî nenivîsandiye. Em ramanên wî ji nivîsarên şagirdên wî ***Platon*** *(Eflatûn)* û ***Ksenophon***, fêr dibin. Sokrates *B.Z.* di navbera salên *469-399* an de jiyaye û ne li ser rasteqîniya der û xwezayê, lê bi taybetî li ser pirsgirêkên ehlaq û mirovî rawestiya ye.

Lêkolînên ehlaqî yên Sokrates, li ser jiyana ehlaqî û erdemdariyê *(dilpakîtiyê)* bûn û bi vê yekê re jî aqilê mirov cara yekemîn û bi awayekî misoger, li xwe mêze dikir û li xwe vedikoliya. Ji bo fîlozof zanayiya herî nirxdar, zanayiya derheqê mirov de bû. Wateya gotina Sokrates ya ku gotiye: <*Bi xwe bizanibe!*> ev e.

Sokrates dema ku wateya mirov û jiyana ehlaqî (erdeman) şirove dikir, digot ez bi tiştekî nizanim û wiha dest bi karê xwe dikir. Ji her tiştî gumanê (şik) dikir, li her tiştî vedikoliya û her tiştî rexne dikir. Em ji van şiroveyan wiha derdixin ku di vê xalê de Sokrates dişibe sofîstan. Bi rastî jî helwesta Sokrates ya ku ji hemû tiştî gumanê dikir û ne li ser xwezayê, lê li ser mirov radiwestiya, wî zêdetir nêzîkê sofîstan dike. Ligel vê yekê ji bo ku Sokrates wiha bawer dikir ku ramana mirov, dikare xwe bi bigihîne rastiyên derbasdar, ji sofîstan bi awayekî misoger vediqetiya.

Li gor bîr û bawerîya fîlozof rasteqîniyên ehlaqî yên weke başî, xirabî û dilpakî *(erdem),* li gor mirov û civakan nayêtin guherîn. Ew rasteqiniyên gerdûnî bûn û ku bi awayekî rêbazî, birêvebirina ramanê re mirovan dikiribûn zanayiyên wan bidest bixin. Erka fîlozof ew bû ku bi rêya guman, înkar, rexne û vekolanê, gihêjtina zanayiya têgehên weke , ***<başî>, <xirabî>*** û ***<edaletê>*** û nasandina wan bû. Belam ev zanayî, di rihê mirov de ji xwe hebûn. Ya girîng ew bû ku mirov ji bo ku ew bikaribin derkevin holê, alîkariya wan bike. Ji bo vê yekê Sokrates navê rêbaza xwe danîbû <*hunera danwelidandinê*>. Ji bo pêkhatina vê yekê jî, bi mirovekê li hember xwe re dikete xebardanê. Dema ku vê diyalogê dest pê dikir, Sokrates digot ez di derheqê babetê de bi tu tiştî nizanim û wiha dikete guftegoyan û wiha jî pirsan dikir. Dema ku mirovê li

hember wî bersiva pirsa wî dida, bi awayekî Sokrates nîşanî wî dida ku di vê babetê de zanayiyên wî kêm in û têrê nakin. Li ser babeta ehlaqê fîlozof dibêje, derheqê ehlaqê de divê zanayiyên me yên misoger û derbasdar hebin. Lewra li gor baweriya Sokrates ehlaqdarî ango erdemdarî, di heman demê de zanyarî ye. Herweha, mirovê zanyar ew mirov e ku jiyaneka bextewar dijî.
Di destpêkê de ev nêrîn dikare ji me re weke nêrîneka ecêb were. Lê Sokrates vê nêrînê diparêze û li gor vê nêrînê, mirovê ku bextewar dijî û xwediyê jiyanek bextewar e, ew di heman demê de mirovek dilpak *(xwedîerdem-ehlaqdar)* e jî. Navê vê nêrîna ehlaqî ***<Bextewarîperest- Eudaimonist>*** e.
Ev nêrîna ehlaqî di ramana serdema pêşîn de hatiye pejirandin. Sokrates bi vê rêbaza xwe re di felsefeya ehlaqê de rêya vekolanên zanistî vekiriye. Lê dîsa jî dijwar e ku mirov bikaribe bibêje Sokrates felsefeyeka berfireh û bi kitekit ya ehlaqê afirandiye. Ligel vê yekê helwesta wî ya aqilane *(rasyonalîst)* di dîroka felsefeyê de jêre cîhekî girîng peyda kiriye.
Sokrates li ser hemçaxên xwe û nemaze li ser ramanên ciwanan bandoreka mezin hiştiye. Sedemê vê yekê jî jiyana wî sade û fîlozofî bû ku tu carî li pey îhtîrasên xwe nebeziya ye û her dem di nav lêgerîna heqîqetê de bûye. Di nav raman û tevgerên wî de lihevhatinek hebû û raman û tevgerên wî lihev dihatin. Ji ber ku baweriya xwe bi zanayiyên vala û beradayî neanîbû û bawerî, irf û adetên civakê û pêşdaraziyan rexne kiribû, bi mirinê hatibû mehkûmkirin. Sokrates ji girtîgehê nereviyabû, vê yekê li xwe dananîbû û di dawiyê de hatibû kuştin. Bi jiyan û ehlaqê xwe re û bi awayê xwe yê lêgerîna rastiyê, Sokrates di nav fîlozofan de bûye mînakekî gelek baş.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weş. Soran. 2015**

# Guhdariya Teqez û ya Rêjeyî

## (Absolute and relative pitch)

Guhdariya teqez tê wateya wê yekê, ton dê lêkeve û ê guhdêr *(guhdarê teqez)* bikarîbe nas bike bê kîjan e.

**Du rengên vê guhdariyê hene, passîv û aktîv.**

**1-** Ya passiv: Wê ton lêkeve û ê guhdêr bibêje bê kîjan e.

**2-** Ya aktîv: Ji ê guhdêr wê bê xwestin ku tonekê bide ango bistirê *(bo mînak tona Do)* û bê peydabûn an jî liberdesthebûna amûrê. Guhdariya rêjeyî tê wateya xwediyê wê, wê bikarîbe tonan ji hevdû derxîne. Guhdariya rêjeyî wesan e, gava ku tonên *(bo mînak)* Do, Fa, La lêkevin, tê navê yekê ji wan bidî, wek em bibêjin Fa, radibe ê guhdêr bi riya vê tonê ê din jî nas dike. Lêkolîn dibêjin ku guhdariya rêjeyî dibe ku zikmakî be, û helbet bi lêmuqatebûn û hînkirinê baştir dibe. Heya niha baş nehatiye naskirin bê bêyî Guhdariya Rêjeyî ya Teqez bi kêr re tê. **Otto Abraham** jibo vê yekê wilo pêşniyar dike: Divabe gava yek tonekê bide û ji ê guhdêr *(teqez)* bixwaze bibêje bê ka kîjan e, û ê guhdêr naskir û got, rabe yek di pey re yekser biaxive heyanî ew ton ji bîra wî here, û hazir bibe ji naskirin û gotina tona bêy re. Helbet divê yek ji bîr neke ku temen jî rola xwe dileyize û pê re lûlpêç *(lat. Cochlea)* tê guhertin; qeweta xwe distîne yan jî winda dike. Û ku peyava naskirina tonan cem guhdarê teqez di çarçoveya tonên heyanî 4168 Hz *(Do ″″′ an ku Do-oktava 8an)* ne, ye, zêdeyî wilo jê re zehmet tê.

**Xurtbûn û zîzbûna guhdariya teqez di ku de ye**

Guhdarê teqez dikare tonan nas bike lê wê pir zehmet be jê re nas bike ka a kîjan oktavî ye ango girêdayî kîjan oktavî ye. Yanî wê Do nas bike, lê wê nizanîbe ne Do′ e ne jî Do″ td. Sedem helbet ne tenê tonên partiyal *(akustîk)* in. **Manfred Spitzer** dibêje ku di têstekê de gava tonên sade hatin bikaranîn *(Sinus),* şaşîtiya naskirina bê kîjan oktav e bi kesên ku ev têst bi wan hat kirin ne kêmî wê bû a ku bi tonên partiyal. Sedemek dikare bête gotin ew jî ev e, amûr.

Yanî, naskirina oktavê li ser kemanê ji xwediyê guhdarê teqez re *(ku li kemanê dixe),* wê ne wek wê be gava ku li ser piyano be. . . û yê basîst jî wê bi tonên qerar *(bass)* re piştrasttir be ji yên cewab (diskant). 100 % – dana tonî li cem guhdarê teqez kêm û zêde dibe û di navbera Cent heyanî nîvrade dire û tê. Yanî gava tu jê bixwazî tona La 440 Hz bide, dibe ku 100 Cent kêm, 100 Cent zêde bide. Helbet ev jî bi riya lêmuqatebûnê pak, lê guhlênekirinê kirêt dibe.

**Pirs: Guhdariya teqez zikmakî ye an xwefêrkirin e? Her kes dikare bibe guhdarê teqez?**


Ji serê her 5000 kesan yek derdikeve guhdarê teqez. Xurtkirina guhdariya teqez wê baştir be berî qedandina temenê 6 salî 'yana wê dûv re kêmasî hebin anku wek netemambûyî lê were nerîn' **(M. Spitzer 2013, rpl. 240, Musik im Kopf).**

Derbarê bê ku zikmakî ye dîtinek din heye, ew jî kultûr e. Bo mînak miletê Çînê, him ji ber perwerdê him jî ji ber ku girêdayî mêlodiya ku di axaftina wan de ye, ji wan re asan dibe bibine guhdarên teqez. Dibêjine ku guhdariya teqez li cem hin sinfên heywanan jî hatiye dîtin, mînak: Çûk, Hût, Gur, Kûçik, Mişk.

**Cihê guhdariya teqez di mêjî de**

Bûye karê gelek zanyaran binasin bê ka cihê Guhdariya teqez di mêjî de li ku dikeve. **Schlaug** di 1995an de dibêje: 'Gava yek li mêjiyê mirovî binere û bala xwe li Planum Temporale bide, wê bibîne ku ev der li cem kesên xwediyê guhdariya teqez, cuda ye ji ên normal. **Klein** *(1982)* dibêje ku 'perçê Temporale li cem muzîkvanan, ew perçê ku li aliyê çepê dikeve, baş dixuye ku têkilya wê bi guhdariya teqez re heye.'

**(M. Spitzer 2013, rpl. 243, Musik im Kopf).**



Wêne: Navenda Zanyariyên noyrolocîk

Mirovên xwedî guhdariya teqez mêjiyê aliyê çepê, mêjiyê aliyê rastê yê mirovên normal in, e. Planum temporale beşek ji cihê axavtinê ye, dixuye ku mezin e *(li cem guhdarên teqez).*

**Nenaskirina ton û guhdariya rêjeyî**

Li kêleka guhdariya teqez û ya rêjeyî nenaskirina tonê jî heye. Kesên tonnenas ew in, ji wan re gava stranek lêkeve, wê nikarîbin pê re li ser hemen tonî bistirên. Ne tenê wilo, lê belê gava ku mêlodî çewt jî lêkeve, wê pê dernexin.

**Gotina dawî**

Ne diyariyek e yek xwe pê payebilind bike gava ku yek xwediyê gudariya teqez be. Guhdariya teqez gelek caran pirsgirêkan ji xwediyê xwe re çêdike gava, bo mînak, bixwaze mêlodiyekê ji tonekê biguhêre yeka din *(Transposition).* Gelek caran guhdarên teqez nikarin bi koroyê re bistirên, nemaze gava ew koro bêyî pêrelêxistina amûrekê *[berî her tiştî piyano, organon, orkêstra td]* stranên xwe bêje. Gelek kes hene, perwerda muzîkê nestandine, tevî wilo dikarin tonê xweşik bidin, bêy ku guhdarên teqez bin. Û divabe ji bîr nebe ku guhdariya teqez xwefêrkirin e, ne ku tenê zikmakî ye.

**Brahîm Şêxo**

broderya@gmail.com

**04.05.2014**

***Jêder:***

*Spitzer, Manfred (2013) Musik im Kopf. Stuttgart*

*http://www.uzh.ch/news/articles/2003/0788.html*

**Brahîm Şêxo (Brahim Shexo)**

Muzîk, beşê afirandin ango lêkanîn *(classical composition)* û pêdagogiya piyanoyê li instîtûya muzîkê-zankoya Osnabrück-Almaniya, xwendiye.

2014 albûma wî ya bi navê Dilopên Sîyekê *[Drops of a Shadow]* ji hêla indiewerk-JPC derket. Wekî din carcaran gotaran derbarê 'Muzîk û Sîkolociyê' dinivîse.

## Lêgerîna Arkheyê di Çanda Antîk Yewnanî de

Çanda Antîk Yewnanî û şaristaniya wê, xwediyê qerektereke dualî bû. Ji aliyekî ve di warê kulturê de gihabû asteka gelekî baş, lê li hêla din jî di hinek babetan de xwediyê hinek adetên xirab bû. Mesela, li aliyekî baweriya xwe bi ***Xwedayên Olîmposê*** dianin û li aliyê din jî, zarok û jin di civakê de kole bûn. Cîbicîkirinên bi vî rengî, piştî demekê wiha kir ku di civakê de bêhevîyêke dest pê kir û hinek bûyerên ku civakê bêhêvî dikirin, derketin holê.

Li hemberî vê çanda dualî ya ku civakê bêhêvî dikir, fîlozofan dîsa jî têgihiştine ku di gerdûnê de guherînek bêrawest heye û gerdûn, her dem di guherîneke wiha de ye. Ji jiyanê ber bi mirinê, ji zarokatiyê ber bi pîrbûnê, ji biharê ber bi zivistanê ve, her dem guherîn û veguhêrîneke bêrawest heye.

Divabû li pişt vê guherîna bêrawest, heyîneke ku her dem hebûna xwe didomîne jî hebûya. Destpêka felsefeyê û xwesteka şirovekirina ***<Îyonyayê>***, bi lêgerîn û pirskirina vê heyîna mayende ***(arkhe)***, dest pê kiriye û îyanyayiyan, xwestine ku bi vê yekê bizanibin. Fîlozofên Îyonyayê, navê vê heyînê danîne '***arche.***' ***Arkhe***, ew element bû ku ligel hemû guherînan, nedihat guherîn û her dem weke xwe dima.

Piştî hinek rûdanên ramanî, ***Thales*** wekî fîlozofekî dertê qada civakî û ku ***B.Z. (Beriya Zayînê- Beriya Zayîna Îsa Nebî)*** di sedsala 6 an de jiya ye, gotiye ku arkhe av e. Hinek fîlozofên din jî ku xwediyê ramanên cihêreng bûn, wan jî arkheyê, bi madeyên *(elementên)* cihêreng şirove kirine. Mesela ***Anaksîmenes (Anaximenes)*** hewayê û ***Herakleîtos*** jî, agir weke elementa bingeh dîtiye û bi vî rengî, arkhe hatiye şirovekirin.

Fîlozofên îyonyayî, dema ku li madeya bingehîn ya gerdûnê vekolane, tu rêbaz yan jî ezmûnên *(deneyên)* zanistî bikar neanîne û bi riya ******spekulasyonê*, xwestine ku xwe bigihînin encamê. Herçuqas

li ser hinek babetên razber *(soyut, nedîtbar)* yên weke guherîn û yekîtiyê rawestiyabin jî, vê yekê bi bingeheke madî pêk anîne. Elementên ku ji bo şirovekirina çêbûna gerdûnê hatine bikaranîn; yen weke agir, av, hewa, ax û hwd. hemû jî, madeyên madî û girgîn *(somut, berbiçav)* in. Dema vê yekê pêk anîne jî, mirov dikare bibêje ku xwe ji bandûra sehekan rizger kirine û bi awayê razberkirinê *(soyutlamayê)* vê yekê pêk anîne.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

Dewletên ku Kurdistanê wekî mêtingehek hevpar bikaranîne, bi rêya dirûşmeya 'Biratiya Olî' xwestine ku rê li ber berfirehbûna hest û tevgerên kurdan yên neteweyî bigrin.

**Civaknas Dr. Ismaîl Beşikçî**

# Pênase û Wateya Şuûrê Li Cem Descartes

Naverokine kevnare yên gellek têgehan, xasme yên têgehên bi konsepta zêhnî re peywendîgir in; îroj li ber ronahiya zanista nûjen, guherînên gewre dijîn ji hêla pênase û wateyan ve. Hewl û xebatên ku tenê xwe li ser têgihîştina zanayiyên aktuel, dem-deverî ava kiribin, dê ne têrê bikin ji bo venasîna bingeha zanista îroyîn bêyî fehmkirina pişt-plana wê ya entellektuel. Lewma divê heta derfet hebe, bi şîrove û hizirînên li ser, bi werger û vekolînan ve ev paşxaneya entellektuel were naskirin daku nasyariyek gihîştî û tekûz bibe palpişteke qehîm ji bo pêşveçûnên ramyarî.

Ev gotara kurt ji ber vê mebestê hatiye nivîsandin.

Descartes xwastiye *(hîmê)* venasîn-zanayiyê bi hawakî qutîbir binase û li ser binateyek tekûz ji nû ve ava bike. Piştî xebatên dûr û dirêj, derbarê têgihîştina 'rastî'yê de ramana xwe waha dihîne zimên: «'kirdeyê ku difikire' wek 'xwerû ponij' dikare bibe cihê jêrabûnê ji bo hewla têgihîştina hebûnê».

Vê jî weha formule dike: Cogito, ergo sum *(je pense, donc je suis/ez dihizirim, vêga ez he me)*

Dibêje: Heke ez şopa hemû tiştên cîsmî ji zêhna xwe bibim û sehekên xwe bi tevayî dadim, disa jî dikarim cîhana xwe ya hindurîn vebikolim, lewra gava ez şik, bedena min jî têde, bi hebûna objeyên ayidê cîhana derve dibim jî dizanim ku ez di vê pêvajoya şikpêbirinê de jî difikirim. Lêbelê, nedizanim kîjan xapînekek pir hêzdar û xasûk a dike ku bi hemû hêz û pîşesaziya xwe ve min bixapîne *(biçewitîne),* heye. Ti guman têde niye ez he me. Heta dixwaze bila min bixapîne, lê ti carê nikare bike, ku ez tine bibim, hingê ku ez bifikirim bibim tiştek: qet nebe weke xwerû ponijek. Çi dibe bila bibe gava 'ez dihizirim' ez bi taybetmendiya ramanê ve dibim ewê/ewa he ye; çimku ez dikarim vê hebûnê

bifikirim û bi hizra hizirîna vê hebûnê ve bibim ya/yê heyî. Ev cogito *(kojîto)* ye wek yekemîn misogeriya berxwedêr li pêşberî şika metodîk. Descartes mirovî di nav dualîti *(dualîzmekî)* de dinirxîne: dîmena zêhnî û dîmena bedenî. Li gor wî, mirov ji du gewheran *(substansan)* pêk hatiye. Û dide pey venasîna xwezaya van herdu gewheran. Beden an jî dîmena daringîî hey dikare bi şûnek, bi lewn, bi teşe û bi tiştên girgîn ve were holê. Tişta cîsmî-bereweşîn dikare bihêt kerrî û parvekirin.

Lê zêhn, ji ber ku ji kalîte û ji taybetmendîyên cîsmî tu parekê hilnedaye, ew heyîn e dikare bê term, war û cîsm hebe; û erka xwe bi hawakî ku ji dîmenên madî azad e, pêk dihîne. Saziya hebûnek xweser e zêhn û ji aliyê xwezaya xwe ve nahêt kerrî-parvekirin. Di hemû pêvajoya şikkirinê de em pê dihesin 'ez'ek ku difikire, he ye.

Descartes dibêje : gava 'ez' li ser 'çibûn'a xwe diponijim, dikarim têbigihîjim ku ji bo ‘heyîbûn’ê ne hewciyê ti tiştek madî me. Gewhera ku meyan ***(hilik)*** û xwezaya wê hizirîn e û ji bo heyîbûnê hewceyê ti darinde û formek madî niye, ew, ev ‘ez’ e.

Descartes, behreya zanayiyê ya ku bi sêwirandinek zêhnî ve li xwe vedigere û yek ji îdeyên li cem xwe vediguherîne objeyekê; wek têgihan *(entelekt)* pênase dike. Li vir divê bihêt dîyarkirin ku Descartes hevwateyiyek gelemper daye têgehên wek: têgihîştin, zanayî, têgihan *(mudrîke),* ponij û şuûr *(têgijê).* Descartes hewl daye ku bingehek gewherî *(substansîyel)* bide şuûrê. Dibêje: tecrubeya ku hiş xwebixwe wek kirdeyê di wateya gewherê de, anku, wek rasteqîniyek bingehîn a metafîzîkî, pêk dihîne di nav hemû bûyerên zêhnî de mîna amûr *(melzemeya)* wê, cih digire.

Li gorî wî, ‘xwe têgihîştin’ bi şuûrê re girêdayî ye. Hiş kirdeyê gewherî *(substansîyel)* e: lewra bi hawayekî bixweber ji lay şuûrê ve digihî je nav wan hemû îdeyên ku jiyana wî ya zêhnî saz dikin.

Bi vî hawayî, ji ber ku hiş wek 'tişta difikire ye' pê re şuûr peyda dibe. Çimku şuûrdar bûn ew e ku em bizanibin em difikirin, bi gotinek din, gava em di nav hizirînê de ne, kirdeyê zêhnî ye ku difikire. Ji vê derê diseride ew derfeta ku pê ji kirdeyê dihizire re qadek zêhnî vedibe û bi warê tecrubeyek şuûrî re yeketîyek peyda dibe. Ev jî wê wateyê dide ku li cem her îdeyê, ya ku wek xwezaya xwe ya formel raserast hilgira şuûrê ye, hevpariya tiştan heye, naveroka wan her çi jî be.

Li gorî Descartes îde teşe *(forma)* her ramanê ye, ewa ku em bi 'têgihîştina bixweber' a li cem wê ve digihîjin şuûra hebûna ramanê. Şuûr ev 'têgihîştina bixweber' bixwe ye wek tecrubeyek *(azmayîşek)* formel û tevgişt a di nav têgihîştina her hizrê de lepandî ye. Hiş, ji ber ku bixwe tevahiya ramanê ye, bi gelemperî, ji xwezaya formel a van îdeyan haydar e. Bi vê qasê hişê ku dihizire, dibe xwediyê îdeyan bi pêkhanîna peywendiyek şuûrî ve ligel ramanên xwe. «Ev xwezaya îdeyî ya ramanan a ku 'ez' têdigêhijimê, di rastiya xwe de xwezaya gewherî *(substansîyel)* a hişê min e, anku bi 'ez'ê re peydabûna 'şuûra bixweber' a îdeyekê, şuûra 'tecrubeya bixweber' a xwezaya hişî ye.

Bixweberiya ku şuûr hilgira wê ye, têkiliya bixweber a bi xwe/ezê re bi hawakî qutîbir wek gewhera ku ji 'xwe-ragirtin'a wê re dibe alîkar, kifş dike.

Şuûra 'xwebûn'ê her tim şuûra 'ez'ê ye weke raman, naverokek xwe ya epîstemîk a ku gewhera wê ya zêhnî pênase dike, heye. Bi qaydeyekî dikare were gotin ku ji bo Descartes dîmena mirov a madî, yan jî beden, wek yekûna hemû hêmanên madî, ew nêveng e ku şuûr pê xwe diderbirîne. Şuûra kartezyen, wek têgihîştina bixweber a gewherîtiya zêhnî ya di nav têgihîştina îdeyan de lepandî: ew şuûr e ku hemû zanayiyan wek çalakiyek zêhnî dihêwirîne di xwe de di wateya zanayiya xwezaya xwe ya aqlî de.

Li vir dîyar dibe ka ji bo çi Descartes şuûr û zanayiyê di heman wateyê de bikar haniye. Lewra şuûr venasîn û zanayiya hebûna xwe ye wek kirdeyek gewherî *(substansîyel).* Ew 'hebûn'a ku 'rasteqîniya pêşîn'e û ji bo rasteqîniyên din jî mercên epîstemîk û ontolojîk diafirîne. Bila ev gotar biqede bi van rêgezan ve, ku Descartes ew ji bo metoda lêkolîn û têgihîştina rastiyan pêşniyaz kirine: Rêgeza yekemîn, divê ti tişta ku derbarê rasteqîniya wê de zanayiyek qethî tine ye, ti carê wek rastî nehêt pejirandin.

Ya duyemîn, pêwîst e heta mimkun be li parçe û hûrliban werin parvekirin ew dijwarî-pirsgirêkên ku dê werin vekolandin, daku baştir bihên şîrove û çareserkirin. Ya sêyemîn, divê raman bî wî hawayî warin dîzaynkirin ku ji obje-mijarên têgihîştina wan herî hêsan destpêbikin û ber bi zanayiya yên herî têkel ve hilbikişin. Ya çaremîn, lazim e em jimartinên bê kêmasî û kontrolên gelemper bikin ku pê ewle bibin me ti tişt li derve nehîştiye.

**Orhan Agirî**

orhanagirî@hotmail.com

27.09.2015

***Çavkanî***


***1-*** *René DESCARTES, Meditations metaphisiques.*

***2-*** *Olivier PUTOIS, La Conscience.*

***3-*** *http://www.flsfdergisi.com/sayi13/187-200.pdf*

# Li Ser Felsefeya Felsefeyê Çend Gotin

Di nav hemû cure zanyarî (zanayiyan) de, a ku herdem rexne li xwe digre û carekê din li ser encamên xwe hûr dibe, guman têde nîne ku felsefe ye. Ji vê helwesta felsefeyê re, 'Felsefeya Felsefeyê' tê gotin. Mirov nikare bibêje ku em dikarin, fizîka fizîkê bikin; lê felsefeya felsefeyê dibe û pêkan e. Ev helwesta felsefeyê, rê li ber hişkebawerî (dogmatîzmê) digre û rê nade ku encamên felsefeyê ti caran bibin encamên tequz (misoger) yan jî naguher.



Bandûra vê helwesta felsefeyê, li ser hemû zanistan jî heye û bi awayekî eşkere, ev yek tê xwiyakirin. Mesela di têgihiştina <zanista nû> de, encamên (zagonên) zanistî, êdî mîna zagonên mayende *(herheyî)* nayên dîtin û mîna <zagonên ku dibetiya rastiya wan bilind e> têne qebûlkirin. Lewma jî, pirî caran em ji bo felsefeyê dibêjin ku ew <lêgerîneke bêsekn/bêrawest e> û stargeh yan jî dereka ku felsefe dixwaze xwe bigihîne wir jî tune.

**Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

## Felsefe, Wêje û Zanyarî

Di bingeha pêkhatina mirovahiyê da sê (3) faktor/tişt hene, ku meriv dikare wan wekî pusûleyên jiyana mirovahiyê jî binasîne. Di dîrokê de heya roja me ya îroyîn jî, pêşketina mirovahiyê û tegîhiştina rast û dirust, bi rêya wan her sê faktoran bûye û ev sê faktor jî, bi hevdu re girêdayî ne û ku meriv dikare bibêje pêdiviya wan bi hevdû re jî heye. Faktorên ku ez behsa wan dikim felsefe, wêje û zanyarî ne. Têgihiştina felsefe, wêje û zanayî yan jî zanyariyê jî, helbet bi rêya hiş, hizir, pêşnûma, xewn û xeyal, meraq, daxwaza zanînê û mantiqê *(vac)* pêk hatiye.

Felsefê bi rêya hiş û mantiqê li gelek kadên hebûnatiyê vekolaye û bi rêya wan lêkolînên jî, xwe gihandiye rê û rêbazên zanîn û zanyariyê. Tu guman têde nîne ku wêje jî, di encama lêgerîna xwenasîna mirovî de bi rêya hest, raman û xeyalan xwe daye der û bûye yek ji wan xwevegotina mirovan ya edebî. Herçuqasî di metnên edebî *(wêjeyî)* de awa û şekl, yan jî em bibêjin vegotina gotin yan derbirînê li pêş be jî, dîsa jî em di wan metnan de li hinek fikr û ramanên felsefî rast têtin, ku ew jî ji bo wêjeyê rêya fikirîna felsefî vedikin. Dema meriv li metnên helbestîk yên Homerosî mêze dike, ligel coşdariyeke wêjeyî û helbestîk, meriv rastê ramanên mîtolojîk û felsefî jî dibe, ku ev yek jî nîşaneke xurt ya têkiliya wêje û felsefeyê ye.

Heke em karibin li ser sê pirsên jêr hinekî rawestim, ez bawer im em ê xweşiktir karibin xwe bigihînin çend zanayiyêm gelemeperî yên derheqê sernivîsê de, ku ew sê pirs jî ev in:
- Gelo felsefe çi ye û navê felsefê li kû derê hatiye?
- Wêje çi ye û navê wêjeyê ji kû derê tê?
- Têkîliya felsefe û wêjeyê çi ye û têkiliyeke çawa ye gelo?

Armanca felsefeyê, xwe gihandina heqîqetê ye û helwest û hewldaneke mirovî ye, lewma jî felsefe rave dike, li ser pirsgirêkên tevahî radiweste û dixwaze ku bi rê û rêbazên aqlî,

xwe bigihîne hinek encamên derbasder. Di vê lêgerînê de, helbet rênîşanderên felsefeyê aqil û mentiq in û rexne jî, di vê lêgerînê dê wekî prensîpekî jêneger derdikeve pêşiya me. Navê felsefeyê, ji peyva hevududanî ya 'philosophia' yê tê, ku bi zimanî yewnanî di wateya 'hezkirina zanyariyê' de ye. Ango 'philo' hezkirin e, û 'sophia' jî zanyarî ye. ku wateya 'hezkirina zanyarî' dide.

Di seranserê dîrokê de gellek feylesofan xebatên xwe yên felsefî, bi awayekî wêjeyî nivîsandine. Mirov dikare wekî mînakên navdar Platon, Aziz Augustinus, Schopenhauer û Nietzsche nîşan bide. Herçuqasî navê wan bêtir bi felsefeyê were nasîn jî. Descartes, Pascal, Berkeley, Hume û Rousseau jî, xebatên xwe yên li ser felsefeyê bi rê û rêbazên wêjeyî nivîsandine. Di dema de jî, du feylesofên navdar ku ew jî Bertrand Russell û Jean-Paul Sartre ne, ji ber xebatên xwe yên wêjeyê, şayanî xelata Nobelê hatine dîtin. Yanî ev jî nîşanî me dide, ku li gellek cîha wêje û felsefe, di nava hevda ne û ji hevdû hêz digrin.

Baş e, wêje çi ye?
Wêje, zimanekî estetîk ê çand û hunerê ye û di dîroka neteweyan de, bûyerên wekî şer, lehengî, mirovahî, huner, pêkenîn, lawij, rexne, biyografî, gotar, gengeşî û şanoyê, bi zimanekî edebî û hunerî radixe holê. Felsefe û wêje, di gelek mijaran de nêzî hevdû ne her du jî bang li mirovan dikin, lêbelê di wêjeyê de pêşnûmaya hunerî û xeyalî li pêş e û di felsefeyê de jî, aqil û mentîq. Ligel vê yekê jî, meriv dikare bibêje ku herdu jî kirdewar in, li gor dem û warê diguher in û ji lêgerîna rastiya zanistî zêdetir, lêgerîneke kirdewar û mirovî ne.

Dîroka wêje û felsefeyê, meriv dikare bibêje ku qasî dîroka mirovahiyê kevin e û ne pêkan e ku li derveyî pêşveçûma mirovahiyê û têgihiştina mirovî ya xweza, gerdûn û civakê, meriv bikaribe wan binirxîne. Herdu hewldan jî, aîdê cîhana mirov ya takekesî ne û di pêşveçûna mirovahiyê de, xwediyê roleka mezin

û berbiçav in. Ma kê dikare cîhaneke ku wêje û felsefe têde tunebe, pêşnûma bike. Heke were pêşnûmakirin jî, bila baş were zanîn ku dê ev pêşnûma ne cîhaneke mirovî be; dê bêtir cîhaneke mekanîk û statîk be. Çimku wêje û felsefe, di rêya zanyariya meriv de du qad û derencekên mirov in ku beyî wan ne jiyan dibe û ne jî mirovahî. Lewma jî, ez dibêjim ku heta ku mirovahî hebe û bijî, dê felsefe û wêje jî hebin û dê bi heman rengên xwe yên xweşik, di cîhana me de berdewam bikin.

**Gul Seven**
gulseven233@gmail.com
04.10.2015

***Jêderên giştî***

***1-* ‘***Felsefe-Edebiyat İlişkisi Sorunu 1. Ali Osman Gundogan.’*
***2-*** *www.felsefevan.org*
***3-*** *‘Moran, Berna. Edebiyat Kuramları ve Eleştiri, Cem Yayınevi, İstanbul 1988.’*
***4-*** *‘Ali Osman Gündoğan, <Edebiyat İle Felsefe İlişkisi Üzerine> Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi Cilt: 40 Yayın Tarihi: 1999.’*

## Li Ser Çend Nivîsên 'Hewar'ê Xwendineke Cuda

Di vê gotarê de em dê li ser mijareke ku girêdayî felsefeya mêparêzî/femînîzmê ye rawestin. Gelo di mêparêziyê de 'mal'a ku li ser 'cih/war' bûye navenda nîqaşan çewa dikare were ravekirin. Em dê li ser nivîsên kovara Hewarê li şopa 'mal'ê bigerin. Bi vê yekê jî ji aliyeke din ve dewlemendiya wan nivîsan wê cardin bê dîtin. Ji ber ku hewar di vî warî de jî keresteyan pêşkeşî me dike. Heya niha di derbarê naveroka 'mal'ê de gelek tişt hatine gotin. Gelo 'mal' wateyên bi çi awayî di nava xwe de dihewîne?

'Ev mala ku em li ser dergûşa wê hatine razandin tenê mala malbata me ye? Baş e, em dê ji bo 'mala welatê' xwe çi bêjin? An jî ji bo ya civata xwe?' (Bora, 2009: 68).

Bi vê yekê carina 'mal-warbûna' ku em qala wê dikin wekî 'welat' derdikeve pêşberî me. Em dê li vir li ser van pirsên bingehîn rawstin, lê binêrin ka di nava rewşenbîrên kurd ên êwra hewarê de 'mal' bi çi awayî hatiye bikaranîn.

Ew rewşanbîrên ku em dê li vir qala wan bikin Nûredîn Zaza, Qedrîcan û Osman Sebrî ne. Em dê di nivîsên wan de şopa 'welat'ekî bigerin ku xwe li ser têgeha 'mal'ekî avakiriye. Taybetiya van nivîskaran ew e ku piştî serhildana Şex Seîd neçar mane terka welatê xwe bikin. Rewşenbirên me piranî koça xwe ber bi Şamê û Rojavayê Kurdistanê ve kirine.

Ji ber ku me dît gelek nivîskaran di berhemên xwe de 'mal' pîroz kirine me hewce dît ku em hinek vê 'mal'a pîrozkirî vekin û rastiya vê 'mal'ê bibînin. Bi rastî jî em dikarin di derheqê 'mal'ê de gelek tiştan bibêjin. 'Mal' di zimanê me de bêjeyeke herî bibar e. Wate, hest û dîrok lê bar e (Bora, 2009: 63).

Di devereke din de jî girîngiya 'mal'ê wisa hatiye diyar kirin: 'Mal hem rih hem jî beden e, dinyaya yekem a hebûna mîrov e.' (Bachelard, 2013: 37).

Em dikarin pîrozkirina 'mal'ê ya di nivîsan de li vir zêdetir jî bikin. Lê li vir ya ku me peywendîdar dike 'welat' bûna 'mal'ê ye.

Di nivîsên hewarê de çewa ev mala ku ji hela gelek nivîskaran ve hatiye pîrozkirin veguheriya welatekî? Welat çewa bûye xeyalek ji bo wan nivîskaran?

Loma jî wateya ew qas tejî ya ku em didin 'mal'ê biguman dibe. Şik li ser vê pênasê çê dibin. Ji bo koçerekî cih xwedî wateyeke taybet e lê ji bo gundiyekî, bajariyekî ev yek diguhere. Ji bo koçerekî 'cih' wareke demî ye, her tim bêwariyek heye lê di heman demê de jî her tim warek heye. Warek giştî. Heya ciheke ku konê xwe li ser vedin hebe war jî wê hebe lê ew cih jî demkî ye. Bêcihûwariyeke wisa jî dibe pir wariyek û pirwariyek jî dibe bêwariyek. Lê ji bo gundiyekî an jî bajariyekî tiştek wisa tune. Cih 'mal' e. Mal 'war' e û war jî 'welat' e. Loma dibe ku pîroz be an were pîrozkirin ev 'mal'. Dema mijar were li ser kovara Hawarê û nivîskarên wê jî em dibînin ku 'mal' vediguhere 'welat'ekî. Her çend em dê li vir nekin mijara nîqaşan jî ji bo tevgera mêparêzî ya jinên kurd jî em dikarin vê yekê bêjin. Jina kurd di têkoşîna xwe de 'mal' wekî 'welat' têgihîştiye û li gor vê yekê jî fêrkirina vê yekê hewce dîtiye. Jinên kurdan li ser 'mal'a 'welat'bûyî felsefeya xwe ya mêparêziyê avakirine.  Sedema vê yekê ew e ku 'mal' di gelek tevgerên neteweyi de bêjeyeke herî girîng e. Bi awayekî rasterast direfşên netewperweriyê û neteweyê meteforên wê wek 'gazîn' wek 'nîştiman', 'welat' bi wê bêjeya yekem bi 'mal' ê re têkildar e (Bora, 2013: 68). Bi rastî jî ew çîrokên ku em dê mînak bidin de hesreta welat derdikeve pêşiya nivîsan. Bi awayekî eşkere dertê holê 'mal' wek 'cih' bûye 'welat'ê xwe.

Ev nivîsên li jêr em didin ne ji hêla nivîskarên jin ve hatine nivîsîn lê li vir ji bo ku em berawirdkirinekê bikin mînakên herî baş jî dîsa ew ev nivîs bi xwe ne.

Bi awayekî kronlojîk em dê wan çîrokan bi dahûrandinekê re derbas bikin. Ji çîroka pêşîn heya a dawiyê em dê hewl bidin ku wan mînakan raxînin li ser pelên vê nivîsê û ji wan ya ji bo me girîng e diyar bikin. Em di serî çîroka 'Gundê Nûava' ya Qedrîcan binêrin:

*'Kula welat çima holê giran û ji bîr nabe! Heta niho me digot: Em bê der û poxan in. Ji lewra her gav birînên me diaxivin û ji hesreta erdê bav û kalan em dîn dibin vêca me çi divê? Gund gundê me, bexçe û baxên me. Tekûz her tişt her tişt ê me.' (Hawar: 33).*

Wekî di beşek vê çîrokê de jî tê xuya ew hesreta ku ji bo welat tê kişandin xwe li ser gundekî dida xuya. Xeyal tê kirin, li ser gund tê hûr bûn û xwestin xwe dide der.

Em çîrokeke din berdewam bikin. Osman Sebrî di serhildana Şex Seîd de gelek merivên xwe winda kiriye. Nivîskarê Hawarê di çîroka xwe ya 'Goristanek Li Amadê' de xewna xwe tîne zimên. Ew çîrok xewnek e. Osman Sebrî dema ber Derya Qizil de ye dikeve xew û di xewna xwe de ber bi Amadê ve difire. Dema Osman Sebrî tê Amadê diçe li ser goristanekî li wir kesek tê û wî dibe qatên bin axê. Li wir jî leheng bi wan kesên ku di serdema serhildana Şex Seîd de hatine sêdaredan re diaxive.
Nivîskar qala xebatên kurdan ên li dinyaya din jî dike. Kurd li wir jî civîna li dar dixin û kovaran derdixin! Di nava wan dîyalogan de gotinên wisa derbas dibe:

*'Erê tu hatî û ew hatin lê ne wekî daxwaza me. Tu bêcih û bêwar mayî hingê em ketin bîra te.' (Hawar: 351).*

Di nava diyalogan de ev gotin balê dikşîne li ser bêcih û warbûnê. Nivîskar sedan mîl ji dûrî welatê xwe vegeriyaye welatê xwe û penaberiya xwe bi têgeha 'bêcihûwari'yê aniye ziman.
Di heman demê de kesên ku dide axaftin jî gazîn û giliyan dibihîse. Ev yek jî aliyekî din a çîrokê ye.

Yek ji wan nivîskara jî Nûredîn Zaza ye ku neçar meya piştî serhildana Şex Seîd terka Bakurê Kurdistanê bike û berê xwe bide penaberiyê. Em dikarin di çîrokên wî de jî bibînin ka çewa 'mal' veguheriye 'welat'. Zaza di çîrokeke adaptasyonkirî de dûrbûna xwe ya ji welêt aniye ziman. Qala bêwateya xweşikbûna welatê biyanî dike û hesrata xwe ya welatê xwe dinivîse. Wisa dinivîsîne Zaza:

*'…çiqas bextiyar e, ew mirovê ku êvaran vedigere mala xwe û di nav zar û zêçên xwe de rûdine. Derketî li her derê tenê ye!'* (*Hawar: 486).*

Rastî jî ma ne wisa ye? Ma derketî li her derê ne bi tenê ye? Di çîrokeke din de ev hesrata welêt a Nûredîn Zaza bêhtir kifş dibe. Di Çîroka 'Keskesor'ê de Zaza ber bi zarokatiya xwe ve ber bi bajarê zarokatiya xwe Xarpetê ve diçe.

Xarpet di serhildana Şex Seîd de hatibû rizgarkirin loma nivîskar qala wê yekê dike. Qala rojên serxwebûna bajarê xwe dike û wê azadiya demkî digere. Di dawiya çîrokê de ew hesreta xwe ya ji bo welatek azad wisa aniye zimên:

*'Ev şazde salin ku ev hal di kurdistanê de hikimferman e û dîsa şazdeh salin ku ala rengîn di dilê min û di dilê hezar xortên kurd de pêl dide. Ji bo anîncihîna wesiyeta bav û kalan vekirina tola wan û daçikandina ala xwe ser kelat û çiyayên kurdistanê em kurd li benda bihara xwe ne , li benda baraneke bi keskesor.' (Hawar: 504, 505).*

Li vir ya girîng ew e ku piştî 16 salan derbasbûnê jî bîra nivîskar de çikandina ala serxwebûnê maye. Ev hesreta dehan salan vediguhastina wê ji bo salên dahatû dike. Pêkanîna vê yekê zêde ne girîng e. Tenê anîna ziman a vê rewşê girîng e. Ji bo nifşên nû nivîsandina vê yekê girîngtir e. Xeyalkirin, çûyîn û hatina ber bi welat ve di van çîrokan de xwe dide der.

Di çîrokeke din a adaptasyonkirî de Nûredîn Zaza dîsa ber bi şevên kurdistanê ve çûye. Îhtimaleke mezin e Zaza ti carî çav bi çiyayê Sîpên *(Sîpanê Xelatê)* neketiye. Lê Zaza bi çavekî şivanekî ku li Sîpanê Xelatê şivantî dike hesreta xwe tîne ziman. 'Cih' diguhere lê hesreta 'welat' wekî xwe dimîne. Di wê beşa çîrokê de wisa hatiye nivîsandin:

'*....Li goman berx dikalin, li ser zinarên bilind kew dixwendin, li ser xwînava giyayên kesk û taze tîrêjên rojeke sor diçirisin û fikra ku ezê bextiyariya xwe winda bikim, dilê min yê reben digevize û nalînên kûr û bikeser li wan, li pez, kew û çiyayan vedigerî.' (Hawar: 587).*

Êdî rasterast çîrok ber bi xeyalen ve diherikin. Çiyayan, kewan, zinaran, mêrgan û bi giştî jî hemî welat dixe di nava hundirê xwe. Di çîroka 'Stêrk'ê de jî ev yek wisa xuya dibe. Em çîrokek din a Zaza binêrin:

'…li *taxa Mihacira, ji oda xwe temaşeya bexçeyên Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên kurdistanê yên bilind, bi dar û avên cemidî tên bîra min. …….Çiqas bi kêf im, çiqas bextiyar im, bihuşt bihuşteke rastîn!' (Hawar: 591).*

Ev çîroka dawî ji bo ku em mijarê têbigihîjin ji me re dibe alîkar. Zaza li welatekî biyanî dijî. Li Sûrî ji Kurdistanê dûr e. Taybet jî di nava taxa penaberan, koçberan de dijî. Lê demek tê ber bi welatê xwe ve dikeve rê. Diçe Kurdistanê û qala bihiştbûnê welatê xwe dike. Ew meşa ber bi Kurdistanê ve ya xeyalî têra arambûna wî dike.

'Cih' bi tevahî 'welat' bi xwe ye. Hesrata 'mal'ekê heye lê bêguman ev 'mal' ne wekî maleke pîrozkiriye. Ne kolikek e, ne avahiyek du qat e, ne xaniyeke gundaye, ne maleke çiyayî ye, ne daîreyeke apartmanan e, lê 'welatek' e, nîştiman e edî ev 'cih'.

Dîsa Gaston Bachelard vê rewşê bi awayekî vekirî rave dike. '…bi vê yekê 'mal' rojana rojane, li ser xeteke dîrokî, vegotineke dîrokî ya jiyankirî der tê. Bi saya xeyalan ew zerengiyên jiyana me ya rengareng tevlî hev dibe û xezîneyên rojê berê diparêze. Di xanîyê xwe yê nû de dema em xeyala mala xwe ya berê dikin em ber bi welatê xwe yê zarokatiyê ve diçîn, ber bi wî welatê xwe yê ku mîna ku nayê bîra me û bêtevger ê, em ber bi wî walatî ve diçin. Em hingofan dijîn, hingofên şadiyê.' (Bachelard: 2013: 36). Em di çîrokên Zaza de jî çav bi vê yekê dikevin. Nivîskar ber bi welatê xwe ve diçê û dikeve hingofan, hingofên şadiyê…!

Di vê gotarê de em dê cara dawî çîroka Qedrîcan binêrin. Qedrîcan di çîroka xwe ya 'Sond'ê de qala gundê xwe dike. Dema sibeyekê ji xew şiyar dibe jî hestên xwe wisa tîne ziman:

*'Her rojên havînê ku ez ji xew radibim, sibehên ew rawî dibînim, mîna her kesî, zarokatiya min tê bîra min. Welatê min î kesk, cihê ku lê hatim dinê tê ber çavên min û bê hemdê min hêstirên min diherikin ser destê min ê çepê.' (Hawar: 593).*

Em dikarin ligerîneke bi vî awayî berfirehtir jî bikin. Em dikarin ber bi çend helbestên wan ve jî herin. Lê wê encama ku em

bigihîjinê dîsa tiştek bi vî awayî be. Di wan çîrokên Hawarê hatine weşandin de hesreta welatekî heye, hesretên xwe hene, hesretên ku riya xeyalen vedikin hene.

Bi tevahî di wan çîrokên ku me derxistine pêş de nivîskaran ‘cih’ û ‘mal’ wekî welatekî anîne ziman. Êdî ‘cih’ wekî ‘mal’ekê naye nîşandin lê wekî ‘war’ekî welat tê vegotin. ‘Mal’ ji hêla naverokê ve berfirehtir dibe, ew avahiya ku ji nêrdewan, kolîn/mexzenan pêkdihat vediguhere çiyayan, deştan, zozanan û welatê dûrmayî. Ne cihê matmayînê ku em di nivîsên nûserên serdema ewilîn van yekan dibînin. Di gelek nivîsên rewşenbîrên penaberiyê de jî ev eşkere xwe dide der. Gelek nivîskarên kurd bi hasreta welatê xwe çûne li ser dilovaniya xwe.

Mêparêziya ku di vê sedsala dawîn de hêdî hêdî dikeve nav felsefeya welatên 3.ên cîhanê jî (her çend ev pênas şaş be jî) em çav bi romantîzekirina mijaran dikevin (û her çend ev mijar hewceyî nîqaş û gotarên nû be jî). Nivîskarên ku zêde nikarin xwe li ser bingeha pirsgirêkan bigrin, berê xwe didin romantîzekirina mijaran. Mêparêzî li ser gelek tiştan diçe û gelek nîqaşên cûr bi cûr têne kirin. Ger bedenek hebe divê azadiya wê bedenê jî hebe, lê di heman demê de divê azadiya cihê beden lê jiyan bike jî hebe. Loma pêwîstiya welateke azad jî, li vir dertê. Di nivîsên kovara Hewarê de ji bo ku em nêrînên din re berawirkirinekê bikin rengîniyeke dewlemend heye. Mêparêzî gelek deveran li ser dij kolonyalîzmê diçe, li ser azadiya welêt diçe. Ne tenê li ser ‘cih’…

**Kêmzan Bêwar**
13.10.2015

***Çavkanî***

***1-*** *Alkan, Ayten, Zayend Zayend Cih, Weş: Varlik, Stenbol, 2009.*
***2-*** *Bachelard, Gaston, Poetîkaya Cih, Weşanên Îttakî, Stenbol, 2013.*
***3-*** *Hawar (hemî hêjmar), Weşanên Belkî, Stenbol, 2012.*

## Ekolên Psîkolojîk û Taybetmendiyên wan

Di pêvajoya berfirehbûn û pêşveçûna zanista psîkolojiyê de, meriv dikare behsa gelek teorîsyen û psîkologan bike. Hinek teorîsyen jî hene ku di wateyeke zanistî de, keda wan di psîkolojiyê de gelek mezin e û bûne damezranerên ekolên *(xwendegehên)* cihêreng. Niha jî em ê taybetmendiyên wan xwendegehan bidin nasandin.

**1- Binyatgerî (Strûktûralîzm - Wilhelm Wundt)**

Wilhelm Wundt, wekî damezranerê psîkolojiyê tê dîtin. Ew, bi xebat û ceribanên xwe yên psîkofîzyolojîk, gihêjtiye wê astê. Hêmana bingehîn ya nêzîkayîtêdana wî ya psîkolojîk, vekolanan wî yên li ser *(hiş/bîr)* in. Li gor baweriya Wundt hiş, xwediyê hêza sererastkirina naverokên xwe ye. Ji ber ku vê yekê parastiye, navê ekola wî wekî 'Hemdparêzi'yê' jî hatiye binavkirin.

**1-** Binyatgeran pirsa, *'hiş çi ye?'* pirsî ne.

**2-** Li gor baweriya wan mijarên psîkolojiyê, hiş û pêvajoyên zêhnî yên ku hişên mirovî tînin holê ne.

**3-** Zêhn; ji hêla avahiya xwe ve, bûyerên weke raman, têgihan, hest û hemd *(îrade)* ye. Mînak: Dema ku em wextekê dirêj li rengeke mêze bikin, rengê din çawa xwiya dikin? Têgihana germ û serma, gelo çawa pêk tê? Dema em pirsgirêkeke çareser dikin, em bi hevokan difikirin yan jî bi şekilan *(lewnan)*? û hwd.

**4-** Helwesta wan a ku psîkolojiyê bi hiş sînor kirine, mijarên psîkolojiyê jî teng kiriye.

**5-** Rêbaza; 'Lênêrîna Derûnî', bikaranîne.

**6-** Li gor Wilhelm Wundt psîkolojî, vekolandina hiş û pêvajoyên wê ye.

**2- Erkevanî (Fonksîyonalîzm - William James, John Dewey)**

Çavkaniya nêzîkayîtêdana erkevaniyê, Amerîka ye û di sedsala 20an de derketiye holê. Ev ekol *(nêzîkayîtêdan),* bi şixulîna zêhnê û lihevhatina organîzmayê ya bi dorhêla xwe re, eleqeder dibe.

Fonksîyonalîst li gor vê helwesta xwe, pirseke bi vî rengî ji xwe dikin: ‘Pêvajoyên zêhnî, dikarin çi bikin gelo?’
Ferqa wan ya ji Strûktûralîzmê ew e, ku ew weke wan zêhnê di yek bingehekê de şirove nakin. Li gor baweriya wan; zêhn yan jî hêmanên zêhnê, lodeka pêvajoya ye.
Li gor baweriya wan zêhn, tevahiyeke erka ye, ku di cîhana rasteqîn de rê li encamên pratîk vedike.



**1-** Pirsa sereke ya erkevanîparêzan, ‘zêhn, ji bo çi ye?’ ye.
**2-** Li bûyer û avahiya zêhnî, bi rêbazên çavdêrî û çavdêriya derûnî, vekolane.
**3-** Li ser lihevhatina organîzmayê a bi dorhêlê re û serkeftina organîzmayê ya çareserkirina pirsgirêkan, rawestiya ne.
**4-** Li gor wan tevger, ‘guncaneke çalak ya bi dorhêlê re’ ye.
**5-** Ligel hiş, divê li tevgerên ahengdar *(guncan)* jî were vekolandin.
**6-** Girîngiyê dane xwepêşandan û feydexwaziyê.
**7-** Demjiyanên derûnî, ji ketumetbûnên wê demê derketine holê. Li faktorên, ku bandûra wan li ser jiyana derûnî û tevgerên me hene rawestiyane.
**8-** Heke bersiva, pirsa ‘çima wiha tevdigere?’ were dîtin, wê demê dê lihevhatina organîzmayê hêsantir bibe.
**9-** Tevger li gor encamên xwe, baş yan jî xirab in.

**3- Tevgergerî (Behavyorîzm - John Watson, Îvan Pavlov)**

**1-** Behavyorîstan; Strûktûralîstan bi sûcê vekolandina mijarên kirdewar *(oznel)* sûcdar kirine û bi tundî li dijî psîkolojiya hişî derketine.

**2-** Li gor bîr û baweriya wan ji bo ku psîkolojî bikaribe bibe zanistek, divê li ser tevgerên mirovan yên têne xwiyakirin û dikarin werin pîvandin, raweste û bi vî hawî li wan vekole.

**3-** Ji Behavyorîstan re; 'Psîkologên Hişyarker-Bertek H-B' tê gotin.

**4-** Tiştên ruhî, raserê xwazayê ne û zanist, bi wan re mijûl nabe.

**5-** Mirov heta fikirînê jî, bi têgeheke weke demîngirtinê *(şartlanmayê)* dikare şirove bike.

**6-** Ji ber ku tevgerên heywanan dişibine tevgerên mirovan, divê li wan jî were vekolandin.



***Rexneyên ku li Tevgera Behavyorîzmê hatine girtin***

***A-*** *Ji 100 % mirov nikare objektîv tevbigere.*

***B-*** *Pirraniya bûyerên giyanî; ji ber ku nikarin werin çavdêrîkirin, li derveyê lêkolînên xwe hiştine.*

***C-*** *Bi riya demîngirtinê, qontrolkirina şert û mercên hawirdor û bi vê yekê xwesteka qontrolkirina tevgerên mirovan, rê li afiranderiya mirovan girtiye.*

**4- Psîkanalîz (Tevgera Psîkodînamîk)**

**1-** Di dawiya sedsala 19an de, bi serpereştiya Sigmund Freudî dest pê kiriye. Sigmund Freud û çend hevalên xwe yên doktor gotine ku nexweşiyên aqlî û ruhî, nexweşiyên psîkolojîk in.

**2-** Di dema vekolana nexweşiyên aqlî de, derhişê kifşkirine.

**3-** Piştra, Freud û hevalên wî wiha bawer kirine ku sedemên nexweşiyên aqlî û ruhî, têrnekirina hest û ramanên me yên zarokatiyê ne, ku ber bi derhişê ve têne dahfdan û wisa tê xwestin, ku bila werin jibîrkirin.

**4-** Li gor baweriya Sigmund Freud hiş, ji sê *(3)* meretebeyan pêk tê.

**A- Hiş:** Ya ku em têdigihêjinê.

**B- Beriya hiş:** Tiştên ku li gor xwestekên me, têne bîra mirov in.

**C- Derhişî:** Xwestek û hestên me yên ku me wan bi temamî ji bîr kiriye yan jî em dixwazin ku ji bîr bikin.

**5-** Kesayetî *(şexsîyet),* ji sê *(3)* mertebeyan pêk tê:

**A- Îd:** Hilika *(navenda),* kesayetiyê û hêla bîyolojîk ya ku xwe dispêre zewqê, ye.

**B- Ego:** Rewşa hevsengî ya ku rasteqînî lê serwer e.

**C- Superego:** Hêla sosyal ya ku nirxdarazî têne pejirandin, ne.

**6-** Derhişî ne pasîf, herdem aktîv e. Carinan lewna xwe biguherîne jî, di xewn û xeyalan de xwe dide der.

**7-** Pirraniya tevgerên me, li gor vê yekê *(li gor rewşa derhişê)* pêk tên yan jî em bibêjin ku çêdibin.

**8-** Freud û hevalên wî wiha têgihiştine ku sebebên bûyerên ruhî *(derûnî),* sebebên bîyolojîk in jî. Yanî, bandûra biyolojiyê jî, li ser psîkolojiya me heye.

**9-** Di bingeha tevgerên şexsan de, jiyana wan a zarokatiyê heye.

**Derhişî:** Avahiya ku ji aliyê hest, bîranîn û xwestekên me yên hatine dewisandin pêk hatiye. Sebebê dewisandina van hestan, bîranîn û xwestekên zayendetiya hov û vajoyên êrîşkar in, ku bi demê re êş û şermê didin mirovan.

**10-** Ji bo têgihiştina tevgerên mirovî, divê mirov bi zarokatî û rabirdûya wan bizanibe.

**11-** Hindek sedemên tevgerên me, bîo-psîkolojîk in.

***Rêbazên ku tevgera Psîkanalîzê wan bikaranîne.***
***A-*** *Dahûrandina Xewnan*
***B-*** *Hîpnoz*
***C-*** *Bibîrxistina Serbest*

**5- Nêzîkayîtêdana Bîrbirîgerî (Jean Piaget)**

**1-** Li gor vê nêzîkayîtêdanê psîkolojî vekolandina bûyerên zêhnî yên weke serwextbûn *(têgihîştin),* hiş û fikirîn e.

**2-** Şexs, ji wan pêvajoyan sûdwerdigrin û derheqê xwe û hawirdorê xwe de, zanayiyan bi dest dixin.

**3-** Ji bo têgihiştina şexsan, divê em bi awayê têgihiştina xwe ya şexsan û awayê têgihiştina wan ya civakê jî bizanibin.

**4-** Rêbaza wan, rêbaza ezmûnê ye.

**5-** Zanîn û fêrbûn, du riyên bidestxistina zanayiya ne.



**6- Nêzîkayîtêdana Bîyolojîk (Bîyopsîkolojî - Adolf Mayer)**

**1-** Ev nêzîkayîtêdan; hewl dide da ku têbigihêje sebebên fîzyolojîk û psîkolojîk yên ku bandûrê li tevgerên mirovan dikin.

**2-** Awayê şixulîna xwiziya *(avzêya)* derûnî û avahiya kimyewî ya xwînê û pêvajoyên tûreyî *(sinirsel)* yên mejî, xwe di tevgerên me de didin der. Ango, bandûrê li tevgerên me dikin.

**3-** Ji bo têgihiştin *(fêhmkirina)* mirovan, divê meriv bi bîyolojî, sosyolojî û psîkolojiyê bizanibe.

**4-** Rêbaza ezmûnê, bikaranîne.

**7- Nêzîkayîtêdana Tevdeyî (Psîkolojiya Geştalt)**
**(Karl Kofka, Wolfgang Kohler)**

**1-** Li hemberê, Behavyorîst û Strûktûralîstan derketine.

**2-** Li gor bîr û baweriya wan bûyerên psîkolojîk, bûyerên tevdeyî ne. Ji ber vê sebebê ji bo fêhmkirina mirovan, divê bûyerên hawirdorî, bîyolojîk û zêhnî, bi hevdu re werin nîrxandin.

**3-** Tu tevger bi serê xwe tenê, ne xwediyê wateyeke ne. Tevger bi awayekî tevdeyî, ji şert û mercên sosyal û fizikî, ketumet dibin.

**4-** Her tevger, ji tevgera berê ketumet dibe.

**8- Nêzîkayîtêdana Humanîst (Mirovhez - Maslow, Rogers)**

**1-** Li gor vê nêzîkayîtêdanê tevgerên mirovî, ne bi binehişê û ne jî bi têkiliya H–B *(Hişyarker û Bertekê)* dikarin werin şirovekirin.

**2-** Berfirehbûna mirovî, hewcedarê pêdiviyên fizyolojîk û sosyal e. Têrnekirina wan, bandûreke neyînî li pêşveçûna psîkolojîk dike.

**3-** Têrkirina pêdiviyên mirovî û pêkanîna behre û potansiyela xwe, xala têrbûna mirov e. Bi vî awayî, ew hebûna xwe pêktîne.

**4-** Rêza *(dora)* pêkanîna mirov ya pêdiviyên xwe, hilbijartineke wan ya şexsî ye.

**5-** Dilêrîna wan ya bingehîn, 'mafê hilbijartinê ya mirova' ye.

**6-** Rêbaza wan, çavdêriya derûnî ye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Destpêka Zanista Psîkolojiyê**

## Di Felsefeya Antîk Yewnanî û Filehtiyê de Ramana Xwedê

Têgeha *(ramana)* Xwedê, mîna feraseteka filehtiyê xwiya dike. Hêza afirandinê ye û ev hêz, ji tinebûnê heyberan diafirîne hebûnê *(hebûnatiyê)*. Herweha, ev têgeh hevrezanekî jî dixe navbera Xwedê û ebdên wî. Belam, li gorî dîtinên serdema antîk; Xwedê ne afirander e. Ew, bi tenê mîmarê gerdûnê ye. Made jî, weke Xwedê *(Xwedayan)* ezelî ye. Bi gotinekê din: Made, heyîn û xweza qet ne hatine afirandin. Lewra, ew her hebûn û ezelî ne.

***Li Gor Felsefeya Antîk:*** Li gerdûnê <*caos*> hebûye û di vê **<caosê>** de tevlîheviyeke xwiya dikir. Paşê, Xweda yan jî Xwedayan, wê tevlîheviyê ji holê rakirine û rêkûpêkiyeke gihandine gerdûnê. Belam, dûvre di danezanîna ola filehtiyê de angaşteka din xwiya dike û li gorî vê angaştê jî Xweda, gerdûnê di şeş (6) rojan de afirandiye. Felsefeya ***Platonperestiya Nû*** jî; li gorî danûstandina afiraner û aferînê, nêrîneke heyama antîk e.

***Li gorî vê felsefeyê:*** Xwedê, heyîn bi xwe ye û bi vî awayî, tiştên din para xwe jê distînin û xwe dikin heyîn. Belam, di felsefeya filehtiyê de nêrîneka wiha tune û qet, peyda jî nabe.
Di vê mijarê de niqteyeka giranbiha heye ku ew jî ev e: Bi bandûra ***Platonperestiya Nû*** re, mistîsîzm bûye dijberê filehtiya ortodoksê û piştra, piştra, pêşengiya tevgera reformê kiriye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
10.09.2015

# Civaknasî: Tebeqebûna Civakî

Ji ber ku nifûs li gor pîvana hatiniya diravan, rêzdariya civakî û hwd. ji hevdu cihê dibe, di nav avahiya civakî de, bi awayekî hiyerarşîk hinek texlîdên yekîneyên civakî pêk tîne. Ji vê pêkhatinê re, tebeqebûna civakî tê gotin.

**Texlîdên Tebeqebûna Civakî**

**1- Tebeqebûna Dadayî**: Di vê cureya tebeqebûnê de, ji tebeqeyekê derbasbûna tebeqeyeka din, qedexe ye û statûyên mirovan tu caran nayên guherîn. Mînak: Sazûmana Qestan ya Hindîstana Kevin û sazûmana sosyal ya civakên koledar.

**2- Tebeqebûna Nîvdadayî**: Ev şeklê tebeqebûnê, piştî hilweşîna civaka koledar, di civakên feodal de hatiye dîtin.

Mînak: Sazûmana loncayê ya selçûkiyan û rêxistina exwîtiyê ya osmaniyan. Di vê texlîda tebeqebûnê de şexs, encax di demekê pir dirêj de dikarin tebeqeya xwe biguherînin û derbasî tebeqeyeka din bibin. Derfetên derbasbûnê, gelekî kêm in û ev yek, gelek zehmet e jî.


**3- Tebeqebûna Vekirî**: Piştî şoreşa Sanayiyê û guherînên girîng yên ku di avahiya civakan de pêk hatine, ev cure tebeqebûn derketiye holê. Di vê cure tebeqebûnê de şexs, li gor behre, perwerdehî û keda xwe, dikarin ji tebeqeyeke derbasê yeka din bibin. Li gor pêvajoya sanayîbûnê û girêdayê wê û bi xêra şoreşên sosyal û demokratîzebûnê, zagon û delk, rê didin ku mirov tebeqeya xwe biguherîne û derbasî tebeqeyeka din bibe. Heta radeyekê, mirov dikare bibêje ku piştevaniya vê yekê jî dikin.

**Pramîda Tebeqebûnê**

**1- Tebeqeya Jorîn**: Ji aliyê sermayedarên ku bi hêza xwe ya sermayeyeka mezin tevlî hilberandinê dibin, tê pêk anîn.

**2- Tebeqeya Navîn**: Ji aliyê kedkarên ku bi hêza xwe û bi hêza sermayeya xwe ya biçûk, tevlî pêvajoya hilberandinê dibin, tê pêk anîn.

**3- Tebeqeya Jêrîn**: Ji aliyê mirovên ku bi tenê bi hêza keda xwe tevlî pêvajoya hilberandinê dibin, pêk tê.




**Pramîda Tebeqebûnê**

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Destpêka Zanista Civaknasiyê**

# FERHENGOKA FELSEFEYÊ (04)

**1- Absurdîzm:** Awir û nêzîkayîtêdaneke, felsefî ye. Li gor vê felsefeyê, ji ber ku afirîndêrek tune, hewldan û xebatên watedayînên mirovî yên ji bo têgihiştina gerdûnê jî, bêwate ne û dawiya wan jî, têkçûn e.
Têkiliya Absurdîzmê bi Egzistansiyalizmê re heye, lê divê em wan tevlîhev nekin. Çavkanî û spartekên Absurdîzmê, felsefeya ***Soren Kierkegardê*** feylesofê sedsala 19ê ye. Bi weşandina ***<Mythe de Sisyphe>*** a ***Albert Camusî*** re jî, sînor û çerçoveya vê felsefeyê hatiye destnîşankirin.
Meriv dikare bibêje ku rol û bandûra Albert Camusî, di vê felsefeyê de gelekî girîng e. Li gor vê felsefeyê, jiyan bêwate ye, herdem xwe dubare dike, tewş e û beredayî ye. Ligel vê yekê, bi zanetî û têgihiştinê, dîsa jî divê em bijîn. Bi taybetî jî piştî Şerê Cîhanê a Duyemîn, li Fransayê gelek nêrînên absurdîst *(tewşikî, bêaheng)* derketine holê.
ing: absurdism
fr: absurde
tr: absürdizm

**2- Agnotolojî:** Zanista, lêkolîna nezaniyê ye. Ango, zanista nezaniyê ye. Li sebebên zanistî yên nezaniyê vedikole. Ji aliyê ***Robert N. Proctor*** ve hatiye damezrandin.
ing: agnotology
fr: agnotologie
tr: agnotoloji

**3- Anakronîzm:** Bêahengî yan jî neguncaniya bûyer yan jî heyîneke ya bi dewra *(dema)* xwe re, yan jî rewşa neguncaniya vê yekê ye. Bi awayekî taybet, di huner û wêjeyê de tê bikaranîn. Peyveke yewnanî ye û ji zimanê fransî, ketiye zimanên cihanê.
ing: anachronism
fr: anachronisme
tr: anakronizm

**4- Antroposantrîzm:** Çavkaniya vê peyvê, zimanê yewnanî ye. Ji peyvên ***<anthropos, mirov>*** û ***<kentron, navend>*** pêk tê. Ango, nêrîna ku mirovan weke navendê dibîne.
Li gor antroposantrîzmê, mirov navenda hemû tişta ye û hemû tiştên ku li gerdûnê hene, ji bo mirovî ne. Bi gotineke din; hemû tiştên ku li gerdûnê hene, ji bo mirovan û xizmeta wan hene. Yek ji ramanên bingehîn yên ku çanda musewîtî û filehtiyê pêk aniye jî, antroposantrîzm e.
ing: anthropocentrism
fr: anthropocentrisme
tr: antroposantrizm

**5- Afirîşparêzî (Xulkparêzî):** Li gor vê bawerî û nêrîna felsefîk; hêzek a ku raserê xwezayê ye û ku hebûnatiya wî ji berê ve hatiye qebûlkirin, ji tunehiyê gerdûnê afirandiye. Di seranserê dîrokê de, gelek navê cihêreng li wê hêza afirander kirine. Ev têgeh û têgeha panenteîzmê, ji hev cuda ne û lewma jî, ev têgeh wekî *<xulkparêziya dînî>* jî hatiye binavkirin.
Di dema paganîzmê de, gellek Xweda hebûn. Xwedayên baranê, ba û bahozê, bereketê, parastinê û hwd. Lê bi destpêka dînên yekxwedayî jî, hemû bûyerên derxwezayî li yek Xwedayekî hatine barkirin û afirandin jî, bûye hêz û vedîtina herî mezin ya wî Xwedayî. Baweriya afirîşê, meriv dikare bibêje ku wekî nêrîneke kevneşopî hema hema li hemû civakan hatiye dîtin.
Lêbelê mînakên wê yên pêşîn, ku meriv dikare bibêje çavkaniya Kitêba Mikeddes *(Ehda Nû û Ehda Kevin)* û Qur'anê jî kirine, di efsaneyên sumerî de hatine dîtin.
Di destpêkê de gerdûn li ser avê dilive û ji wê avê, çiyayek diwelide û erd û ezmên, ji hev cuda dibe. Efsaneya Adapayê, derheqê vê mijarê de mînakeke balkêş e.
Di Qur'an, Ehda Kevin û di Tanahê *(Tewrat û Zebur)* de, hatiye nivîsândin ku gerdûn û nîjada mirovan ji aliyê Yehova *(Navê Xwedayê ku di Tewrat, Zebur û Încîlê de derbas dibe)* ve hatiye afirandin. Ji ber ku Ehda Kevin û Tanah hema hema weke hev in,

di filehtî û cihûtiyê de, têgeha afirîşê jî weke hev in. Di Tanah û Ehda Kevin de, di beşa Afirişê *(Tekvin, Yaratılış)* de, behsa afirandinê tê kirin. Girêdayî vê yekê, meriv dikare bibêje ku Afirîşparêzî jî; mîna hemû olên ku hene, ji nû ve hatiye şirovekirin. Di vê modelê de peresana biyolojîk tê redkirin û di nav teoriyên çêbûna gerdûnê de jî, teoriya ***bigbangê*** *(teqîna mezin)* mîna teoriya zanistî ya tekane tê dîtin.
Piştgir û aligirên vê teolojiyê, teoriyên zanistî red dikin. Peresan *(evrîm),* peresana mirovî û meseleya kalên *(pêşiyên)* hevpar, ne li gor dînên semawî ne û bi teoriyên wan yên afirîşê re jî, nakok in. Ji bilî vê yekê; tarîxa dinyayê a biyolojîk, genetîka Mendel û teoriyên çêbûna sîstema Rojê û koka gerdûnê, ji aliyê vê teolojiyê ve nayê qebûlkirin.
ing: creationism
fr: créationnisme
tr: yaratılışçılık

**6- Diyalektîk:** Ev têgeh ji bo felsefeyê û şiroveyên *(raveyên)* aqlî gellek girîng e û gellek zêde tê bikaranîn. Wekî tê zanîn, di cîhana rojavayê de Herakleîtos wekî damezranerê *(bavê)* ramana diyalektîk tê zanîn û naskirin. Lê eşkere ye ku çavkaniya vê ramanê erdnîgeriya kurda ye û Herakleîtosî, vê ramana xwe ji Mezopotamyayê girtiye û berfireh kiriye.
Peyva diyalektîkê di destpêkê de ji bo hunera guftego û nîqaşê yan jî ji bo, bi rê û rêbazên nakok, hunera qanîkirinê hatiye bikaranîn. Diyalektîk, rê û rêbazeke aqlî ye û şeklekî sepandin û birêveberina aqil e. Dîsa meriv dikare bibêje ku rêbaza diyalektîk û rêbaza Sokratesî, mîna hunerên fikirînê, di Serdema Antîk de rewşên herî çalak yên diyalektîkê ne.
Berdewamiya guherîn û livdariyê *(hereketê, tevgerê),* di wê qonaxê de weke diyalektîkê hatiye binavkirin. Ji vê rêbazê re, ku bi rêya vê rêbazê hemû ramanên erênî û neyînî têne bidestxistin, diyalektîk hatiye gotin. Ji bo ramanên *(berbiçûnên)* Platonî diyalektîk, diyalektîka ramana ye.

Li hêla din jî, bi rêya yên sehekî, armanca xwegihandina ramanên bireseran *(heyberan, objeyan, nesneyan)* û xwegihandina zanayiyên nesneyan yên eşkere û naguhêr *(mayende, teqez)* e. Gotina Herakleîtosî ya <*meriv nikare, du caran xwe di çemekî de bişo.*> wekî destpêka danasîna diyalektîkê ya eşkere hatiye dîtin.

Têgehên bûyîn û guherînê, di vê xalê de weke du têgehên bingehîn xwiya dikin. Meriv dikare bibêje ku feylesofên Serdema Pêşîn, herçuqasî li hêlên dijber cih girtibin jî, diyalektîkzan in. Mesela bi hêsanî meriv dikare bibêje ku Sokrates û feylesofên Sofîst, bi gelek awayên cihêreng rêbaza diyalektîkê bikar anîne.

Lê li gor bîr û baweriya Arîstoteles; damezranerê *(bavê)* ramana diyalektîk ne Herakleîtos e, Zenonê Eleayî ye. Diyalektîka Zenonê Eleayî, xwe dispêrê texlîdeke ramana zanaviyê *(jê).* Bi rêya çend rêbazên diyalektîk, Zenon bi alikariya çend rêz paradoksan bêderfitiya *(bêîmkaniya)* livdariyê nîşan daye.

Li gor bîr û baweriya Zenonî boşî *(çokluk)* û cihêrengiyên li gerdûnê, xapînok in û dişibine xapînokiya livdariyê.

**Hegel û Formîla wî ya Diyalektîk:** Bêguman, feylesofê ku diyalektîkê formîle kiriye, Hegel e. Hegel bi xebat û rêbazên birêkûpêk, diyalektîkê formîle kiriye û xwe gihandiye xebateke felsefî a serkeftî. Li gor vê yekê diyalektîk, bi rêya livdariya sê awayan; ku ew jî tez, antîtez û sentez in, xwe pêkanîna Ramana Mitleq *(Ramana Teqez)* e.

Hegel ji livdariya ramanê dest pê kiriye û diyalektîka ku bi rêya vê ramanê bidest xistiye, ji bo livdariya gerdûnê jî bikar aniye. Lew re Hegelî, *mîna <ramaneke madî, ramaneke cismanî>* li gerdûnê mêze kiriye. Dîsa meriv dikare bibêje ku Hegelî, raman û heyînê, weke hev *(zanavên hev, ozdeşên hev)* dîtiye.

Di vê xalê de diyalektîk, pêvajoya berfirehbûna temamiya raman û heyîna ye. Marks, vê ramanê berovajî kiriye. Di rêya Hegelî de meşiyaye û bi awayekî madî, pêvajoya diyalektîkê nirxandiye. Livdarî *(tevger, hereket)* ji destpêkê ve, bi temamiya têgehên nakok û dijber, hatiye şirovekirin.

Li gor baweriya Marks *(Marx)* livdariya madeyê, encama nakokiyên navxweyî ye û diyalektîka ramanê jî, di vê xalê de dengvedana livdariya madeyê ya ber bi hiş *(bîr)* ve ye. Ango hiş, dengvedana *(xweveguhastina)* madeyê ye. Ji ber vê yekê ye ku felsefeya Marksîst, bi navê Materyalîzma Diyalektîk tê binavkirin. Lewma jî em dibînin ku rêbaza diyalektîk, wekî zanista livdariya diyalektîk tê dîtin û nirxandin.
Hasilê meriv dikare bibêje bi rêya xebatên Marks û Engels, diyalektîk xwe gihandiye wateya xwe ya îroyîn. Engels, danasîneke diyalektîkê a bi vî rengî daye ku ta radeyekî meriv dikare bibêje ku ev danasîn *(pênase),* danasîneke herî rast û aqlî ye: <*Diyalektîk ew zanist e ku li cîhana der û hişê mirovî de, li zagonên gelemperî (tevdeyî) yên livdariyê digere.*>
Bêguman meriv dikare bibêje ku danasîneke bi vî rengî, bi temamî xwe spartiye zanista û berfirehbûna diyalektîkê jî, girêdayî berfirehbûn û pêşveçûna zanista ye.
ing: dialektik
fr: dialectique
tr: diyalektik

**7- Erdem (Dilpakî):** Têgeha erdemê, wekî têgeheke felsefî, ketiye zimanê kurdî jî. Herçuqasî, carinan em ji bo <*erdemê*> têgeha <*dilpakî*> ê bikar bînin jî, tê dîtin ku di zimanê me de têgeha <*erdemê*> bêtir berbelav e. Têgeha erdem yan jî fazîletê, meriv dikare bi hêsanî bibêje ku ji tarîxa destpêka felsefeyê ve heye û xweş hatiye *(tê)* bikaranîn. Li ser pirsa *(pirsgirêka)* <*wateya mirovî û jiyanê çi ye?*> bersiva <*jiyaneke xwedîerdem e.*> hatiye dayîn. Li gor vê yekê, bextewarî armanca jiyanê ya bingehîn e û ev yek jî, encax bi rêya erdemîtiyê dikare pêk were. Li gor vê ramanê, erdemîtî jî encax bi zanyariyê dikare bi dest bikeve, yan jî pêk were.
**Erdem di Serdema Antîk de:** Sokrates, Platon û Arîstoteles, gelekî bala xwe dane erdemê û xebatên xwe yên felsefî jî, axlebî li ser vê têgehê pêk anîne. Lewre, ji bo felsefeya ehlaqê jî, têgeha erdemê têgeheke girîng e û feylesofên din jî, gelekî bala xwe dane vê

têgehê. Pirî caran hatiye dîtin ku bextewarî û erdem, wekî du têgehên têkildar hatine dîtin û nirxandin. Sokrates dema ku dibêje armanca jiyanê bextewarî ye, mebesta wî zanyarî *(bidestxistina zanyiyê)* ye. Ango li gor Sokrates, encax bi rêya zanayiyê meriv dikare bigihêje bextewariyê yan jî dikare bextewar *(dilşad, bextewer)* bibe. Ji ber vê yekê jî erdemîtî, encax bi zanyariyê dikare pêk were û ev yek jî, dê rê bide bextewariyê.

Dema ku Zenonê Qibrîsî erdemîtiyê wekî şertê sereke ê bextewariyê daye pêş, bêguman vê yekê destnîşan kiriye û piştgiriya vê ramanê kiriye. Epîkurosgiran jî, prensîpeke wiha pejirandine û ji bo wan jî, a girîng rev a ji eşê û xwegihandina bextewariyê ye.

Epîkurosgiran wiha digotin: <*tiştekî ku dê tu ji ciranên xwe şerm bikî, meke!*> Ev gotin jî nîşan dide ku e wan erdemîtiyê, weke bingeha bextewariyê dîtine û nirxandine. Zanayî *(bilgî)* mirovan dike dilpak *(xwedîerdem)* û tiştê ku di wateya ehlaqî de rê li ber tevgera rast vebike jî, zanayî ye.

Piştre, tê dîtin ku têgeha erdemê di warê felsefeya ehlaqê de jî dibe yek ji wan têgehên sereke û jêneger. Li gor vê yekê jî erdem, ew têgeh e ku tevgerên mirovî yên rast û dirust nîşan dike, ye. Rastgotiya ehlaqî, bi erdemîtiyê re heman tişt tê dîtin. Rastiya *(rastgotiya)* ehlaqî û erdemîtî, di heman wateyê de tê bikaranîn.

Li derveyî vê pênaseya giştî ya erdemê; felsefeyên ehlaqê jî, dilerîneke cihêreng ya erdemê berfireh kirine. Wateyên cihêreng yên têgehên mîna baş-xirab, rast-çewt û hwd. ku li war û demê xwe biwate dikin, rê li guherîna wateya têgeha erdemê jî vekirine. Di vê çerçoveyê de gellek feylesofan, têgeha erdemê li navenda felsefeyê bi cih kirine.

Li gor vê yekê erdem, qesîdîna îrade yan jî daxwaza ber bi <*baş a ehlaqî*> ve ye. Li gor baweriya Sokrates, meriv dikare erdemê fêrî her kesê bike; lê li cem her kesê di heman radeyî de xwe nade der yan bi heman radeyî pêk nayê.

**Çend ramanên cihêreng yên li ser erdemê:** Erdem, ne sîstema ehlaqî ya olekê yan jî ramanekê ye. Radeya herî bilind, ya asta

ehlaqî ye, heta meriv dikare bibêje ku giyan *(rih)* e. Ew giyan e ku erdemê *(erdemîtiyê),* mîna armanca jiyanê dibîne û mirovan digihîne bextewariyê. Mirovên xwedîerdem *(erdemdar)*, jiyana xwe bi aqlê xwe didomînin û di tevger û biryarên xwe de jî, li gor daxwaza aqilê xwe tevdigerin. Lewma jî erdem, zanayî ye.

Platon erdemê, wekî zanayiyê dinasîne û dibêje, encax bi riya zanayiyê mirov dikarin bibin xwedîerdem. Zanayî jî zanayiya yên naguhêr e, ku ew jî bi aqil tê parastin û zanyar jî ew kes e ku xwe gihandiye zanayiya rast. Bêguman, ew zanayî jî zanayiya îdeaya ye. Di ferhengan de em dibînin ku têgeha erdemê wekî navê gelemper ê <*nefsbiçûkiya ku ji aliyê ehlaqê ve tê pesinandin, cigerdarî û rastgoyiyê*> hatiye pênasekirin, ku meriv dikare jêre bibêje fazîlet jî. Dîsa ji bo têgeha erdemê, <*mezinbûn û berfirehbûna rihê mirovî*> jî hatiye gotin. Çawa ku me di destpêkê de got, têgeha erdemê ji destpêka tarîxa felsefeyê ve cihê xwe girtiye.

Li ser pirsa *(pirsgirêka)* <*wateya mirovî û jiyanê çi ye?*> bersiva <*jiyaneke xwedîerdem e.*> hatiye dayîn. Li gor vê yekê, bextewarî armanca jiyanê ya bingehîn e û ev yek jî, encax bi rêya erdemîtiyê dikare pêk were. Li gor vê ramanê, erdemîtî jî encax bi zanyariyê dikare bi dest bikeve, yan jî pêk were.

Erdem, hêza xwenûkirinê ye, ewlehî ye. Piştgirî, xweşdîtin *(tolerans)* û nefsbiçûkî ye. Erdem, biryardarî ye, parvekirin e, dilxweşî û xizmeta civak û hawirdora mirovî ye. Erdem, wêrekî ye. Lihelhanîna aqil û dilê mirovî ye û muhasebeya wujdanî ye. Ji bo muhasebeya wujdanî jî, guhdarkirina dengê dilî pêwist e. Erdem, dadwerî ye, berbiçûna ber bi başî, rastî û delaliyê ve ye.

Ji ber vê yekê jî erdemîtî, encax bi riya zanyariyê dikare pêk were, yan jî em bibêjin bi rêya zanayiya rast dikare pêk were û ev yek jî, dê bibe sebebê bextewariyê. Erdem, xwe dispêre vê prensîpê: <*tiştekî ku dê tu ji ciranên xwe şerm bikî, meke!*>

Erdem tevgerîna azad e, ku tu zordestiyan qebûl nake û di bin tu zordestiyan de pêk nayê. Nîjada mirovî bi riya aqil û îradeya xwe, xwediyê wê hêzê ye ku başî, delalî, rastî û qenciyê hilbijêre. Hilbijartin, di ceribandina jiyanê de têgeheke girîng e.

Erdem li war û qadên tundîtuj xwiya nake, xwedîaheng û xwedîpîvan e. Erdem di rêya azadiyê de, rêhevalê wêrekiyê ye. Erdem, xwenasîn û xwezanîna mirovî ye. Têgihiştina berpirsiyariyê û rastgotiyê ye.
ing: virtue
fr: vertu
tr: erdem

**8- Felsefeya Kulturê (Felsefeya Çandê):** Felsefeya kulturê, bineşaxeke felsefeyê ye û bi awayekî giştî li cewher, hilik, avahî û berfirehbûna kulturê vedikole. Meriv dikare bibêje ku hinek mijarên *(qadên)* vê felsefeyê û felsefeya dîrokê, hevpar in. Herçuqasî binavkirina navê felsefeya kulturê nû be jî, xebatên li ser vê mijarê di dema feylesofên beriya Sokrates de jî, hatine dîtin. Helwesta cudakirina yên xwezayî û derxwezayî, ku wê demê li cem sofîstan hatibû dîtin, wekî destpêka vê çalakiyê *(rahişmendiyê)* tê dîtin û pejirandin.
Ligel vê yekê, felsefeya kulturê di felsefeya sedsala 18an de, digihêje wateya xwe ya esasî. Di sîstematîzekirina vê felsefeyê de, bêguman rola Dilthey gellekî mezin e. Li cem feylesofên wekî Rousseau jî, ev felsefe vediguhere rexnekirina kulturê û redda wê. Bi Nietzsche re, ev qesidîn berfirehtir dibe.
ing: Philosophy of culture
fr: Philosophie de la culture
tr: kültür felsefesi

**9- Felsefeya Hemdem:** Felsefeya ku di sedsala 19an de dest pê kiriye û heta roja me ya îroyîn hatiye. Wisa tê pejirandin ku Felsefeya Hemdem, piştî felişandin û belavkirina, spekulasyona mengîwer dest pê kiriye. Ev felsefe wiha dixwaze ku xwe berde kûrahiya mirovê girgîn, jiyana wî/wê ya dîrokî û hemû hêla jiyanê. Serdema Navîn, ***<Xwedê>*** û mengîweriya *(îdealîzma)* Serdema Nû jî, tîn *(zêhn û aqil)* û ramanê derxistibû ser text.
Felsefeya Hemdem, tîn û ramanê ji text tîne xwar.

Çimkî ev herdu têgeh jî, encax di fenomenên jîyana mirovî de dikarin werin dîtin. Tîn û raman avahiyên raser in ku di her çandê de bi fesaleke *(şekleke)* cihêreng dertêne holê û dengvedanên jiyana mirovî ne. Îdeyeka *(ramaneka)* ku serwerê hemû mirovahiyê ye, tune. Di dewsa aqlekî gerdûnî de, sîstemên metafizikî hene; ku bûne wesfên xwerû yên kulturên cihêreng.
Di dawiyê de bi kurtî mirovî dikare bibêje ku, felsefeya serdema me ev e: Weke hemû fenomenên *(bûyerên)* kulturê, felsefe jî hilbereke ***<watedayînên mirovî>*** ye û ji bo hêşinbûna wê, axa herî baş modela civaka pluralîst e, civaka piranîperêst e.
ing: contemporary philosophy
fr: philosophie contemporaine
tr: çağdaş felsefe

**10- Panteîzm**: Nêrîna ku temamiya gerdûnê wekî Xwedê dibîne. Xwedê gerdûn e û gerdûn jî, Xwedê ye. Xwedê, di nav gerdûnê de û di her tiştî de ye. Mirovên panteîst, baweriya xwe bi Xwedayekî antropoformîk *(Xwedayekî takekesî)* naynin û vê yekê red dikin. Wekî têgeh, bêtir bi têgeha monîzmê re têkildar e û li gor nêrîna panteîzmê, hemû tiştên ku hene perçeyeke Xwedê ne.
Xwedê, her tişt e û hemû tişt jî, Xwedê ne. Xwedê di xwezayê de ye, di bireseran *(nesne)* û di cîhana mirovî de ye. Panteîzm wekî teolojî û felsefeyekî, xwe spartiye xebatên Baruch Spînozayî *(sedsala 17an)* û di serdema modern de jî, bûye nêrînek populer. Monîzm, perçeya bingehîn ya felsefeya Spînoza ye.
Têgeha panteîzmê herçuqasî piştî mirina wî hatibe vedîtin jî, Spînoza wekî parastkarê vê nêrînê ê herî navdar hatiye dîtin. Di felsefeya yewnan de Plotînos *(205-270)*, piştî Ronesansê Giordiano Bruno *(1548-1600)* û Spînoza *(1632-1677)*, wekî nûnerên vê nêrîna felsefî têne pejirandin. Di têgihiştina nêzîkayîtêdana Spînozayî de Xwedê, her tişt e û her tişt jî, Xwedê ye.
Cudahiya Xwedê-mirov-gerdûnê tune. Cudakirineke bi vî rengî, çewtiya aqil e. Li gor vê teolojiyê Xwedê, gerdûn û mirov yek in û heman tişt in. Di sedsala 19an de panteîzm bûye nêrîna teolojîk ya

gelek nivîskar û feylesofan. Li Brîtanyayê William Wordsworth û Samuel Coleridge, li Almanyayê Johann Gottlieb Fichte, Schelling, Georg Wilhelm Friedrich Hegel û li Amerîkayê jî Walt Whitman, Ralph Waldo Emerson û Henry David Thoreau, nûnertiya vê nêrîna felsefîk kirine.
ing: pantheism
fr: panthéisme
tr: panteizm

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**Çavkanî: Ferhenga Felsefeyê – Ali Gurdilî**
26.09.2015

> Tiştê herî xirab a ku dikare were serê neteweyekî;
> bêdengiya felsefî, zanistî û edebî ye.
>
> **Mehmed Uzun**

# Di Mîtolojiya Yewnan de Mîtosa Medusaya Kezîmar

Medusa yek ji wan sembolên girîng ên bajarokê Dîdîmê *(li Tirkiyeyê li herêma Egeyê, bajorekek e)* ye û di mîtolojiya yewnan de yek ji wan sê cinawirên bin erdê yên mê ye, ku bi navê ***Gorgonan*** têne nasîn. Ji wan sê xwehên cinawir, bi tenê kezîmara Medusayê bi mirin e û yên ku lê mêze dikin yan çav pê dikevin, Medusa wan di cîh de dike kevir. Ji ber vê yekê jî, di dewra Antîk de bi armanca ku dê wan biparêze, li pereştişgeh û warên taybet, gelek wêne û peykerên Medusayê hatine çêkirin. Di çanda Antîk de, di derheqê jiyana Medusayê de, çend rîwayetên cihêreng jî têne vegotin.

**Di van rîwayetan de xaleka hevpar heye, ku ew jî ev e:**


Serê Medusayê ji aliyê Perseusî ve, hatiye jêkirin û bi vî awayî hatiye kuştin. Ji xwîna wê jî hespê bi bask ***Pegasos*** û ***Khrysaor,*** çêbûne. Di perestişgeha Apollonî de jî hatiye xwestin ku peykerên Medusayê jî werin çêkirin, lê ji ber ku temamkirina perestişgehê gelekî dom kiriye; peykerên Medusayê nîvco mane û wisa jî hatine heta roja me. Ji wan peykeran yek ku gelekî baş hatiye parastin û heta roja me hatiye, li hewşa perestişgeha Apollon ya li ***Didîmê,*** di dema me de tê pêşandan. Ji bilî perestişgeha Didîmê ya Apollon, çend peykerên Medusayê, li Stenbolê; li sarnica di bin erdê de *(Yerebatan Sarnicî)* jî hene. Ev peykerên Medusayê, li bakûra sarnicê ne û ji Serdema Romayê mane.

**Efsaneya Medusayê**

Medusa weke keçakê ciwan û bêdew, dest bi jiyana xwe kiriye. Ew wisa bêdew bûye ku xwedawendan hesûdiya wê kirine û xwedan jî, li pey wê geriyane. Nemaze jî xwedawenda Athena, gelekî wê hezidî ye. Poseîdonê xwedayê behran jî, dildarê wê bûye.

Poseîdon, ji ber evîna wê dîn dibe û rojekê bi destakarî, li perestişgeha Athenayê pêre radizê. Li ser vê bûyerê Athena, ji Medusayê gelekî aciz dibe û wê dike ***Gorgonek.***

Piştî ku dibe Gorgon, Medusa ji bêdewiya xwe dûr dibe. Medusa, gelekî ar dibe û porên wê vediguhezin maran. Medusa ji ber ku mirov bû, bi mirin bû. Ji ber vê yekê jî, Athena cezaya wê hindik dibîne û wê dide vekuştin. Kujerê wê jî, Perseus e.



Di dema serjêkirinê de, du zarokên wê yên ji Poseîdon, Pegasus û Chrysar, jêre dibin. Dilopên xwîna wê, digihêjin çola ***Libyayê*** û vediguhezine maran. Perseus, serê wê ê jêkirî û Athena jî, çermê wê, ji xwe re dibin û ji xwîna wê jî, du dilopan diyariyê kral ***Erichthonîusî*** dikin. Ji wan dilopan yek jehreke kujende û ya din jî, jehrkuj e û ku li gor gotegotan, hemû nexweşiyan baş dike.

**Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

**Çavkanî: Ferhenga Mîtolojiyê - Ali Gurdilî**

## Gotibûn ku Felsefe û Edebiyat...

**H. Kovan Baqî:** Edebiyat têgiheke komplîke ye û lazim e ligel felsefeyê, xwe bi hemû zanistên dîtir xwedî bike. Loma jî felsefe ji bo min jênager e. Felsefeya min, xwebûn e. Ez ê nava min bixwaze çi bike ez dikim û bêhtir bi xwe re lihev têm.
Ji tişt û kesên <*xwe*> bin hezdikim. Felsefeya nêzîkî min û jê hezdikim felsefeya ezoterîk û averêbûyî ye. Yek ji wan felsefevanan jî Jean Baudrîllard e. Wekî din jî bi pirrhêliya xwe kesê herî bêhtir nêzîkî xwe dibînim, Jacques Derrîda ye.

**Berken Bereh:** Helbest û felsefe du têgehên hêja û bi nirxin ku ev sedê salan e afrîner û ramanger sere xwe pê diêşînin. Lewre di navbera herduyan de têkiliyeke durist heye, em nikarin yekî ji wan bêxin pêşiya ya din. Di perwerdehiya mirovan de xwedî hêzeke xurt in. Asoya pêşveçûyînê her bi saya wan ronahî dîtiye.
Her du jî xwe dispêrin çalakiyeke afrînerî, hizrî, ramyarî.
Ev çalakî bi saya zimên pêk tê ango bingeh û stûna herduyan jî ziman e; zimanê herî sistematik û bi hêz. Bê ziman ne têgehên felesfê û ne jî şêwandina bûyer, raman û îmajên hestyariyê pêk tên. Felsefe bi saya zimên di avakirina pergala nirx û baweriyên me ava dike. Helbest jî rêya şirovekirin û watedarkirina heyîn û hebûnê û ya dinyayê ye. Heidegger, lomeya li me dike ku zelaliya ramyariyê bi gor dewra Grekan şêlû bûye.
Wek sedem jî, jibîrkirina zimanê heyîn û ramyariyê, dûrketina ji helbestê ku wek çalakiyeke hebûna insên destnîşan dike. Dîsa Johan Georg Hamann <*helbest zimanê zikmakî ya insên e*> gotiye. Li vir dixuye ku têkiliyeke dirust di navbera ramyarî û helbestê de heye. Her du jî bandorê li hev dikin. Vegotineke wêjeyî û felsefî him hevûdû temam dikin û him jî payeya wê bilindtir dikin. Ji ber vê têkiliyê ye ku zayîn û ronahî dîtina felsefê li ser mîrata mîtos û eposê ava bûye.

**Fêrgîn Melîk Aykoç**: Bêguman hebûna jiyanê bi serê xwe felsefeyekê ye. Heta ajal jî ji bo xweparastinê, yan jî yê dijberê xwe tirsandinê dikeve pozisyoneke xwe ji rastiya xwe mezintir nîşandayînê. Di stratejiya nêçîra ajalan de jî ev rastî derdikeve holê. Lema jî rastiya felsefeya jiyana xwe nişandayîn mijareyeke gelek giran e. Her kes dixebite ku xwe wek xwedanê felsefeyeke herî xurt nîşan bide. Heta hin kesan yek berhemeke li ser felsefeyê nexwendiye, behsa nizanim felsefeya çi dike; tu berhemên psikolojiyê nexwendiye, nizane psikolojî çi ye, behsa derûnnasiyê dike. Haya xwe ji ziman tune, ji ber ku pexşaneke bi kurdî nivisandiye, xwe zimanzan difiroş e. Carna mirov nizane bikene, yan ji vê rewşa me re bigîrî.
Di warî xwe pêşkêşkirinê de hinek sistiya min heye, xwe ji xwe zêdetir nişandayînê cih bihêle, rastiya xwe pêşkêşkirin jî ji min nayê. Ez dibêjim ez ev im, bila mirov min ne ji min bibîhîsin, rastiya min û emelê min bibînin û wisa binirxînin. Ta niha min xwest ez di her warî de rasterast, wek soran dibêjin <*rastexo*> bim, dostan mezin kim, di her warî de tenê başiyê bireşînim hawîrdora xwe, zanîn û azmûna xwe bi hawîrdora xwe re parvekim. Heta min xwest ez hin mirovên dikanîbûn pêşkevin, bi formeke alîkariya meneceriyê derxim pêş, lê min hew dît ku ew çep û rast lê didin, bi rengdêrên bi xwe jî nizanin tê çi wateyî di ser min de tên. Eh dem bi min ez bi demê van êşan didim jibîrkirin. Rastiyeke heye; mirov tu car nikane kes û kesayetiyan bi her aliyê ve binase, mîna kamerayekê tenê aliyê bi mirovan ve xuya dibîne.
Mirovek çendî xwe veke, hin rûyên xwe nîşan bide jî, rastiya wê/wî ya derûnî tim veşartî dimîne.

**Omer Dilsoz**: Edebiyat ji hemû şaxên zanistê sûdê werdigire û yekser pê re têkildar e. Bifikire, tu romanekê vedihûnî, bo te warek lazim e, hawara xwe diçî erdnasiyê, bo te pêzanînên dîrokî lazim in, kelepor lazim e, çi zanim xwelî lazim e, divê serî li xwelînasan bidî. Bi kurdî mirov û jiyan pêwîst in û tu serî li her tiştê bi wan re pêwendîdar e didî. Heçî felsefe ye, xwêya edebiyatê ye. Ma girara

bêxwê rijî nabe, ahe dahênan û vehûnanên wêjeyî jî, bê hizr, bê bîr û ray, weke dara pût in, nava wê xilole ye.

**Firat Ceweri**: Haya me jê hebe an jê tunebe, her yek ji me bi felsefeyekê tevdigerin. Bêguman nivîskarek jî di prosesa avakiran berhema xwe de bi zanebûn an jî binhişî bi felsefeyekê dikeve rê. Yanî siyaset, celebê jiyanê, huner û edebiyat bi felsefeyê ve dorpêçkirî ye.

**Shahînê Bekirê Soreklî**: Wekî min di pirtûkên xwe bi van mijaran ve peywendîgir dikin de xwendiye, hîn ji dema yewnaniyên kevnar ve ev mijara tu gotina wê dikiye di berhemên nivîskarên wek Aristo, Aflatûn, Sokrat… de hebûne.
Wekî dizanî, mijarên edebiyatê û felsefeyê bi hev ve girê didin û berhemên wêjeyî yên xwe bi felsefeyê ve peywendîgir dikin, yan yên felsefî ku xwe bi edebiyatê ve mijûl dikin, ji sedsalan û vir ve û ta roja îroj didomînin. Kovarine taybet, hinek nivîskar û fîlosofên dema me û kûrsên zanîngehan hîn xwe bi van mijaran ve mijûl dikin. Felsefe di naveroka berhemên nivîskarên demên par de, ji Aflatûn bigir ta El-Xeyyam, û di berhemên demên ne qeqa kevn yên nivîskarên wek Albert Camus, Herman Hesse, Oscar Wilde û gellekên din yên berê û nuha de hebûye.
Ev mijareke gellekî balkêsh û berfireh e û, mixabin, ez ne pisporekî wê me. Lê dikarim bibêjim ku bikarhanîna felsefeyê di berhemên wêjeyî de, roman, kurteçîrok, shano û helbest jî di nav de, naveroka wan rengîntir, dewlemendtir û balkêshtir dike. Felsefe xwe ne tenê bi jiyanê û mirinê ve, lê jê bêtir xwe bi ramanên mirovan yên derbarê wan de ve girê dide; xwe têkile wateya ramanan, mebesta jiyanê û mijarên di nav gengesheyên zanyaran de dike. Felsefe netirs û pirralî ye, dikare xwe wek helbestên Feqiyê Teyran bi Xwedê û evîndariyê ve peywendîgir bike û dikare xwe têxe nav pêlên înkarkirina hebûna Xwedê.
Bi dîtina min, berhema ku tê de felsefe hebe mirovê ji zanistiyê û xwetêwerkirinê *(adventure)* hez dike ber bi xwe dikishîne û kesên

hishyar û xwedan meraq rastî ramanên nû dihîne. Bi encamê mirov fêrî ramanên nû dibin û shêweya jiyana wan, yan qe nebe gola bîr-û-baweriyên wan, dikarin bihên guherandin. Ger ne shash bim, min li shûnekê xwendibû ku felsefe werzisha mêjî ye. Di berhema min VEGER de yek ji bokeyên berhemê, Melle Boyar, ku melleyekî gundî ye, wenda dibe, lê bi navekî din wek fêlosofekî dikeve nav civatê û wê bizavê dike ku civata xwe bide guherandin û ramanên wan ber bi warê wan û xwedîderketina li "Ez û Emên" xwe ve bade. Ger ne shash bim ev jî dikare wek mijareke felsefî di berhemeke wêjeyî de bihêt binavkirin.

**Xizan Şîlan:** Helbestvan wek feylezofan xwe di nav şer û bûyerên dîrokê de dibîne. Di dîrokê de helbestvanan, gelek caran serê wan ji ber gotinên rast û vekirî û felsefîk ketibe belayê jî, lê ji vegotina rastiyê re serî û bejna xwe qet netewandine. Her dem rasteqîna edaleteke rast û dirust parastine û maskeya li ser rûyê desthilatdaran rakirine û şilfûtazî nîşanî civakê kirine.
Di felsefe de xwendevan li gotina feylezof dinêre, ango feylezof çi gotiye dinêrin. Lê di helbestê de, helbestvan dê çawa gotiye dinêrin. Di felsefe de mantiq derdikeve pêş, lê di helbestê de hest derdikevin pêş. Jixwe mantiq bêyî hest bi tena serê xwe lal e, hest jî bêyî mantiq bi tena serê xwe kor e. Ji ber vê yekê mantiq û hest bi hevre dimeşin.

**Enwer Karahan:** Edebiyata herî hêsan jî bê felsefe nabe; felsefe xerca paşfikirîna berhemên edebî ye û di her form, mijar, teknîk û atmosfereke wan tekstên *(bi rastî jî edebî)* lîterer de, miheqeq mirov bîhna fîlozofiyekê dike. Helbet hin caran zanîn, têgeh, teorî û çareseriya meseleyan jî wek formeke edebî tê hesibandin, ew meseleyeke din e.
Ez bawer nakim ku edebiyat çareseriyê pêşniyarî civatê dike, bi tenê destnîşan dike û rê dide, lê felsefe bi lêsiwarkirina maneya gotinan, ji jiyanê dawaza çareseriya bersiva hin pirsan dike. Helbet nivîskar gelek caran di tekstên xwe de bi zaneyî qala felsefeyekê

nake, ew li gora mijarê û atmosferê, qahremanên xwe bi goşt û hestî dikin û ev têgeh jî li gora çawayiya têgihîştina nivîskarî/ê bi xwe ye. Zimanê kurdî rê dide mirovî ku hemû awayên heyî, hemû teknîkên di derbarê edebiyata bedew de bi kar bîne. Ew rê dide ku mirov li ser hemû awayê zanistê, yê mîtolojî, xweza û felsefeyê rawest e. Ji xwe hebûna malpera felsefevanê jî delaleta vê yekê ye. Em xwediyê mantiqa felsefeyeke bindestiyê nin û teslîmî wê ralîteyê dibin. Bi gotineke dinê, em wek civat xwe bi destê realîteyan ve berdidin û ji qedera xwe razî dibin. Heger ne weha bûya, niha zarokên kurdan li Diyarbekir, li Wanê û Agiryê bi tirkî nedipeyivîn; heta li Îzmîr û Stenbolê jî.

**Jan Dost:** Her mirovek felsefeyeke wî a jiyanê heye. A min bi xwe ew e ku rastî nayê kedîkirin, bextewerî nayê nasandin û jiyan xewn e. Mirovayetî hîn di pêvajoya xwe ya destpêkê de ye. Em nikarin behsa serkeftinên mirovan bikin, eger şer û xwînrêjî berdewam be. Ji qonaxa hovîtiyê mirov derbasî qonaxeke din î hovîtiyê bûye. Felsefe, fikr, ol, pêximberî; dikin nakin ku vî afrîdeyê ku nave wî mirov e kedî bikin, nabe.

**Zelal Denzî**

zelaldeniz@hotmail.com

**Çavkanî:** www.felsefevan.org

25.09.2015